

# مامۆستای کورد

1

دهنگى بهشى كوردىي

خويندنگه‌ى به‌رزى مامۆستايان له س\_\_\_\_\_تۆكه‌ۆلمه



ژماره : (۱)

**ماهۆستای کورد**

گولانی ۱۹۸۵

دهنگی بهشی کوردییی خویندنگهی بهرزی ماۆستایان له ستۆکهۆلمه

سهرنووسهر : فهرهاد شاکهلی

**ناوه پۆک**

لاپه ره

نووسهر : بابهت

۳	چهند پرسیارین زاراڤایین زمانئ کوردی	ق. س. تانریکولو
۸	پیشه وایی ههلبهستا کوردی یا مودیرن گۆران	لهزگیــــن
۱۱	دو ههلبهستیــــن سویدی	زنار شیرۆ
۱۳	زارۆکین کورد ل سوید ب زمانئ کوردی دخوینن	کهیا ئیــــزۆل
۱۷	ڤهکۆلین لسهـــــر سی پرتووکا	ئه. جانتەکیــــن
۲۴	ههــــلۆ ههـــــر بهرزه	هـــــــــــــهزار
۲۵	دیروکا تیاترویا کوردی	خۆشمهـــــند باران
۲۹	ههــــلبهـــــزارده	هیمــــن
۳۰	ڤهکۆلین لسهـــــر دو پرتووکا	ک. ئالیــــس
	مهـــــلای جهزیری: شاپیگهی سوڤیگهـــــری و کلاسیزم له ئهـــــدهبی	ئهـــــمجهد شاکهـــــلی
۴۶	..... کوردیدا	
۴۸	سوارهی ئیلخانیزاده، تاپۆ و بوومهـــــلیل	ف
۵۱	پیرهـــــهـــــلۆ	ســـــواره
۵۶	کوردایهـــــتی، زانست، ئازادی	فهرهاد شاکهـــــلی

.....

Högskolan för Lärarutbildning  
i Stockholm/ KURDISKA  
Box 34103  
100 26 STOCKHOLM - SWEDEN

ناونیشان :



## کوردایه تی، زانست، نازادی

### فهرهاد شاکه لی

سالی پار حوکومه تی سوید برپاری دا بهشی زمانی کوردی له خویندنگه ی بهرزی ماموستایه تی له ستۆکهۆلم HLS بکریته وه، بو پیگه یانندی ماموستای کورد، که پاش شه وهی له خویندن بینه وه، دهرز به منالانی کوردی ئەم ولاته بلینه وه. ئەم بهشی کوردیه دهستکه وتیکی گرنگ و هیژا بوو بو کۆمه لگه ی کوردی دانیشتووی سوید به تایبه تی و بو کوردی دهره وهی ولاته به گشتی.

خویندن له وه شه هدا پاییزی ۱۹۸۴ دهستی پی کرد. ههر له سه ره تا وه، که ئهرکی دهرزوتنه وهی زمان و ئه ده بی کوردیم پی سپێردرا، خۆم له ره وشیکی تازه و سه یر و بیویننه دا دی. ئەمه یه که مین جار بوو خویندکاری کورد له به شی جیاوازی کوردستانی گه وره وه هاتین و هه موو ویکرا له پۆلیکدا بخوینن و زمانی کوردی له پله یه کی ئا وادا فیڕ بین. سه رپای شه وش بوو دانانی پرۆگرام و بابه ت و نا وه پۆکی خویندن به ته واوی سه ره به ست بووم. من ههر یه که سه ر بیرم له وه کرده وه که ئەمه هه ل و دهر فه تیکه بو مان ها توته پیش و ده بی به باشترین شیوه سوودی لی وه ربگریسن :

\* خویندکاران له به شی جیاوازی کوردستانه وه ها توون و به دیالیکتی جیاواز قسه ده که ن و پاشخانی فره هنگیان جیاوازه. چاک وایه ریژمانی هه ردوو دیالیکته سه ره کییه که ی زمانی کوردی بخوینن.

\* ئه ورپۆکه زمانی کوردی به سی جۆره ئه لف و بی ده نووسری، ده ی جا که واته بوچی خویندکاران خۆیان فیڕ نه که ن کوردی به تیپی لاتینی و عاره بی (وپاشانیش به سریلیک) بخویننه وه ؟ خویندکارانی کورد ده بی کولتووری کوردی هه موو لایه ک ناس بکه ن و ته نها ۳۰-۳۵ تیپی جیاواز نه بیته هۆی بیبه شبوونیان له وه ئه ده ب و هونه ر و سامانه ی له م به ش یا شه وه به شی کوردستاندا هه یه .

\* ئه ده بی کوردی گه وه ره ر و زیپ و مروارییه که بو هه موو کورد ما وه ته وه. بوچی ده بی هیندیکمان له هیندیکی بیبه ش بین. ئیمه ئه ده بی به کوردی نووسرا و ده خوینن. به لامانه وه گرنگ نییه نووسه ره کورده که "هاونیشتمانی" کوپیه و له کاتی گه شت و گوزاردا پاسپۆرتی کامه ولاته هه لده گری. ئیمه نالی و مه حوی و گووران / مه لای جه زیری و خانی و بوژئه رسلان / عه ره بی شه مو و جاسمی جه لیل و کارلینی چاچان / هیمن و هه ژار و قزلجی / قه دريجان و جگه رخوین و وه سمان سه بری ، هه موویان ده خوینن.

پاییزی ۱۹۸۴ هینده ی بو مان گونجا کوپ و سیمیناری فره هنگیمان ساز کرد، ماموستا مه مه د ئەمینی بوژئه رسلان، کاک ره شو ی زیلان، روژهن بارناس و موئه یه د ته ییب و فرات جه وه ری، دوکتۆر بوو شووتاس Bo Utas ، هاتن و قسه و باسی سوودمه ندیان له مه ر زمان و فره هنگ و ویژه ی کورد بو خویندکارانی به شی کوردی و بو کوردی دیکه ی ئه ده بدۆست کرد. لیڤه به دوا وه ش هه ول

دەدەین ئەم کۆر بەستنه بکەینە نەریتیک بۆ ئەم بەشە کوردییە .

هەموو یەكدوو مانگیك بوو دەستمان بە دەرز و دەور کردبوو، بیرم لەوێ کردەوێ کە دەبێ خۆیندکاران بەوێ رابین بە شیۆه یەکی زانستانە و ئاکادیمی لە زمان و ئەدەبی کوردی بکۆلنەوێ . ئەمە کەلینیکی زۆر ئاشکرایە لە فەرھەنگی ئێمەدا . ھەر خۆیندکارێک بۆ خۆی بابەتێکی ھەلبژارد لەسەری بنووسی و لێی بکۆلێتەوێ . بەرھەمی کار و خۆماندووکردنەکیان ئەم چەند گوتارە بوو کە لەم ئانتۆلۆگییەدا بڵاویان دەکەینەوێ . بێگومان ئەگەر لە کەم و کووپی بگەرێین زۆرمان بەرچا و دەکەوێ، وەلێ دەبێ ئەوێمان لە بیر بیت کە بە زمانی کوردی (بە تاییبەتی بە زاراوای کرمانجی باکوور و لەلایەن کوردی کوردستانی باکوورەوێ) کاری زانستی زۆر کەم کراوێ . ئەوجا لە ھەل و مەرگیکی ئاوادا گەلێ بەوێ دلخۆش دەبین کە ئەمە سەرئایەکی باشە و ھومیدمان وایە خۆیندکاران لە ماوێ خۆیندەکیاندا بەرھەمی چاکتر و سوودمەندتریش پیشکێش بکەن .

ئەگەر بۆمان بچیتە سەر و کار بە دلی ئێمە بپوا ، ئەوا وامان نیازە لە ھەموو وەرزیکی خۆیندندا خۆیندکاران ھەر یەکە گوتارێک بنووسی . ئەوجا دیین گوتارەکانیان خپ دەکەینەوێ و ئانتۆلۆگییەکی لێ چێ دەکەین ، کە ئەمە ئیستا دەبیتە یەکەمین ژمارە ، بەلام بۆ ئەوێ ئانتۆلۆگییەکیمان زۆر ھیشک و برینگ نەبیت ، وامان بە چاک زانی جاروبار داوا لە خەلکی دیکەش بکەین شتمان بۆ بنووسن .

ھەلبەتە لێرەدا گرنگە دوو قسەیش لە بارە ی پرەنسیپی نووسین و بڵاوکردنەوێ لەم ئانتۆلۆگییەدا بکەین . با ھەروا کورت و کرمانجی بلیین : ئێمە ســـــــی پرەنسیمان کردۆتە بناخە : کوردایەتی ، زانست ، ئازادی . وا لێرەدا روونیشی دەکەینەوێ بۆچی ئێمە ئەم سی پرەنسیپەمان بە باش زانیوێ :

\* کوردایەتی : ھەر کەسی تۆزی مژوولی باس و خواسی کوردۆلۆگی بووبی چاک دەزانی کە ئێمە کورد چەندە ھەژار و بیبەش و مالۆیرانین . زانا و پسیور و ما مۆستایانی جیھان خۆیان لە قەرە ی ھەموو باسیک داوێ : لە ئەتۆم و سیستەمی گەردوونەوێ بیگرە تا دەگاتە زاووزی مشک و تەمەنی کیژ و جوولەوێ و رەنگی تویکلەپیاژ . ئەوێ گوتمان ئەوان بۆیان ھەلنەکەوتووێ کورد بناسن و لە زمان و نەژاد و فەرھەنگی بکۆلنەوێ (کە واش نییە) ، دە ی کوردە کە خۆی چیی کردووێ ؟ ئەو کوردەش کە ھەلی وەگیر ھاتبی کارێکی زانستی بکات ، گەلێ جار بەرھەم و کارە کە ی بۆ شتیکی دیکە (نەک کوردۆلۆگی) تەرخان کردووێ .

دەلین لە سەردەمی شەری نیوان ئیمامی عەلی و مەعاوییەدا لە (قەیس عامیری) یان پرسی : ئەری بەلای تۆوێ ئیمامی عەلی و مەعاوییە کامیان لەسەر ھەقن ، کامیان دەبێ ببی بە خەلیفە ؟ ئەویش گوتی بە خودا بە من بی لەیلاکە ی خۆم لەسەر ھەقە . ئەوجا ئێمەیش ناھەقمان نییە ئەگەر ھەق بەدەینە لەیلاکە ی خۆمان و ھەز بکەین بناخە ی کار و باری لیکۆلینەوێ زانستیمان فەرھەنگی کورد بیت .

\* زانست : وەکوو پیشتریش باسمان کرد ئەم ئانتۆلۆگییە ئێمە بە رادە ی

یەكەم بۆ بۆلاوكردنه وهی نووسین و بەرھەمی خویندكارانی بەشی كوردی دەبیٔ . نووسین و گوتارەكانی ئەوانیش دەبیٔ ھەمیشە بە شیۆه یەکی زانستی و ئاكادیمی بن ( بەو پێیە كە لە خویندنگە یەکی بەرز و لە ولاتیکی وەكوو سویددا دەخوینن). كەسێش گومانێ لەوێ نییە كە زانست تاكە رێگە و راستترین رێگە یەكە بۆ گەشتن بە ئەنجامی راست .ئەو كەسانەش كە داوایان لێ دەكەین نووسین و بەرھەممان بۆ ئامادە بكەن، ھەز دەكەین دیسان بەرھەمی زانستیمان پێشكێش بكەن. بۆ ئەوێ بەم شیۆه یە بناخە یەکی پتەو بۆ لێكۆلینەوێ زانستی دا پڕیژین. بیگومان ھەول دەدەین جاروبار بابەتی دیکەش لە ئەنتۆلۆگیە كەماندا بۆلاو بكەینەوێ (كورتە چیرۆك - ھەلبەست - چاپێكەوتن ) بەلام كەمتر .

\* ئازادی : چ لە كوردستان و چ لە دەرەوێ كوردستانیش گەلی كۆقار و رۆژنامە و ھەفتەنامە چاپ دەبن و بۆلاو دەكرێنەوێ، بەلام، بە داخوێ، كەم جار رێك دەكەوێ نووسەری كورد سەربەست و ئازاد بیٔ و چۆنی بوئی و چیی لە دلدا بیٔ و بنووسیٔ. زۆربە ی ھەرە زۆری رۆژنامە و گۆقارە كوردییەكان ( تەنانەت لە دەرەوێش) سەكۆی بێر و باوێرێ تاییبەتین و كاریان بۆتە ئەوێ نووسەر و بەرھەمەكە ی بناخنە ناو چوارچێوێ كە تەسكەوێ. گەلی جارێش ھەر بە ناوی ئازادی و سەربەستیەوێ دەست دەنێنە بینی ھەموو سەربەستیەك و رێگە ی بیروباوێر نادەن بۆلاو بیٔتەوێ. دەتوانم بڵێم ئەمڕۆ نە لە كوردستان و نە لە دەرەوێ كوردستان، تاكە كۆقارێك ، تاكە رۆژنامە یەك ، تاكە دەزگایەكی فەرھەنگی كوردی نییە كە سەربەست بیٔ و باوێرێ تەواوی بە دیموكراسی و ئازادیی بێر و باوێر ھەبیٔ. ئیستا كە ئێمە كارمان بەوێ نییە ئەمانە بۆچی وا دەكەن ( باس و خواسی چوارچێوێ و چوارچێوێ بازی زۆری پێ دەویٔ و با بمینی بۆ رۆژی خوئی).

لە بوواری سیاسەت و ئەدەب و فەلسەفە و بیروباوێردا ئەو پۆكە سەدان باس و خواسی وا ھەن كە رووناكبیرانی گەلانی دیکە ی گیتی ھیندەیان كوتاونەتەوێ، ئیدی لێیان بیزار بوون و تانیك نادەن، كەچی رۆژنامە و گۆقارەكانی كورد بە ھیچ جۆرێ توخنیان ناكەون و ناوێرن خویان لە قەرە بدەن. ئەو جۆرە باسانە لای كورد ھیشتا "تابوو Taboo" ن و مۆری سووریان پێوێ. بیگومان لێردا ئەركی رووناكبیرانی دلسۆز و شوپشگێر و خاوەن ھەلوێست ئەوێ نییە ئەو سنوورانە بشكێنن.

كاتی خوئی لە كۆقارێكی بەناو فەرھەنگی و بە ناو پۆك ئۆپۆرتۆنیست و جلیخوار و خاپێنەردا نامە یێك بۆلاو كرایەوێ. نامەكە، من بۆ سەرنووسەرەكە خویم نووسیبوو، ئەویش وای بە باش زانیبوو خوینەرانی كۆقارەكە ی لە فەرما یشتەكانی من بیبەش نەكات، بۆیە بۆلاو كردبوو وێ ( دیارە چاكیشی كرد). ئەم نامە یە بوو بە ئاگر و بەربووێ دەرروونی گەندەلی كۆمەلێ خەلكی ملھوێر و نەقام و داخ لە دل. ھەر بە جاری زەندەقیان لەوێ چوو بوو كە من باسی ئازادیی بیروباوێر كردبوو ( جا بە خودای ھەقیشیانە. ئاخر ئازادیی بیروباوێر مەرگەمووشە، ئەمما مەرگەمووش!! ھەرچی ژەنەرال و ملھوێر و دیکتاتور ھەییە، ھەر بە بۆنەكە ی بە لادا دیٔ).

ھەر بە فیتی ئەوانە، لە ژمارە ی دواتری كۆقارەكەدا بە جاری دوو نامە بۆلاو- كرانەوێ، پڕ بوون لە ھیژش و قسە ی پووچ و ناپەوا. ھەلبەتە من ھەر بە پێویستم نەزانی وەرانیان بەدەمەوێ (ئەو ی بە باس و خواسی ئازادیی بیروباوێر "سەخڵەت" دەبیٔ، ناسنامە و سرووشت و پلەو پایە ی خوئی دەخاتە روو!!). دۆستیکی

خۆشەوېستم له "لەندەن" ڤا تەلەفۆنى بۆ كردم و گوتی: "كاكه گيان هەر له پييان كه .ئەو هی دەیلین سەگوه په ". هیندی دۆستی دیکهش له بەرلین و مۆسکۆڤا نامەیان بۆ نووسیم و هەلۆیستی کوردانە و مەردانەیی خۆیانیان دیاری کردبوو .

ئێستا كه ئیمه باسی ئازادیی بیر دەکەین، رەنگه خراب نەبیت ئەگەر هیندی بەشی ئەو نامەیه لیژەدا بنووسینەوه، ئەوەندەیی پێوەندیی بە باسەکەوه هەیه .

" له میژووی نەتەوهیهک و ولاتیکیدا گەلی جاری وا هەیه که بیروباوەری چەوت دەبی بە باو .گەلی جار خەلکی دواي لیشاو دەکەون. من وا دەزانم ئەرکی رووناکبیر (یا بیرووناک) ی بە جەرگ و دلسۆژ ئەو هیه، لەو سەردەمانەدا بلی:نە . . . بویری و بلی: براینه ئیوه چەوتن. ئەمە قسەیهکی ژان پۆل سارتەری فەیلەسووفم وەبیر دینیتەوه که وتبووی ئەو نووسەرەیی ناویری له کاتی پێویستدا قسەیی هەق بکات ، زۆر چاکتره پێنووسەکەیی خۆی بشکینیی .

کاتی خۆی چینییهکان باوەرپیکیان هەبوو که زۆرم بە دل بوو . دەیانگوت جاری وا هەیه هەموو پارتي خەتیکي چەوت هەلدەبۆیری و ملی ریکەیی نا پراست دەگری، بەلام تاکه کەس و ئەندامی دلسۆژ، ئەگەر وایان بیر نەکردەوه و خۆیان بە پراست زانی، دەبی هەر لەسەر بیروباوەری خۆیان سووربن، ئەگەر هەزار جاریش تووشی چەرمەسەری هاتوون. لەو هیه چینییهکان ئەم قسانەیان بە هۆی وردەحیساباتی نیو خۆیانەوه کردیی، بەلام وەکوو پیرینسیپیک من زۆرم بە دلە و بە چاکي دەزانم و بۆ خۆیشم له ژياندا ئاوام .

من لەو باوەرپەدام ئەمپۆ له ژيانی نەتەوهی کورددا گەلی شتی سەيرو سەمەرە روو دەدات .گەلی پەتا بلاوبۆتەوه . خەلکی دواي لیشاوی سەیر کەوتوون. لەم روژگارەدا ئەرکی ئیمەمانان، ئەرکی رووناکبیری کورد، ئەگەر بە پراستی دلسۆژی نەتەوه و ولاتەکەیهتی و بەتەنگ پاشەرۆژەوهیه، ئەو هیه بویری قسەیی راستی بکات ، بلی نە ، ئەگەر شیري سولتان (یا سولتانەکان) سەریشی پەپاندووه .

یەکی لەو دەرد و پەتایانەیی بلاوبۆتەوه، نەبوونی دیموکراسییه، گالته پیکردن و سووک تیروانینی بیروباوەری جیاوازه . لە کوردستانی ئیمەدا، ئیمە له هەموو کەسی پرتەر پێویستمان بەوهیه لەم باسە بگەین. تەنانەت ئەگەر ئەو پێودانەش وەرگربن که دەلی هەرکی گرهوی بردەوه و سەرکەوت ، ئەو لەسەر هەقه و راستی بەلای ئەوه وهیه، تەنانەت بەو پێشەیی هیچ بیروباوەرپیک هەقی سەربەزکردنەوه و لەخۆبایی بوونی نییه، چونکوو هەتا ئێستا ئەوی سەرکەوتوو و ولاتی داگیر – کردووین و تووشی بەدبەختی و چارەپەشیی کردووین هەر دوژمنانن. کامه بیر و باوەر و کامه ریباز پێشانی داوین که لەوی دیکه دلسۆژتر و چاکتر و راستتره؟ بە چ مافییک و بە گویرەیی کامه یاسا، بیروباوەرپیک خۆی دەکاتە کوپخا و دەمپراست و خەتیکي راست و چەپ بەسەر هەموو ئەوانی دیکه دا دینیی؟!

ئەگەر نووسەرپیکي کورد، یا رووناکبیرپیکي کورد، که خۆیان بە دلسۆژی نەتەوه و ولاتەکەیی خۆیان دەزانن، ئەگەر ئەمپۆ پێی بە جەرگی خۆیاندا نەین و رازی دلی خۆیان نەلین، گوايه دەبی لیرەیی سپیان بۆ کامه روژی لەمە رەشتر هەلگرتیبیی؟! ئەگەر نەتوانن وشەیی راستی بنووسن، چما زۆر سەربەرزیتەر نییه پێنووسەکانیان بشکینن و ببنە یەکی لەو هەزاران – بگره ملیۆنان – کەسەیی تووتی ئاسایی ، هەرچی رادیۆی دەولەت – یا هیزی کاربەدەست – نووسی، هەر ئەوه دەلینەوه . . .؟! کوئارپیکي فەرھەنگی کوردی، بە باوەری من، ئەگەر بیهوی بە راستی ببیتە



سهكۆيهك بۆ خزمهتی نهتهوه و ولات دهبی خوی له و سهدان ئورگانی پارتییانه ههلاویژی و جیا بکاتهوه، بیته سهکو بۆ پینووسی کسک و سۆر و زهره و شین.

دهزانی سهیر شهوهیه خهلیکی دیکه، نووسهر و رۆژنامهوانی گهلانی دیکه له خۆمان چاکتر بیر له دۆزی گهلهکه مان دهکه نهوه... ئهوان مهسهلهکه به ههموو باریکدا لیک دهه نهوه و دههه له بنی ههمانهکه، کهچی ئیمه خۆمان دههزینهوه.

سیاسی و خۆبهپیشهره وزانهکانی کورد دهیانهوئ نووسهر و رووناکبیری کورد بینه مهیموون و خۆشیان مهیموونهوان بن. چۆنیان ویست رووناکبیران ئاوا ههلهپهڕین و پیشانی خهلیکیان بدهن. ئهوان بۆ شهوهی شهمیان بۆ بچیته سهر کۆلی قسهی زریق و باقی شهه دۆزنهوه و نیوی تیوری لی دهئین. بهلام رووناکبیری کورد دهبی بلی نه... دهبی بلی قوربان تو له من دلسووتر نیت بۆ گهل و ولات، ئیدی بۆچی دهبی تو ریگه به من نیشان بدهیت؟! دهبی، وهکوو شهحمه دی خانی نهر بن، پهنجه بکهن به چاوی میری جهزیره دا و سهر بۆ هیچ هیژیک داننهوین.

ئیمه نه پاره و پوولی چاکمان ههیه و نه گهنجی قاروونمان له بهردهستایه.

ههمانه و نیمانه ئهم ۵۰ - ۶۰ لاپهه پهیه که ههر به کههسه و تفاقی خویندنه که مان چایی دهکهین. بهلام پهیمانی شهوه دهههین که هیچ کۆسپ و لهمپهر و تهگه رهیه که نه خهینه پیش هیچ نووسهر و هیچ نووسینیک و هیچ بیروبا وه پریک... نووسهران سهربهستن چ دهلین یا بیلین. بهلامانهوه گرنه نییه نووسهر چی دهلی، وهلی زۆرمان بهلاوه گرنه چۆنی دهلی: واته تنها یهک پیوانه مان ههیه که دهتوانی ریگه له بلاوکردنهوهی بهرههه و نوسین بگری، شهویش پیوانه ی هونهرییه. شهگه ره یهکیک نووسینیک نارد که به تهواوی ۱۰۰%، دژی بیرکردنهوه و بیروبا وه پری من بوو بهلام له رووی هونهرییهوه باش و جوان و ریگ و پیک بوو، به زمانیک راست و پاک نووسرا بوو، پیاویکی خراب بهم شهگه ر بلاوم نهکردهوه. ( بهلای منهوه ریگه گرتن له بلاو بوونهوهی نووسین له بهر بیروبا وه پهکهی ترسنوکیه. شهوانه ی ریگه به بیروبا وه پری جیاواز و جۆربه جۆر نادهن و دهیتاسین ترسنوکن). بهلام شهگه ره یهکیک شتیکی نووسیبی بیروبا وه پهکهی به تهواوی به دلی من بیت، کهچی هینده له پ و لاواز بی که بهرگه ی فوویه که نهگری و به زمانیک شهق وشپ نووسرابی، دهی سا تو خوا من نالیم، تو خۆت بلی، بۆچی دهبی بۆی بلاو بگریتهوه??

بیگومان شهوه شهروون و ئاشکرایه ههر نووسه ره و خوی بهرپرسیاری نووسینی خویته... چاکی گوتوو ه یان خراب یا خوی بهرگری له خوی و نووسینه کهی خوی بکات. ئیمه دهمانه وئ شهوه بهسهلمینین که دهشی کوردیش دیموکراسی فیڕ بیت...!! شهمه بناخه ی بیرکردنهوهی ئیمهیه و ریبازی ئیمه ئا بهم جۆرهیه. شهری خهلیکینه بۆ خوا بلین: قسه لهمه روونتر دهبی؟ شهی مردوو لهمه پاکتر دهشۆردری؟!

شهگه ره کهسیک دهیه وئ پیوه ندیمان پیوه بکات و نامه مان بۆ بنووسی، وا

ناونیشانی خۆمان دهنووسین :

Högskolan För Lärarutbildning

i Stockholm / KURDISKA

Box 34103

100 26 STOCKHOLM - SWEDEN

شهمه ژماره ی یه کهمی ئانتۆلۆگیه که مانه. هیوامان وایه ههتا چوار- پینج

مانگیکی دیکه ژماره ی دووه میشان بگهیه نینه دهستی خوینه ران.

# سواره :

## پیره ههلو

ههلبهستی "پیره ههلو" یا "ههلو ههه بهرزه" له بنهوه تدا هیه شاعیری گه وره ی رووس "پوشکین" هه. کاتی خۆی "دوکتۆر خانلهری" له رووسییه وه کردبووی به فارسی له گوڤاری "خوشه" دا بلاوی کردبووه وه. شاعیری گه وره ی کورد "ههزار" ییش کردبوویه کوردی. دوا ی ئه و شاعیری نوێخوازی جوانه مهرگ "سواره ی ئیلخانیزاده" ش کردبوویه کوردی. وا لیله دا وه رگیترانه که ی سواره و له لاپه ره ( 24 ) ی ههه ئه م گوڤاره شدا وه رگیترانه که ی ههزار پیشکیش ده که یین.

پایزه دار و ده وه ن بی بهرگه  
دل په شوکاوی خه یالی مهرگه

ههه گه لایه که له داری ده وه ری  
نووسراویکه به ناخوش خه وه ری

تا وه ناوی نییه وا مات و په شیو  
له شی زاماری ده کیشیته نشیو

روژ په ره سارده که ی بای زریان  
کاته بو ژینی له دهس چوو گریان

دلی پر بوو له په زاره و دلسو  
ژینی خۆی هاته وه بیر پیره ههلو

به قسه خو شه مه ترسیی مردن  
تاله ئه وه ههستی به مردن کردن

کاتی کوچ کردنه وه ختی سه فهره  
داخه که م سه ختی نه مانم له به ره

ههه بی نا هات ته جهل و من مردم  
با، له شیوی په ر و بالی بر دم

تو بلیتی ئه وه خه وه ههستانی بی ؟  
یا نه ئه وه قافلله وهستانی بی ؟

تو بلیتی پاشی نه مان ژینی بی ؟  
بو له شی سارده وه بوو تینی بی ؟

مه‌رگه دئی و دووا به هموو شت دینئی  
هموو ئاواتی له دل دهستینئی  
شاره‌زای ریگه‌ی مردن کییه ؟  
چییه نهو مه‌نزله کوینه‌ی جییه ؟  
هر برپوم نابهلهد و بی سهر و شوین  
دیار نییه خیلئی ههلویان له کوین  
پاشه‌رپوکیکی بکه‌م لهو باخه  
تاکوو بال و په‌ری من په‌رداخه  
نابمه ریپواری که‌لی هات و نه‌هات  
چاره‌که‌م به‌لکوو نه‌وا هات و نه‌هات  
  
خوی به خوی گوت که ده‌چم بۆ لای قهل  
که‌یخو‌وای پیر و به بیری که‌لی که‌ل  
ههلپری راوکهری زالی که‌ژ و کیو  
له چیا‌ی به‌رزه‌وه رووی کرده نشیو  
که‌وته نهو ده‌شته له ترسا ته‌ق و ره‌و  
ده‌رپه‌ری کوپ‌کوپ و کپ مایه‌وه که‌و  
هاته لای قهل به‌کزی و بی وازی  
قهل وتی مام ههلۆ ناسازی  
وتی قالوه ره‌شه‌ی پسپورم  
پیرم و پییه له لیوی گورم  
باخی ژینم به‌خه‌زان ژاکاوه  
کاتی مه‌رگه و نه‌جه‌لیش ناکاوه  
هیژی نه‌ژنوم نییه بال بی هیژه  
هموو گیاندارئی ژیان پارینه  
پیم بلئی چونه که تو ههر لای  
گهرچی زور پیری به لای ماوی  
قهل گوتی باشه که گوی رادییری  
پهندی من پاکی به دل بسپییری  
نهو ده‌مه‌ی بابی به‌هه‌شتی من مرد  
دوو له تو دهرد و به‌لای ئیوه‌ی برد  
پیئی وتم رۆله هه‌وای زار و نه‌زار  
هه‌یه‌تی دهرد و نه‌خو‌وشی به‌هه‌زار  
تا وزه‌ی پیر و خه‌یال سه‌رده‌که‌وی  
که له گور که‌وتی وه‌ها وه‌رده‌که‌وی

دییق و زهردووی و ئاهو و وه رههم  
به گزهی بای به قهوهت دیئن به رههم  
گوشتی که و چهنده که تامداره به نا و  
ههگر و هالوئی دهه نویتسه ههنا و  
پهین و پالی که له پالی دییه  
مه نزی نوکهری خوئی لییه  
که ره توپیو و که لاکه گوئی لکه  
ههلمی دل روون که ره وهی سه ر گوئی لکه  
پیکه وه چینه بکهین له و پهینه  
بوئی سه نیئر مه له می بیر و زهینه  
ورد به وه چهنده به مانا قوولسه  
مه سه له و گفتی قهلی ما قوولسه  
بیکه سه ره مشقی ژیان نه و ئیشه  
هه ر له سه ر داری نه وی دانیشه

ها شه وه بیری هه لو رابوردووی  
پاکی بوو ژانده وه یادی مردووی  
گول کرا رایه خ و پایه ندام  
چهنده ئاژوا له شی کیو ئاوازم  
چهنده روانیمه زه وی له و بانسه  
کیو و ده شت له و سه ره وه چهن جوا شه  
چهن چکولهن په له وه ر له و سه رزه  
ئاخ که چهن خوئی پری گره نه م سه رزه  
چهنده راوی که و که و بارم کرد  
دوژمنی تا قمی شمقارم کرد  
کولکه ز پینه وه کوو تا قی زه فهر  
عاسمان بو منی به ست کاتی سه فهر  
حه و ته وانان بوو میدالی شه پی من  
چهنده شو را وه به خوین شاپه پی من  
ئسته بو و ره بدن و دامام  
من هه لو چا و له ده می قالاوم  
سا که نه و کاره وه ها ساکاره  
مه رگه میوانی گه دا و خوونکاره

هه‌وری عاسمان بی خه‌لاتم باشه  
یا له‌شم خاشه بکیشن واشه

گوتی وا ژینی درییژ پێشکەشی خۆت  
گۆشتی مرداره‌وه‌بوو هه‌ر به‌شی خۆت  
ژینی کورت و به‌هه‌لۆی مردن  
نه‌ک په‌نا بو قه‌لی رووپه‌ش‌بردن  
لای هه‌لۆی به‌رزه‌ فری به‌رزه‌ مژی  
چۆن بژی شه‌رته‌ نه‌وه‌ک چه‌نده‌ بژی

### سوارهی ئی‌لخانیزاده : تاپۆ و بوومهلیل

ئه‌وانه‌ی ده‌گه‌ل میژووی ئه‌ده‌بی کوردیدا خه‌ریک ده‌بن و هه‌لس و که‌وت ده‌که‌ن، باش له‌وه‌ ده‌گه‌ن که هه‌تا ئیستاش میژووی ئه‌ده‌بی سه‌رتاسه‌ری گه‌لی کورد ( نه‌ به‌ شیوه‌ی زانستی و نه‌ به‌ شیوه‌ی نازانستی ) نه‌نووسراوه‌ته‌وه‌ . هه‌ولدان بو وه‌دییه‌نانی مه‌به‌ستیکی ئا‌واش هه‌نده‌ هاسان نییه‌ . له‌ پێش هه‌موو شتی‌کا داگیر-کران و دا‌به‌شبوونی کوردستان - له‌ پال هه‌زاران شه‌نجامی دیکه‌ی تالدا - بو‌ته‌ هۆی ئه‌وه‌ی لیکۆله‌ره‌وه‌ و توێژه‌ره‌وه‌ی کورد له‌ به‌رده‌م سنووری ئاسنینی نیوان پارچه‌کانی کوردستانی گه‌وره‌دا ، ناچار بی‌ت ده‌سته‌به‌رداری گه‌لی گه‌نجینه‌ی هه‌یژا و به‌نرخ‌ی ئه‌ده‌بی کوردی بی‌ت . هه‌ر بو‌ نموونه‌ ده‌لێین ، ئه‌وه‌ ماوه‌ی چه‌ند سالیکه‌ له‌ کوردستانی باشوور گوت و بیژ و لی‌دوانیکی گه‌رم له‌مه‌ر چیرۆکی کوردی له‌ ئارادا‌یه‌ ، که‌چی ده‌بینین هه‌ر هه‌موو ئه‌وانه‌ی خۆیان به‌و با‌سه‌وه‌ خه‌ریک کردووه‌ له‌ چیرۆک و چیرۆکنووسی کوردستانی باشوور به‌ولاره‌و با‌س‌ناکه‌ن ، ناوی گه‌وره‌ و ورشه‌داری وه‌کوو "حه‌سه‌نی قزنجی" و "نووره‌دین زازا" و "عه‌ره‌بی شه‌مو" و "عه‌لی عه‌بدولپه‌حمان" و "سه‌عه‌دی ئی‌بو" نایه‌ته‌ نا‌وانه‌وه‌ .

هه‌روه‌ها له‌ بوواری هه‌لبه‌ست و نوێخوازییدا ، به‌ زۆری ناوی "گۆران" ی نه‌مرو نه‌وه‌ی شاعیرانی لاوی ئه‌مه‌رۆی کوردستانی عیراق ده‌بری ، وه‌لی نه‌ میژووی نوێخوازی له‌ ئه‌ده‌بی کوردیدا ساخ ده‌بیته‌وه‌ و نه‌ش نه‌خشه‌ی هه‌لبه‌ستی کوردی به‌ روونی و ریک و پیک‌ی داده‌نری ، هه‌تا ئه‌و رۆژه‌ی هه‌لبه‌ستی کوردی له‌ هه‌موو به‌شه‌کانی کوردستانی داگیرکراودا وه‌کوو یه‌ک با‌س ده‌کری و لی‌ی ده‌کو‌لریته‌وه‌ .

قه‌دریجان (۱۹۱۶ - ۱۹۷۲) و سوارهی ئی‌لخانیزاده (۱۹۴۱-۱۹۷۷/۱۹۷۵ ؟) دوو نیوی گه‌وره‌ی دنیا‌ی شیعی کوردی و نوێخوازی له‌ شیعی کوردیدا ، یه‌که‌میان له‌ کوردستانی سووریا ژیا و دووه‌میان له‌ کوردستانی ئیران . له‌ باره‌ی قه‌دریجان هه‌وه‌ هه‌نده‌ی شت - ئه‌گه‌رچی به‌ نیوه‌چلێش - نووسراوه‌ ، به‌لام ، سه‌د مخابن ، ته‌نیا له‌م یه‌کدوو ساله‌ی دوواییدا ئا‌ورپیکی که‌م له‌ سوارهی هونه‌رمه‌ند دراوه‌ته‌وه‌ .

ئىمە نامانەوئى لىرەدا زىدەتەرى لەسەر بىرۆين. ئەم جارە تەنى  
 ھەلبەستى ۋەرگىپراوى " پىرەھەلۆ " بىلە دەكەينەو، ۋىپراى  
 ۋەرگىپرانىكى دىكەى ھەر ئەو ھەلبەستە كە " ھەژار " شاعىر  
 كەردوويەتى، بەلام دەمانەوئى ئەو ۋە رابگەيەينىن كە داوامان لە  
 رووناكبىرىكى كوردستانى ئىران كەردوۋە لىكۆلەينەو ھەك  
 لەمەر سوارەى ئىلخانەزادەمان بۆ ئامادە بكات، بەو  
 ھىوايەى لە ژمارەى داھاتوۋى ئەم كۆتارەدا پىشكىش بە  
 خويىنەرانى بگەين.

ھەر ئەم دەرفەتەش بە ھەل دەزانىن بۆ ئەو ۋە داوا لە ھەموو  
 رووناكبىرانى دىسۆژ و كوردپەرۋەر بگەين چەندە دەتوانىن  
 يارمەتیمان بەدەن بۆ ناساندن و پىشكىش كەردنى شاعىرانى  
 كورد " قەدرىجان " و " سوارەى ئىلخانەزادە "، چ بە نووسىنى  
 گوتار و لىكۆلەينەو لە بارەيانەو ۋ چ بە پەيدا كەردنى بەرھەمەكانىان  
 بۆ ئەو ۋە لە ھەر لاپەرەكانى ئەم كۆتارە بىلەيان بگەينەو ۋ بەو  
 شىۋەيەش لاپەرەيەكى گەش و پىشكىش كەردنى دىكە بەخەينە سەر مەژوۋى ئەدەب و  
 كۆلتوۋرى گەلى كورد.

« ف »



## مه لای جه زیری :

شارپڳه ی سؤفیگه ری و کلاسیزم  
له ئه ده بی کوردیدا

## ئه مه جه د شاکه لی

گه ر بمانه وی لیکۆلینه وه یه کی پوخته و پاکژ له سه ر شاعیری هیژا و پایه به رزی کورد مه لای جزیری بنوسین ده بی پیش هه موو شتیک ئا و پرپک له و سه رده م و چه رخ و رۆژگار ه بده ینه وه که جزیری تیدا ژیا وه . بو ئه و مه به سته ش سه رنجیک له سه میرنشینی بو تان پیویست ده بی ت .

میرنشینی بو تان که باژیری جزیره پایتهختی بووه یه کیک بووه له سه و میرنشینه ی کورد که سه رده میکی زۆر فه رمانه وه ایی وده سه لاتی میره کانی گه لیک نا و چه ی کوردستانی گرتۆته وه ، سه له یمان کوری خالید یه که م فه رمانه وه ای ئه م میرنشینه بووه . (۱) بو تانیش وه کو هه موو نا و چه یه کی که ی کوردسـتـان هه موو ده می به ر هیژی دوژمنان که وتوو ه ، ده میک مۆگۆل و ده میک تاتار و گا قیکیش ئیلخانی و جه لایی و مه ری سپی و مه ری ره ش که هه موویان هه ولی کا و لکردن و داگیرکردنیان دا وه . (۲) ئیتر ئه و میرانه ی بو تان له هه موو سه رده می کدا به رنه گاری ئه و هیژا نه یان کردوو ه و میرنشینی بو تان تا وه کو سه رده می به درخان پاشا که سالی ۱۲۲۷ی مشهختی/ ۱۸۱۲ی زاییندا بووه به فه رمانه وه ای جزیره ما وه و له و سه رده مه شدا ده سه لاتیان به سه ر (وان و موسل و ره وان دزو سا بلاخ) دا هه بووه و قه لاکانی (شه نگار و ویرانشار و سیوه ره ک) یشیان گرتـوـوه و قه لای دیاربه کرو شاره کانی (شنۆ و ورمی) یشده بندهستی واندا بوون، به لام ئه و دام و ده زگا و سه لته نه ته ش خوا به کوردی ره وانه بینی و فه رمانده ی هیژه کانی به درخان پاشا له شه ره کانییدا دژ به تورکهکان (میر عیزه ددین شیر) خه یانه تی کردوته سلیم به دوژمن بوو و به خۆیی و تورکه وه به درخان پاشایان نا چار کرد که بو تان به جی به یلی و ده نیو قه لای (ئاروخ) دا خۆی حه شاردا تا وه کو جبه خانه و بژیویان لیبرا و له گه ل دوو کوریدا به دیل گیران و تیشکان، ئه مه ش له سالی ۱۲۶۳ی کوچی/ ۱۸۴۸ی زاییندا بوو . (۳) ئیتر ئه و میرنشینه ش له بار چوو .

جزیره ، وه کو نیوه ندیکی فه ره هنگی و پۆلی له په یدا بوونی زمانی ئه ده بی و شـیـهـری کلاسیکی کوردیدا :

جزیره ، یه کیکه له باژیره به نیو بانگه کانی کورد که گه لیک به یت و هـوـزان و گوتنی پیا گو تراوه و هه لدراره و وداستان و چیرۆک و به سه رهاتی زۆریشـیـی لیده گیرنه وه و باسی کۆشک و ته لار و شانشین و باله خانه و شوینه واری ده کری که له کولتوو رو ئه ده بی کورداندا پایه و جیگایه کی دیاری و به رزی هه بووه . (۴) جیکه و ریگه ی جزیره و باری جوگرافی یارمه تییه کی زۆری دا وه بو ئه وه ی بیـتـه په یوه ستیک له نیوان باکوورو باشوورو رۆژئاوا و رۆژه لاتی کوردسـتـاندا جوولانه وه یه کی بازرگانی له نیوان نا و چه کانی بو تان و جزیره ی پایتهختدا و له نیوان جزیره و دیاربه کروه کاری و ئامیدی و موسلدا هه بووه و کرپین و فروتنی ئاوریشم و خوری و مه رو مالات و کووتال و به ره می کشتوکالی و پیشه سازی

بچوک هه بووه . (٥) هه چهنده نهو بازرگانیهش له چوارچپوه وشپوهیهکی تهسکدا خوی نوواندوه بهلام لهگهله شهوهدا رۆلی خوی هه بووه و کاروانان بهویدا تیپه ر بوون و جموجوولیکی ئابوری دروست بووه و خه لک کاری بهوی گه وتوووه و رووی تیکردوووه و شه بارودوخ و رۆله جوگرافی و ئابووریهش کاریکی وایان کردوووه که جزیره شهوی بو بره خسی که ببیته مهلبهندیکی کولتووری و روشنبیری له کوردستاندا ، ئه م راستیهش له ژماره ی مزگهوت و خویندنگاوجیی بلاوکردنهوی خویندنهواریدا وهدهر دهکهویت . له چهرخی پازده و شازدهی زاینیدا ژمارهیهکی زور مزگهوت و خویندنگه له دهقرا بو تان هه بووه و شاری جزیره به تهنی خوی گه لکی تیدا بووه ، له خویندنگانهش سالانه ژمارهیهکی زور خویندکارو زانا خویندنی خویان تهواو کردوووه بهلگه نامهشیان وهرگرتوووه و بوون به بهرپرسیارو کارامه له بلاوکردنهوی ئایین و هه موو جو ره زانست و زانیاریهک له کوردستاندا . میرانی بو تان ئاره زووویان له بلاوکردنهوی روشنبیری و نه هیشتهنی نه زانین بووه و هه ولیشیان بو داوه ، هه بر بویشه قوتابخانه و مزگهوتیان دروستکردوووه و زانا و دانا و روشنبیرو ئوسه تادیکی فرهشیان بو شاگردانی کورد پهیدا کردوووه و لهگهشت لایهکی کوردستانیه شه و خه لک رووی لهو مهلبهنده کردوووه بو خویندن ، بهلگهش بو سه لماندنی ئه م راستیه شهویه که گه لیک زانا و هوزانقان و روشنبیری کورد له سه دهکانی پازده و شازده و تا وهکو نیوهی نوژدهیش خویندنیان له جزیره تهواو کردوووه . (٦) بو نمونه مه ولایان : موحه مه د بهرقه لعی ، نه بو به کر ، سه سن سوورچی ، سهید عه لی ، زهینه ددین به بی و گه لیک زانای مه زنی تر که هه مووان له سه رده می ( به دربهگ کوری شاعه لی بهگ ) دا حه واونه ته وه و خویندنیان تهواو کردوووه . (٧)

یهکی لهو میرانهی بو تان که دوستی مه لاو فهقی و زانا و خویندنه واران بووه و زوری خو شویتوون ( میر شه ره فی کوری خان نه بدال ) بووه که دریی نه کردوووه و مه ردا نه قوتابخانه و مزگهوتیکی زوری له شاری جزیره دا سازداوه و مال و سامانیکی زوریشی بو ته رخان کردوووه . (٨) مزگهوتی سو ر میر شه ره فبنیاتی ناوه و چه ندین گوندو عه ردو دا هاتی بو به ریوه بردنی ته رخان کردوووه . مه لای زقنگی نووسه ری کتییی ( العقه الجوه ری فی شرح دیوان الشیخ الجزیری ) له ده رفه تیکدا و له کاتی خویدا هه ندی ده فته روتو مارو نووسراوی ره سمی به رچا و که وتوووه که با سی قوتابخانه و مزگهوته کانی شه و سه رده مه ی جزیره ی تیا بووه ، سه ری سوورما وه له پوخته یی و ریک و پیکی و به تفاقه شه و خویندنگانه و ژووره کانی ما موستا و شاگردان که هه موو ویکرا خویندن و خواردن و حه وانه وهشیان هه رله وی بووه و به خو پاریی ژیاوون و میری چاوتیرو هیژا ئه رکی به خپو کردنی وانی وه شه ستوی خوی خستوووه ، شاگرده کان که کارو پیشه یان خویندن بووه و ما موستا کانی شه ده رزووتنه وه به باشی و ره زامه ندی ژیاوون . به مه دا ده رده که وی که میره کانی جزیره هه ولکی زوریان داوه له بلاوکردنهوی خویندن و زانستدا و دارایی و دراویکی زوریشیان دانا وه بو شه و مه به سه ته . (٩)

به یی شه و بارودوخه ی جزیره و بو تانی تیدا بووه له سه رده مه دا گومان له وه دا نامینی که زه مینه یه کی شه وتو دروست بووه و باریکی و هاتوته کایه وه که ببیته بنکه یه کی کولتووری و نیوهندیکی فره هه نکی وله ناوچه و قوژبنی جیاوازی کوردستانه وه خه لک بیگاتی بو خویندن ، زمانیش گه ر شوین و کاتیکی وای بو بره خسی پیشده که وی و گه شه ده کات و له وی شه دا سه ره تای زمانیکی شه ده بی کوردی به زاری کرمانجی ژوورو هه لیدا و شیعی کلاسیکی کوردیش هه ر به و زاره گه لاله ی کردوو له مه لای جزیری مه زندا که رابه ر بوو له وه دا خوی نوواند .



له بهرتهوهی نووسینهوهی میژوو لای کورد کاریکی زۆر کۆن نییه ئەویش به هۆی ئەو بارو دۆخەیی که هه مووده م کوردستان و کوردی تیدا ژیاوه، داگیرودا بهش کراوو بێ دهولت و بندهست، وهکو زۆریه زۆری رووداوه میژوو یه کانی کورد و زۆریه ناوداران و مهزنانی ژبانهی مهلای جزیریش زۆر روون و ئاشکرا نییه، بهتایبهتی سالی له دایکبوون و کۆچکردنی بگهوه بهردهیهکی زۆری له سه ره و بیروپای جۆراوجۆر و جیاوازی لهو بارهیهوه ههیه و نووسهران له سه ری ریکنه که وتوون، بهلام به گشتی له سه ره ئەوه پیکهاتوون که ناوی (شیخ ئەحمەد) بووه و له جزیرا بۆتان که باژێریکه له کوردستانی باکوور له دایک بووه و نازناوی له شیعردا مهلاو جار جاریش (نیشانی) بووه. مهلا به مانای زانا له عیلمی عه ره بیدا بوو نیشانییه که شی ده لێن: نیشان یان ئامانجی تیره، که مهلا نیازی بووه: به تیری ئەوین پیکراوه یان مه بهستی خالی سه رگۆنای یار بووه که کرمانجان به خال ده لێن نیشان، (۱۰) واتا خۆی بهو خالهوه ناوناوه که له روومهتی سه لماوه دیاری داوه.

لهو نووسهرانهی (کوردو بیگانه) که ههولیا نداوه ده ربارهی ژبانی مهلای جزیری بکۆلنهوه: دوکتور بله ج شیرکو، که سالی ۱۱۶۰ی ز به سالی کۆچکردنی مهلا داده نیت. (۱۲) بیگومان گه ر مهلا ههفتا سالیکیش ژبانی وهکو زۆر نووسه ره ده لێن، ده بی ده و روبه ری ۱۰۹۰ی زایینی له دایک بووبی. بهلام ماموستا موحه مه د ئەمین زه کی وای داده نی که مهلا له نیوهی دووه می سه دهی شه شه می کۆچیدا ژیاوه و له سه رده می (عیما ده ددین زهنگی) دا که لهو سه رده مه دا فه رمان په وای مو سل بووه. (۱۳) ماموستا عه لائو ددین سه جادی زیاتر له هه مووان هه وه لی ئەوهی داوه سه باره ت به ژبانی مهلا شتیک وه ده ست بێنی و ژبانی جزیری له قالب داوه و خستوو یه تیه نیوان سالی ۱۴۰۷-۱۴۸۱ی زایینی وه، جگه له وهش وه سفلیکی ئەوتوی مهلای کردووه له بالاو سه رو سه میله وه تا ده گاته چا ووبروو ده ست و په نه ج و ره نگ و دیمه ن و جل و به رگ. (۱۴) ئەو بیروپایانهی ماموستا سه جادی زۆر جیگیر نه بووه و زۆر نووسه ر گومانی لیده که ن. ماموستا سادق به هائو ددین ئامیدی له ته مه ل و بناخه ی رایه کانی ماموستا سه جادی ده دا و هه لیا نده وه شپینیته وه و لهو با وه ره دایه که جزیری له نیوهی سه دهی پازده ی زاییندا ژیاوه و له دووای سالی ۱۴۸۱ی زایینیش هه بووه. (۱۵) هه ربۆیهش بۆ چه سپاندنی قسه کانی خۆی و پووچکردنه وهی رایه کانی سه جادی ئیشاره ت به (د.ن. مه کنزی) ده کات و ده لیت (ماموستا سه جادی د روهنکرنا چه رخی جزیری تیدا ژی سه رکه قتی نینه). (۱۶)

لیه ردا مروف هه ندی بیروپا و بۆ چوونی مه کنزی وه بیردیته وه که گه لیک جار هه ولی ئەوهی داوه که کورد به شتیکی تازه دابنیت و میژووی کوردیش به ته ماوی و تاریک و که م به لگه، بۆنموونهش رایه کانی مه کنزی له سه ره ئەسل و ره گهزی کوردو په یوه ندی کورد به ماده وه و ته ئسیری زمانی فارسی له سه ره زمانی کوردی که ماموستا ته و فیق وه هبی له نووسینیکیدا به نیوی (ئه سلی کوردو زمانیان) به ره په رچی قسه کانی مه کنزی ده دا ته وه. (۱۷) جگه له وهش مه کنزی له نووسینه کهیدا به نیوی (مه لای جزیری وه قی تهیران) به م جو ره ده ست پیده کات " له مه ر شاعیرانی کۆنی کورد شتیکی که م زانراوه، ده ستنووسی کاره کانیان که من و به زۆریش ده نیو نامه خانه ی تایبه تی خه لکدا هه لگی راون و شار دراون ته وه، ته نانه ت ئەو زانیارییه که مهش له باره ی ژبانه وه که له لایه ن نووسه رانی جیاوازه وه نووسراون، گه لی جار ده گه ل یه ک نا گونجین و دژ به یه کن. له به ر ئەوه که مه راس تیه ی که ده کری بچنریته وه، هینده ی تر هیژا و به نرخ ده بی... " (۱۸) هه رچه نده ئەم رایه ی مه کنزی گه ر نیازی ئەوهش بووبیت که م بایه خی ئەو زانیاریانه که له سه ره شاعیرانی کهونی کورد هه یه پیشان بدات و نه گونجان و نا کۆکی را و بۆ چوونی نووسه رانی جیاوازو دژ به یه کیان ده ر خات له هه مان کاتدا هه لگرتن و شار دنه وهی ده ستنووسی کاری شاعیرانی کهونی کورد له نیو نامه خانه ی تایبه تی خه لکدا ئەوهی که له سه ره تای ئەم نووسینه دا ها تووه ده سه لمینی. مه سه کنزی

دوای ئەوەی لە رایەکانی مەلا مەحمودی بایەزیدی دەکوئیتەوه سەبارەت بە سەجادی دەبیژێ "سەجادی لەزەمینه و روانگەیهکی زۆر روونەوه دەست پێناکات" لە مەر ژبانی مەلای جزیری تادیتەسەر ئەو رایەیی که موفتی، بیگومان مەبەستی مەلا ئەحمەدی زقنگی، لە بۆچوونەکانیدا دەربارەی جزیری ژبانی زیاتر لە راستیەوه نێزیکەوه دەگاتە ئەوباوەرە که مەلا لە ۹۸۰-۱۰۵۰ ی مشەختی که دەکاتە ۱۵۷۰-۱۶۴۰ ی زایین ژباوە و لەسەر دەمیکدا که فەقی تەیرانیس ژباوە (۱۹) مەلا ئەحمەدی کۆری مەلا موخەمەدی بۆتی زقنگی پێی وایە که جزیری لە کوتایی سەدەمی دەیهمی کۆچیدا ژباوە و لە ۹۵۰ ی کۆچی بە دوواوە و هاوچەرخێ میرشەرەف خانی کۆری میرئەبدال بوو که لەسەر میرەکانی (ئازیزان) بوو و ماوەیهکی زۆریش فەمانرەوایی ناوچەیی جزیرهیی کردوو (۲۰) هەر وەها دووپاتی ئەو بۆ چوونەیی خۆی دەکاتەوه و دەلی "بەتەواوی و ئاشکرا دەتوانم بلیم که مەلای جزیری لە کوتایی سەدەمی نوۆهەمی کۆچیدا لەدایکبوو و تاوەکو دوای هەزاریش ماوە و لەوانەشە گەیشتیته پەنجای دوای هەزار و پتر... (۲۱) مامۆستا قەناتی کورد و رای وایە که مەلای جزیری لە سەدەمی دووازدەدا ژباوە و مەبەستی سەدەمی دووازدەیی زایینەو رایەکەشی دەگەریتەوه بۆ (وەژیری نادری) (۲۲) ناویک که گویا لە نووسینییدا لەسەر جزیری باسی ئەوەی کردوو. مام هەژاری موکریانی لای وایە که تەواوی ئەوانەیی لە مەلای جزیری دوواون گەر لەشیعرەکانی مەلا بگەشتیان لە سەر ژبانی توشی ئەو هەراوگۆلمەزوفەرتەنەیه نەدەبوون. ئەو لەو باوەرەدایە که جزیری لە سەدەمی یازدەیی کۆچیدا ژباوە (۲۳)

هەریەکە لەو نووسەرانی که دەربارەی مەلای جزیری نووسیویانە کومەلێک بەلگەیی بۆ بیروپراکانی خۆی هیناوەتەوه و راستی خۆی دەسەلمینی، بیگومان هەموو نووسەرێکی بۆی هەیه چی بەراست دەزانیت ئەوه بیژیت... بەلام دەتوانم بلیم که خۆیندەواری کوردو خەلکی بیگانەش تانیست و سەدەلهسد نازانن که مەلای جزیری لە کەیهیهوه و تاوەکو کەیی ژباوە... ئەمەش رەنگە کۆلینەوهی زیاتر و زانستانە بیگاتی نەکتەنی بۆ جزیری بەلکو بۆ هەموو میژووی کورد. ئەز لەو باوەرەدام که پەسنە بەناوبانگەیی جزیری بۆ میری جزیره که (میرشەرەف کۆری خان ئەبدال) بوو نەکت عیما دەدەین زەنگی، که پایە بەرزیی لێها تووی و جوامیژی و دەسەلاتی ئەو میرە نیشان دەدات و خوشگوزەراشی جزیره لەسەر دەمی ئەودا دەگەیهنی باشترین بەلگەیه بۆ ئەوەی که جزیری لەسەر دەمی ئەو میرەدا ژباوە و ئەو میرشەرەفەش بەپێی شەرەفخانی بدلیسی که لە شەرەفنامەکیدا باسی تاوەکو سالی ۱۰۰۵ ی ک/ ۱۵۹۶ ی ز دەکات هیشتا هەر زیندوو بوو چونکو ناوی خستۆتە شەرەفنامە کەیهیهوه و لەسەری دوواوە (۲۴) ئەو گۆرینەوهی شیعرەش که لە نیوان جزیری و فەقی تەیراندا رویداوە که فەقی شیعی بۆ جزیری ناردوو لە سالی ۱۰۳۱ ی کۆچیدا و... (۲۵) مەلایش وەرانی داوەتەوه بەلگەیهکی دی دەداتە دەستەوه که جزیری و فەقی تەیران لە سەردەمیکدا ژباون، جا ئەگەر فەقی تەیران وەکو مەکنزی باوەر دەکا لە سالی ۱۰۰۰-۱۰۷۰ ی ک/ ۱۵۹۰-۱۶۶۰ ی ز ژباوت (۲۶) ئەوا جزیریش هەر لەو سەردەمدا ژباوە که دیسانەوه دەکاتە سەردەمی میرشەرەفی خان ئەبدال که ئەویش لە سەدەمی یازدەیی کۆچیدا بوو، بۆیهش جزیری پەسنی داوە چونکو لەوکاتەدا ژباوە یانی سەدەمی یازدەیی کۆچی، رەنگە لەگەڵ خانیشدا زۆریان بەین نەبووبیت.

شیعر لە کن مەلای جزیری:

سەرنجدان لە شیعی مەلای جزیری ئەوەمان بۆ دەردەخات که مەلا لە فۆرمدا و لەو جۆرانەیی که بەکاری هیناوە سوودیکی زۆری لە شیعی زۆرەلاتی وەرگرتوو و بەتایبەتی فارسی و عەرەبی، لەناوەرێکیشدا سۆفیزم و شیعی کومەلایەتین (۲۷) مەلا وەکو

زۆر بەی زۆری زانایانی ئەو سەردەمە ی کورد سۆفی بوو و لە ئەقینداریتی خۆشەویستە راستەقینە کەیدا توواوە تەو و شیعری ئەوینداری لە عیشقی راستەقینەدا گوتوو و لە بابەتەکانی تری زانستدا دەستیکی بالای هەبوو . . . وەک سۆفیهک جەزبە یەکی یەزدانی گرتوو یەتیو بوون و ئاوازیکی سۆفیانه دلی هەژاندوو و مەستی شەرابی ئەقینی راستی بوو تەو و تەو کە گەشتو تە عیشق و خۆشەویستی یەزدان و تێیدا نوقم بوو . هەلبەستەکانی لەروا ئەتدا مەستی و دلدارین و لەناوە پۆکیشدا گەشتن بە پایە بەرزەکانی خۆشەویستی شاھی زانا کە ئەویش یەزدانە . ( ۲۸ ) ما مۆستا علائولددین سەجادی وەسفیککی نایابی جزیری دەکا و بە پیغەمبەری سەردەمە فەتری شیعری تەپری ئەوینی دادەنا لە خاکی بۆتاندا و لە زەریای تەسەووفیشدا لە نیو کورداندا بە دلزیندووی بیندیریۆ و پەلهاویۆ و ئەو دەسەلمینی کە بیری مەلا ئاوینە یەکی بیگەردە بو سۆفیانی خودا پەرسەت و هەستیشی شاوینە یەکی سەردەمە بو فەیلە سووفانی راستی پەرسەت . ( ۲۹ ) بە پای ئەو جزیری وەنەبی هەر مەینۆشی بادە ی ئەوین یا سەرخۆشی کۆری تەسەووف بووبیت و هیچدی بەلکو لە یەزدانناسی و فەلسەفەشدا چوو تە نیوجەرگە ی کۆری فەیلە سووفەکانی یونانە و لەولاشەو چوو تە ئەو کۆنگرە یەو کە زانایانی ئیسلام و غەیری ئیسلام تیایدا کۆبوونە تەو و هەموو باس و خواستیکیان هەر یەزدان و فەلسەفە ی یەزدان نیەت بوو . ( ۳۰ ) ما مۆستا قەناتی کوردۆ لە (تاریخا ئەدەبیاتا کوردی) یە کەیدا کە چا و گە ی رایەکانی دەربارە ی جزیری بو چوونەکانی وەزیری نادری یەو ئەو دە یلیتەو و واپیشاندەدات کە مەلای جزیری ئیزدی بوو و لە هۆزی حەسەنی ئیزدی یانەو بە لەزەت و کەیف و سەفای خۆیدا هەلیدا وەو سترا وەو بو رەنگ و رووی سروشت و ئەقین و شەراب نووسیویەتی و دوواییش کە حەزی لە کچی میر عیما دەدین کردوو (مەبەستیش مـ میر عیما دەدین کۆری اکسان قەرە یە لەعەشیرەتی بۆتان) شیعری دلدار ی گوتوو و ئەوینی خۆی و کچی میری لە شیعردا باس کردوو و کە میریش بە و کەین و بەینە ی زانیو و یستوو یەتی کچە کە ی بە مەلا بدات ، وەلی مەلا نە یویستوو کە نیشکە ئیسلامیک ببیتە هاوسەری . ( ۳۱ ) جارێ پێشەکی میر عیما دەدین لە ئارادا نەبوو و مەلاش لە سەردەمی ئەودا نەبوو و بەلکو لە رۆژگاری میر شەرەفدا بوو ، کە وابی مەلاو میر عیما دەدینیک کە نەدیو و نەناسی یە کدی بوون و با و کیشیان لە مزگەوتیکدا نوژیان نە کردوو و یە کدی یان ناس نە کردوو چۆن و کە ی و لەکو مەلا حەزی لە کچی ئەو کردوو ؟ ئەمە لەلایە کەو و لەلایەکی تریشەو بە خویندەو ی شیعری مەلادا زۆر چاک و راست و رەوان وەدەردە کەو ی کە مەلا ئیسلامیککی تەوا و ئیسلام و بی پیچ و پەنا بوو و زۆر بەی شیعەرەکانیشی تژین لـ ئایەت و وشە ی قورئان و ناوی خودا و پیغەمبەران ، جا کە برایەکی ئیزدی با وەر پ بۆچی دەبی لە بیروبا وەر و فەلسەفە ی ئیسلامدا خۆی بتوینیتەو ؟ راستە خەلکیکی زۆری کـورد لە پێشدا ئیزدی بوینە بەلام جزیری بەخۆی وەکو ئایین و با وەر پ ئیزدی نەبوو ، رەنگە با و با پیرانی لە کاتی خۆیدا ئیزدی بووبن . ما مۆستا سادق بە ها ئوددینیش لەو با وەر پەدا یە کە جزیری مروقیکی سۆفی و لەخواترس بوو و ریگە و تەریقەتی نەقشەندی گرتو تە بەر لە تەسەووفدا بو گەشتن بە ئا مانجی خۆی کە ئەویش ئیزیکبوونەو ی یەزدانە . ( ۳۲ ) مەلای زقنگیش باسی ئەو ی کردوو کە جزیری لەسەر تەریقەتی نەقشەندی بوو . ( ۳۳ ) جزیری خودا ناسیککی راست بوو و لە خوا پەرسەتیدا هیندە کور بوو تەو کە با وەری بە تووانەو هەبوو لە نیو بوونی خوادا و گەشتوو تە پەلی یە کبوون و هیچ شتیکیش لەکن وی نرخی نەبوو و لەگشت شتیکدا خوی وەدی کردوو . . . ئەو دە بیژی :

مەینەت ژ خودایی کۆب عەبدی خۆ مەلایی ئیکسیری غەمی عیشق نە دینار و درەمدا ئەوانە ی کە لە تەسەووف دووان و قوولبوونە تەو با وەر پیران وایە کە هەموو خۆشەویستیک

لهکن سوڤي خوښويستني خودايه و خهريککړدني دلہ به ئەقيني راستهقينهوه . مەلا به و زمانه کوردیه پاراووناسکهی که شیعري پي گوتووه ، شیعري دلداري تەروبهجوښ و پرههستي ناسک ، تەنانەت گەر دلشي به و کيژه کورده (سەلما) ناوہش دابيت که چەند شوخ وشەنگ وقشتيلهوناسک ونازدار بووبيت و خوا هەرچی جواني رندی ههیه بهوي دابئي ، مەلا لهنيو چاواني ئەو کيژهدا خوداي بەدي کردووه و ئەقينهکەيشي هەر بۆ خوا بووه و به و کيژهشدا هەلیداوه چونکو ههموو توانست و شاکردو جواني خوداي له روخساري شوخه دنيايهکهيدا ديوه و لهوئەقينه مهجازيهوه بهره و ئەقينه مهزن وراستهقينهکه چووه . (۳۴) جزيري بهمهي خوښهويستي يەزدان مهستبووه . (۳۵) لهعيرفاندا مهلای جامي مهولاناي رومي بهلخيشي پي راناگەن . (۳۶)

دەنيو خەلکي ئەدەب و رهوشندا تەني سوڤيکان موسيقايان به مهسەلهيهکي رهوشي زانيوه و له روانگهي فلسهفيوه بۆي چوون وههستيان به پيوستي چرپيني شيعر به گوراني و لهههموو جيايهکدا کردووه و لايان پهسەندبووه . مهلای جزيريش گوراني و موسيقاي به مهسەلهيهکي دژ به تايين نهزانيوه . موسيqa با جزيري دهربرينيكي سيمبوليه له عيشقي يەزداني و هەرکيرانی ئەقينه له توانستییکی دەرروونی وروحيي شاراوه بۆ چەند سيمبوليكي دەررووني ئاشکراکرا و کههست وبيره شاراوهکاني دەررووني دلداري پي دهردهپردي . ئاواز پهرده لهسر ههموو نهينيهکان لادهدات ولهشيوه دهربريندا خویده نويني . جزيري موسيqa و ئاوازي بهجوښ وخوروشي به ئاوازيكي خاوييني دەررووني به رزگاربووني لهپيسي و ناپوختهيي ژياني ههستپيکراوي ماددي داناوه . بيهوودهيي نک جزيري پهيوهندي به موسيqa وههيه ، روژي بيهووده ئەوروژهيه که نه ئاواز و نه موسيqa تيدايه ، مههستيشي لهوه ئەوهيه که ئەوروژهي زيکروويردی خوداي تيدا نهبيت روژيكي راستهقينه نيهو بهفيرو دەرپوات . (۳۷) جزيري گەلي جار باسسي شمشال و ساز و ئاوازي کردووه و وشه ي زوريشي بهکارهيناوه که هەر پهيوهنديان به دهنگه وههيه وهکو دهنگي مهل وبروسکهو زهنگ که ههموو ئەو دهنگدانهويه ههستدەکن که دهگل دهنگي ههتا هتايي و بيکو تاييدا - که ئەویش خودی يەزدانە - تیکەل وئاويته دەبن . دهنگ .. ئاواز .. مهی .. جوانی .. بيرکردنهوه .. ههست .. ههموو ئەوانه هون بۆ دهربريني خوښهويستي بيکو تايي و قولترين ومهزنترين خوښهويستي که ئەویش خوښهويستي وئاويتهبووني يەزدانه .

جزيري پياويكي هەلکەوتوو زانايهکي مهزن وليها توو بووه لهسەردهمي خویدا و نهک تەني له جزيرابوتان بهلکو له کوردستان وروژههلاتي نيوهراستيشدا ، سهروهري زانسا و روشنيراني چەرخي خوئي و پيش خوئي بووه و هەر لهبەر ئەوهشه که خاني نهمر له شاکارهکهيدا (مه م و زين) پيش هه مووان له شاعيراندا ناوي ئەوي هيناوه . جزيري بهوهي که ههلبهستي به زمانى شيريني کوردي نووسيوه کاريكي يهکجار گرنگي کردووه له پاراستني زمانى کورديدا و هەر لهبەر ئەوهشه که زيتر خوښهويستبووه لهنيو کوردا هەر بويهش گوتويهتي:

گەر لوڤلوهي مەنشور ژ نهظمي تو دخوازي وەر شيعري مهلي بينه ته بشيرازي چه حاجت نيازي مهلا ئەوه بووه که گەر ميلهتي کورد ههلبهستهکاني بهزمانى شيريني سکماکي خوئي ( که ئەویش کوردیه ) بخوينهوه و ئاوازي خوئي بۆ دابنين چ جار پيوستي به زمانى بيگانه نيه ، ئەوهش دهگهيه ني که مهلا هيج کاتيک خوئي بهنزمتر يا کهمتر نهزانيوه له شيرازي ، ئيدي کامه شيرازي بيت ، سهعدى ياکو حافر .  
شيعرهکاني مهلا هينده ريک و رهوان وبهتام و پرمانان ولهگيش وسهنگ و ههموو لايهکيهوه

ته واون و چ خوارو خيچيان تيڊا نيهه و زمانيشي شيرين وپاراوو پاڪه . گهلي جاران  
 ڪراونته گورانيو بهئا وازهه و گوتراون وله بهرڪراون بهتايبهتي دهنيو ديوه خانان و  
 مزگهوتاندا . جزيري له پيزي شاعيران روهه لاتي ناقيندا بووه و مملانيشي دهگهل  
 وندا ڪردووه و بهلڪو له وانيش له هه ندي لايه نه وه بالتر بووه . جزيري خودانسي  
 خويندنگايه ڪي تايبهتيه له نه ده بهي ڪورديدا و له روهه لاتي ورهه واپا ڪووري ڪوردستاندا .  
 ڪيش وقافيهي شيعره ڪانيشي به جوركي نه وهنده قهشنگ و دلگير هونيوه ته وه نه خواهه لالا  
 هه لبهستي نه قينداريو سوڦي تي ، گهرچي چند پرسين عه ره بهي و فارسيو جار جاريش تورڪي  
 له شيعره ڪانيدا به ديده ڪرين نه وه ته سيري ناييني عيسلام و زمانه نايينه ڪشي ڪه  
 عه ره بهي ده گهيه ني له سر زمان وهه موو ڪاري ڪي روشن بيري ڪه له وسه رده مه دا ته ني شيعر  
 هه بووه ، جگه له وهش جزيري شاره زايو و پسيوري ته واري له زمانه بيگاناندا به تايبهتي  
 عه ره بهي و فارسي هه بووه و گه ليڪ جاريش به و زمانه و تيه ل به ڪوردي شيعري نووسيوه .  
 گهلي ڪهس له و با وه رده ان ڪه ته سيري حافزي شيرازي و جامي و شيعري فارسي به ته واري  
 وه ديارد هه ڪوي له شيعري مه لاي جزيريدا به لام ماموستا صادق به هائوددين شيعري  
 عه ره بهي به ڪارتي ڪه ركي سه ره ڪي داده ني تي له هوزاني ولاتاني روهه لاتي ني وه راستدا به تايبهتي  
 ولاتاني موسولمان وه ڪو فارس و تورڪ و ڪورد . (۳۸) من له و با وه په دام ڪه رولي تاڪ و ته نيا  
 هي شيعري عه ره بهي نه بووه بهلڪو ناييني عيسلامي ڪاري ڪي واري ڪردووه ڪه زمان و نه ده بهي  
 ميله تاني ها و نايين ڪار بڪه نه سر به ڪتر ، بيگومان ڪورديش وه ڪو ميله تي ڪي ژيرده ستهي  
 فارس و تورڪ له وسه رده مه دا زور ته سيري نه واني ڪه و ته سه سر به تايبهتي فارس چونڪو  
 وه ڪو زمان له ڪوردييه وه گه ليڪ ني زيڪه و وه ڪو نه ده بهيش پايه و جيگه به رزي هه بووه  
 له مزگه و ته ڪاني ڪوردستانيشدا ته نانهت تا هم دووايهش ، سه عدي و حافزو جامي و  
 زوري ترين ده خوينران . ههرچي زمانه عه ره بهيشه بيگومان نه ويش زمانه ناييني عيسلام  
 بووه و هه ره به پير و زيش دانراوه و فقيان به چاڪي خويندويانه و جاري و ايش هه بووه له عاره ب  
 چتر زانيويانه . مه لاي جزيريش وه ڪو ڪورديڪ بيگومان فارسيو عه ره بهي و ته نانهت تورڪيش  
 ڪاري ڪر دوته سر ، به لام وه نه بهي نه و بهو ڪارتي ڪردن و ته سيره قايل بووپي تي و نالي  
 سي هه لڪر دي بهلڪو به پيجه وانه وه "به رزي مه زني جزيري له وه دايه ڪه رولي زمانه عه ره بهي  
 له ڪاتي ڪدا گهيش توته چله پوپه مه لا له و ڪا ته دا له و ريچڪه به لاي دا وه و عه ره بهي به ڪوردي  
 رازاندوته وه و مه شخه لاني ڪي هه لگير ساندوه بو نه وه ي ثوده باي عه ره ب زهنگيانه ي له بهر  
 بهوننه وه و بو نه وه ثوده باي ڪورد شوين رچه ڪه ي مه لايان بو بي به شاري ڪه و له عالمي  
 بيگاناندا مه لايان بو بي تي به و سيمرخه ڪه ناي و زيان نه ده بهيان له پشت ڪيوي قافه وه  
 بو ديني تي . ڪه و ابو ميژوي نه ده بهي ڪوردي به دريژايي زه مان ڪر نوش بو نه و تا پوييه  
 نه با ڪه هه يڪه لي زي ريني مه لايه و پيغه مبهري سه ده ي يازده هه ميه تي " (۳۹)  
 مه لاي جزيري هه موو با به ته ڪاني شيعري عه ره بهي لا به دي ده ڪري (قهسيده ، غزه ل ،  
 روبا عيات (چوارين) ، ته خميس (پنج خسته ڪي) ، ته لميع ، موسته زاد ، فهد ( ۴۰)  
 جگه له وهش له بهلاغه ي عه ره بهيدا وه ستا بووه و به دي عه و بهيان و مه عاني و جيناس و ته لميح و  
 ته شبيه و عيستي عاره و مه جازو ڪينا به و نه تناب و عيجازي خر به ڪاره ي نا وه . (۴۱) عرو زو بحوري  
 شيعري عه ره بهي زور وه ستايانه به ڪاره ي نا وه و هه موو هوزانه ڪاني له سر نه وانه داناهه و  
 گهلي جاريش به حري دريژي بو دارشتنه ي شيعر ڪردووه به بناخه و گومان له وه دا ناميني تي ڪه  
 وه ڪو زانستيڪ (عيلمڪ) عه رزي زانيوه ، شاعيران روهه لاتي نا وه راست تا چند  
 ساليڪ له مه وه ريش له سه ري ده رويشتن و له ڪورديشدا تا په دا بووني گوران په پره وي  
 ده ڪرا و نه و قوتا بخانه يهش ڪه خانيو نالي و حاجي قادي ڪويش . (۴۲) قوتابي بوون و  
 جزيري ده ستي پي ڪرد ڪلاسيزمي نه ده بهي ڪوردي ده گريته وه . به ره مه ي جزيري ڪه شيعره ڪانيه تي

یه کهم بهر هه می ئه ده بی نووسراوه له ئه ده بی کوردیدا . (٤٣) هه ره پویش مه لای جزیری به سه ره تای شیعی کلاسیکی کوردی داده نریت و هه رچهند بابا تا هیری هه مه دانیش پیش ئه و چوارین (رباعیات)ی هه بووه و به کوردیش بووه به لام له به ره ئه وه ی له رووی په پیره وی کردنی عروزه وه ناته وا و بووه و به لکو هه رنه شبووه ، ئه و به سه ره تا دانانری ، جگه له وه شه نه عه لی تهرموکی و نه عه لی هه ریریش ناتوانن سه ره تا بن و مملانیان پینا کریت له گه ل جزیریدا . گه لیک له شاعیرانی کورد پاش جزیری ویستوو یانه لاسایی ئه وه و بکه نه وه و له سه ر ریچکه ی وی پرۆن ، یان هه ولیاندا وه شتیک بلین له شیعی ئه وه وه نیژیک بی ولیی بچیت ، له وان هه ش : شیخ نوره ددین بریفکانی ، ئه حمه د ناله نهد ، ئه نوهر مائی ، جگه ر خوین ، عه بدوله رحمان مزوری ، به درخان سندی و مه سه عود موسته فا ئامیدی . (٤٤) مه لای جزیری رابه رو پیشره وو وه ستای شیعی کلاسیکی کوردیه و نموونه یه کی نایاب و بیهاوتا و پررخ بووه بو شاعیرانی کورد به گشتی و کرمانجی زار به تابه تی .

### دیوانی مه لای جزیری :

یه کیک له و کتیه به نه رخانه ی که ده شی کورد هه موو گا قه ک شانازی پیوه بکات دیوانی جزیری نه مه . گه ر له گه ل شاعیرانی ده ورو به ردا به را وورد بکری ده کری دیوانی جزیری له ریزی حافزی شیرازی جامی فارس و ئه بنولفارزی عه ره ب و فزولی تورکدا دا بنریت . (٤٥) له به ته وی به هیزی به نه رخیدا که هونه ریکه له وگۆره ، دیاره له به ر ئه وه شه جزیری یه کیکه له و شاعیرانه ی که خوشبه خت بووه چونکووزۆری له سه ر نووسراوه و کۆلراوه ته وه گه ر له گه ل شاعیرانی دیی کورددا به را وورد بکری . دیوانی جزیری چهند جاریک چاپکراوه ته وه و له شوین و جیگه ی جیا جیا به م شیوه یه :

- ١- له سالی ١٩٠٤ ی ز له به رلین له لایه ن رۆژه لاتناسی ئه لمانیه وه ( فۆن مارتن هارتمان ) به لینوگراف چاپکراوه و به زمانی ئه لمانیش سه ره تای بو دانراوه .
  - ٢- له سالی ١٣٣٨ ی ک / ١٩١٩ ی ز له ئه سه ته موول له لایه ن ( موحه مه د شه فیق ئارواسی حوسه ینییه وه ) چاپکراوه .
  - ٣- له سالی ١٩٥٨ له لایه ن مه لا ئه حمه دی مه لا موحه مه دی بو تی زقنگی یه وه له قامیشلوی کوردستانی سوریا له گه ل پیشه کییه ک و شه رح و لیکولینه وه ی شیعه کانه دا به عه ره بی چاپکراوه .
  - ٤- له سالی ١٩٦٤ دا له لایه ن ما موستا گیوی موکریانیه وه له هه ولیر چاپکراوه .
  - ٥- له سالی ١٩٧٧ دا له لایه ن ما موستا سادق به ها ئوددین ئامیدی یه وه له به غدا له گه ل توێژاندندا چاپکراوه .
  - ٦- له سالی ١٩٨٢ دا له لایه ن مام هه ژاری موکریانیه وه له گه ل پیشه کی و شیکردنه وه ی شیعه کانه دا له تاران چاپکراوه .
- جگه له وه شه له گو قاری ها واردا له ژماره ٣٥ - ٥٨ ی سالی ١٩٤١ - ١٩٤٣ دا شیعه کانه جزیری نووسراوه ته وه له لایه ن نه مر جه لاده ت به درخانه وه . له و ده سه تنووس و ده سه تانه ی دیوانه که شه که له لای خه لکی ما ونه ته وه ئه مانه ن :
- ١- ما موستا موحه مه د عه لی عه ونی ده سه تنووسکی له چاپی به رلینی هارتمان وه رگرتووه و له کتیبخانه ی ( دارالکتبالمصریه ) دا یه له قا هیره .
  - ٢- ده سه تنووسکی تری دیوانه که له لایه ن ( عه بدوله سه لام کوری موراد کوری عه بدوله لام ) له سالی ١٣٢٢ ی کۆچیدا له شاری جزیره نووسراوه ته وه که وتۆته لای ما موستا موحه مه د عه لی عه ونی .

- ۳- دهستنوو سیکی ( عبدولقادر علی ئامیدی ) که له سالی ۱۳۳۸ ی ک له ئامیدی نووسراوه تهوه که وتوته لای ما مۆستا علائوددین سه جادی .
- ۴- دهستنوو سیکی ( طه ئهبوبه کر مهلا علی ئارواسی ) که له سالی ۱۳۵۵ ی ک له شاری زاخۆ نووسیویه تیه وه که وتوته لای ما مۆستا سادق به ها ئوددین .
- ۵- دهستنوو سیکی ( مه سعود مهلا سه عیدی دهۆکی ) که سالی ۱۹۷۰ له سهر دهستنوو سیکی نووسیویه تیه وه که سالی ۱۴۲۱ ی ک نووسراوه و کابراش که نووسیویه تی ناوی خۆی نه نووسیوه .

سهرچاوه کان :

- ۱- شهره فغانی بدلیسی - شهره فنا مه - وه رگی پانی هه ژار - تاران ۱۹۸۱ - ل ۲۲۷ (چاپی دووهه).
- ۲- سادق به ها ئوددین ئامیدی - هوزانقانی کورد - چاپی به کم - به غدا ۱۹۸۰ ل ۸۴ - ۸۵ .
- ۳- موحه مه د ئهمین زه کی - خلاصه تاء ریخ الکرد و کردستان - به شی به کم - وه رگی پانی موحه مه د علی عه ونی - چاپی دووهه - به غدا ۱۹۶۱ - ل ۲۳۶ - ۲۳۸ .
- ۴- سادق به ها ئوددین ئامیدی - هه مان سهرچاوه - ل ۲۹ .
- ۵- هه مان سهرچاوه - ل ۸۳ - ۹۹ .
- ۶- هه مان سهرچاوه - ل ۳۰ - ۳۱ .
- ۷- شهره فغانی بدلیسی - هه مان سهرچاوه - ل ۲۹۲ .
- ۸- هه ژار - دیوانی مه لای جزیری - تاران - ۱۳۶۱ - پیشه کی - ل ۲۲ .
- ۹- احمد بن محمد البوتی الزقنکی - العقد الجوهری فی شرح دیوان الشیخ الجزیری - الجزء الاول - القامشلی ۱۹۵۸ - المقدمه - ص : ل .
- ۱۰- هه مان سهرچاوه - ل : و .
- ۱۱- هه ژار - هه مان سهرچاوه - پیشه کی - ل ۱۳ .
- ۱۲- هه مان سهرچاوه - ل ۱۴ .
- ۱۳- موحه مه د ئهمین زه کی - هه مان سهرچاوه - ل ۳۳۶ .
- ۱۴- علائوددین سه جادی - میژووی ئه ده بی کوردی - به رگی به کم - به غدا ۱۹۵۲ - ل ۱۶۲ - ۱۶۳ .
- ۱۵- سادق به ها ئوددین ئامیدی - هه مان سهرچاوه - ل ۸۱ .
- ۱۶- هه مان سهرچاوه و لاپه ره .
- ۱۷- تهوفیق وه هبی - اصل الکراد ولغتهم - گو قاری کو پری زانیاری کورد - به رگی دووهه - به شی به کم - به غدا - ۱۹۷۴ - ل ۱ - ۲۴ .
- ۱۸- D.N. Mackenzie - Malā-ê Jizri and Faqī Tayran - xād Nāme-ye Irānī-ye Minor sky - publication of Tehran University - Tehran 1969 N:1241-P:125 .
- ۱۹- هه مان سهرچاوه - ل ۱۲۵ - ۱۲۹ .
- ۲۰- احمد بن محمد البوتی الزقنکی - هه مان سهرچاوه - ل : ل .
- ۲۱- هه مان سهرچاوه - ل : م .

Prof. Qenatê kurdo - Tarixa Edebejeta kurdi-1- 38  
Stockholm 1983 - L = 90

ما مۆستا قەناتی کوردۆ رایهکانی خۆی له نووسینیکی وهزیری نادرییهوه وهرگرتووه  
 که بهنیوی : *Me'lumetîyêd teze derhega Şayîrê Kurd yê*  
*Sedsaliya navîn Meleyê Cizîrida* .

که له سۆقیهتدا له سالانی ۱۹۴۵ - ۱۹۴۷ دا تاکه کەسی بووه که مژوولی گهران  
 بووه به دووای دیوانی مهلای جزیریدا و سالی ۱۹۴۶ مردوووه و نووسینهکەشی ماوه تهوه و  
 دووای خۆی *Nura palatova* ی ژنی وهزیری ئه و نووسینهی داوه به ما مۆستا کوردۆ  
 بۆ ئه وهی چاپییکا ، ئه ویش شان دوویهتی بۆ ( کۆما کوردناسید ئه ریقانی ) بـو  
 چاپکردن و نه کراوه ، ما مۆستا کوردۆ جاریکی دی بۆ ( عه لی عه بدولپه حمان ) ی کلکردووه  
 بۆ ئه وهی له رۆژنامهی ( ریا تازە ) دا بلاویکاتهوه یان چاپیکات ئه ویش نه یکرد .  
 مه قاله که له ئەسلدا به رووسی نووسراوه و وهرنه گێرپه دراوه ته سه ر زمانی کوردی و  
 ره شنووسی ئه و نووسراوه له کن ما مۆستا قەناتی کوردۆیه . تائیره ما مۆستا کوردۆ  
 خۆی ده یگێرپه ته وه . . سه یر له وهیه که له سالی ۱۹۴۶ وه تا وه کو ئیستا ئه و نووسراوه  
 نه کراوه ته کوردی و هه ر به رووسی ماوه ته وه و به سه ر ئه و هه موو کۆمه له و رۆژنامه و  
 زه لاهه زلانه شدا تیپه ربوووه و هینده ئەم ده ست و ئه و ده ستی کردووه که ره نگه ئیستا  
 کا غه زه که شی پوتورکابی . . که چی تا ئیستاش به ره شنووسی ماوه ته وه و ته نی ما مۆستا  
 کوردۆ ده توانی سوودی لیوه رگری چونکو لای خۆیه تی . ئینجا ده بی کهنگی بگریته کوردی  
 که ی له چاپ بدری ؟؟ ره نگه چل سالیکی تریش چاوه پروان ببین . . شیردا لو دا پیردا .

- ۲۳ - هه ژار - هه مان سه رچاوه - پێشهکی - ل ۲۳ .
- ۲۴ - شه ره فحانی بدلیسی - هه مان سه رچاوه - ل ۳۱۲ - ۳۱۷ .
- ۲۵ - سادق به ها ئوددین ئامیدی - هه مان سه رچاوه - ل ۱۶۱ - ۱۶۲ .
- ۲۶ - هه مان سه رچاوه - ل ۱۲۹
- ۲۷ - فه ره اد شاکه لی - مو حازه ره بو قوتا بیانی به شی کوردی - خویندنگه ی به رزی  
 ما مۆستایان له ستۆکه هولم - ۲۷ / ۹ / ۱۹۸۴ - ئەمه وه کو نووسرا و نییه .
- ۲۸ - احمد بن محمد البوتی الزقنگی - هه مان سه رچاوه - پێشهکی - ل : ل - س .
- ۲۹ - عه لائوددین سه جادی - هه مان سه رچاوه - ل ۱۵۵ .
- ۳۰ - هه مان سه رچاوه - ل ۱۷۶ - ۱۷۷ .
- ۳۱ - هه مان سه رچاوه - ل ۹۰ - ۹۱
- ۳۲ - سادق به ها ئوددین ئامیدی - هه مان سه رچاوه - ل ۱۰۴ .
- ۳۳ - احمد بن محمد البوتی الزقنگی - هه مان سه رچاوه - پێشهکی - ل : ج .
- ۳۴ - هه ژار - هه مان سه رچاوه - پێشهکی - ل ۱۱ - ۱۲ .
- ۳۵ - سادق به ها ئوددین ئامیدی - هه مان سه رچاوه - ل ۱۳۱ .
- ۳۶ - هه ژار - هه مان سه رچاوه - ل ۱۱ .
- ۳۷ - دکتور به درخان سندی - الموسیقی فی شعر الجزیری - کاروان - ژماره ( ۷ ) -  
 نیسانی / ۱۹۸۳ - ل ۱۱۶ - ۱۲۱ .
- ۳۸ - سادق به ها ئوددین ئامیدی - هه مان سه رچاوه - ل ۱۳۸ - ۱۵۸ .



- ۳۹- علائوددين سجادی - هه مان سه چاوه - ل ۱۷۱ .
  - ۴۰- فههاد شاکهلی - هه مان سه چاوه .
  - ۴۱- علائوددين سه جادی - هه مان سه چاوه - ل ۱۷۱ .
  - ۴۲- سادق بهائوددين ئامیدی - هه مان سه چاوه - ل ۹۳ .
  - ۴۳- دکتور بهدرخان سندی - هه مان سه چاوه - ل ۱۱۶ .
  - ۴۴- سادق بهائوددين ئامیدی - هه مان سه چاوه - ل ۱۳۸ - ۱۵۸ .
  - ۴۵- احمد بن محمد البوتي الزنكي - هه مان سه چاوه - ل : ج .
- لهو سه چاوانه ی دیکهش که له سه ر مهلای جزیری ههیه ، رۆژنامه ی جیهاد که دهنگی بزوتنه وهی ئیسلامی عیراقه به کوردی له تاران ده رده چیت - ژماره ( ۲۱ ) - سالی سیهه م - ۲۷ ی گهلاویژی ۱۹۸۲ .

Pirtûk : APO  
 Niviskar : OSMAN SEBRI  
 Çapxane :

Pirtûka "APO" ya Osman SEBRI ji 69 helbestan pêk hatiye. Ji wan 8 heb di nav hejmarên kovara "Hawar" ê de ji hatiye weşandin. Di 6 (şeş) helbestanda ji Osman Sebri pişe ya "Fabil" bikaraniye. Sê (3) helbest ji bi navê "Newroz" hatiye nivîsin.

Mîna daxwaz dikir ku, ez yek bi yek li ser helbestan bisekinim. Lê ev yeka hem ji ali amanca vê xebatê û him ji ji bo ku hema hema temama helbestan li ser babetekê (mewzu) -nemaze hesreta Kurdistanek aza û gazin- hatine nivîsin mîna pêwîst nedit ku yek bi yek li ser helbestan bisekinim.

Pirtûk li kijan salê û li ku derê hatiye çapkirin ne kifş e. Di sala 1977 an de Osman Sebri bi xwe pêşgotinek nivîsiye. Dr. Nureddin Zaza di 12 meha Adarê sala 1980 yan de pêşgotinek nivîsiye. Di 11 meha Adarê 1981 an de ji Hemreş Reşo li ser jiyana Osman Sebri û pirtûkx nivisek nivîsiye (wek pêşgotin) Ihtimalek mezîn e ku pirtûk piştî vê tarixê hatiye çapkirin. Di pirtûkê da li ser jiyana Osman Sebri sal bi sal kronolojiyek ji heye.

Helbestên Osman Sebri, nemaze yê ku di "APO" da ji jiyana wi nikare bê te qutkirin (dabirrin). Wek ku tê zanîn Osman Sebri gelek sal ji jiyana xwe di heps û zindanan de bihurandiye. Ji ber vê yekê ji, hesreta Kurdistanek aza û gazin di helbestên wi de gelek cih digre.

Di helbestê wi ya "Çuyin" de ev gazin gelek xweş tê diyarkirin :

".....

Lê hatim dinê di nireki pîr bê bav  
 Ketim xebatê digel kesin bednav

.....

Rumeta kurdan paymal kirin di cihan  
 Tevda bûn terriya dijmin bi navê kurdan"

.....

Gava ku mirov li jiyana civaki ya Kurdistanê dinêre tê ditin ku, şêxiti, axati, nezani rolên mezîn dilizin. Ku mirov zilm û zordestiya kolonyalista ji li ser vê zilm û zordestiyê ke, dê mirov gazin û qêrinê Osman Sebri de bigêhêje. Ev gazin, di helbestên wi da carna ji "felekê", carna

ji "yezdan" û carna ji ji xelqê (gelê) kurdên ku "xebat" nakin tê kirin. Lê her çuqas (çend) ji nexebatiyê, ji nezaniyê gazin tê kirin ji, xebatek çawa, zanistiyek çawa divê bê te kirin di helbestên Osman Sebri da bi awaki vekiri nayê xuya kirin. Xebata ku di gelek helbestan da tê daxwazkirin, xebata çekdari ye:

".....

Ez dibinim xortên me bi felsefe û qurên,  
 Hemi dûri qada şer dipeyivim, diçim, tîn  
 Dest navêjin tîngê nabîn pêşengê Cotakar"

.....

Hesreta Kurdistaneka azad û ji bona wê xebatek tu car Osman Sebri ne westandiye. Her ev hêvi bi xwe re hilgirtiye. Bi vi rengi jiyaneke dîr û dirêj, car carna di helbestên wi da bi baweriyayîna bir û baweriyên çewt ji aniye :

".....

Bibin komonist, komonistên kurd, kurdên komonist  
 Di vê rêya han dengê me kurdan cihanê bihist.

....."

Di sala 1956 an de wilo dibêje. Ango komonist baş in. Ji ber ku "Ev bûne deh sal li Mosko diji Mustafa Berzan". Lê di sala 1978 an de ji weha dibêje :

".....

Dema bîndestbim çî rast û çî çep tev kolidarim.  
 Mafir dixwazî serdesti me bîn, hemî neyarim.

....."

Ev ji vekiri û eşkere dide xuyakirin ku, di helbestên "APO" de bir û baweriyek rêzani ya rûniştî tune ye. Ango istikrerek bir û baweriyek rêzani -siyasi- ya rûniştî cih negirtiye.

Di baweriyayîna da ev yeka ji ber welathezkirina wi ye. Zilm û zordestiya ku di jiyana xwe de ditiye, ew ji dervi vê yekê -welathezkirinê- ji ditinek rêzani ya rûniştî dîr xistiye.

Ji hêlek din ji, di helbestên "APO" da kulturek gîştî û fire nayê ditin. Zêdetirîn li ser hevdukirina peyva û kafiya hatiye sekînan.

Diqewime ku, carna niviskareki nikare tewra xwe bi hunermendi di eserên xwe da nişan bide. Nivisina edebi ne kareki hêsa ye. Haziriyek dūr û dirêj, kultur û hêçan divê. Li pişeyê, mijûlbûnek ne amatori nêrin divê.

Em vegerin li ser pirtûka MEYRO ya Mehmed Emin Bozarslan.

Bozarslan niviskareki civaki û sosyalimê ra vekirîye. (Ev ditina, ku Bozarslan bi xwe li hember dernekeve, ditinek ku me ji xebata wi ya giştî derxistiye.)

Di çirokên pirtûka MEYRO da Bozarslan birinên ku di civata Kurdistanê da hene -wek şêxîti, xurafe û hwd.- tene mina neyinekê bi pêşkiri-nê ve debar dibe. Li ser nebaşiya wan, xerabiya wan û ya heri mezin li ser hoyên wan çet nesekirîniye.

Li gel devgrêdana gur, mırina çêlekê Pira Zero, li gel "birrina tayê", mırina Ferho, guhertina zaroka Zelxê, ji hêla "ji me çêtira" ve, ev giştî ji "bûyera" re neynik girtine.

"Ji me çêtira", zaroka Zelxê ne guhartibûn. Vêca zarok çima mîr?

Niviskar di çiroka xwe da dixwaze bêje, "li ba (cem) me muessesên wilo paşverû hene."

Baş e. Lê ev ne tiştêki veşirtîye ki. Evana çewtin an na, başin an na? Bersiv nine.

Em dizanin niviskar van muessesena çewt dibine, lê divê di çirokê xwe de bine ziman.

\* \* \*

Piraniya "bûyera" mîrîna e. Ji deh çirokan pênc heb bi mîrîna dawî dibe.

- Zaroka Zelxê dimre, sebab "ji me çêtira" in.
- Rindê bi dergûşê -avise- gava cîla dişo dimre.
- Ferho di germaya havinê da ava sar vedixwe nexweş dikeve û dimre.

- Çêleka Pira Zero wenda dibe, berata wê tê ditin.

- Meyro mar pêvedide, dimre.

Mîrîna, mîrîna, mîrîna!

Di çirokada têkiliya hoy û encam -netice- ya ne hatiye rûniştandin. Niviskar di vê babetê da ya "bûyer" nivtari hiştiye yan ji li ser hoyên wan ji xwendevanan re mesajek ji rastiyê geleki dūr dide.

Hele ji çiroka "Nan û Se" re çirok gotin geleki zehmet e. Sidar dihulkume. Nan dipengze û kûçik -se- nanê wi dixwe... Anormali çiyê di vê derê da? Çirok bê amance.

Her çiqas piştqapaxa pirtûkê di dema yek parti da behsa zilm û zordestiya cenderma dike ji, gava ku sedema destdanina ser çaqmaq -hestenayê danin encamek -neticeyek- ji bûyerê nayê derxistin.

Çiroka "Kum ê Tiftik" ji wisa ye. Ciyê heste kum, cihê cendirma ji tûlê kuçan girtiye...

Çirok, carna wek "çiroka bûyerê" dikare bête nivisîn. Lê "bûyer" bê sebab û bi raberiyek laletayin -çewterast- bê te bikaranin ji wê tu babet nayê derxistin.

"Bûyer" ne pêwîst e ku tenê her mîrîna be, ya zilma cenderma û bobelat be. Mesele ewe ku mîrov karibe wê têke teşeki ku bibe "bûyer". Wek ku Brecht dibêje: "biyanetiya wê bi cih bine".

\* \* \*

M.E.Bozarslan di çirokên xwe da, xwe sîpartîye bin tesira "bûyer" ên ku wi bi xwe hûbjartîye. Ev ji, têra tesirek bi sebab li ser xwendevanan çênake.

Bi bawerîya min, hêla gringehiya pirtûka Bozarslan MEYRO, bi kurdi nivisina wi ye. Û ev ji di şert û şurûte n 1979 da ne kareki hêsan bû.

Ji deriyê ya wek pişe -huner- çirokên di pirtûka MEYRO da hêçanek -azmûnek, taqîkirdîne- wek- neyini ye ji hêla M.E. Bozarslan ve. Lê ev neyini nayê maneya xebata wi ya giştî.

\* \* \*

Eger niviskar ev rêya ha di vê çirokê da ji bîkaraniba, wê gavê pêwistiya ker-guhertinê ji hêla gundi ve ne dihate gotin û kotayiya -dawiya- çirokê dê hîn bi surpriz bîba.

#### 6-) SÎTIL.

"Bûyer" bî mîrîna jînekî -Rîndê- avîs e.

Rîndê, gava ku li ber çem dîke cîla bîşo, sîtîla wê ya avê bî alîkî ve xwar dibe. Rîndê Bona ku sîtlê rast bîke wê bîlînd dîke, lê wê gavê zaroka zîkê wê ji ber dîçe -berdavê- û xwîn ji nava şeqê Rîndê dîherîke û li wê derê dîmre.

Armanca niviskar çîye dîsa xuya nîne.

Dî çirokê da wîsa tê gotin:

"Ne Rîndê bî tenê, pîrekên gund gişt, zivîstîtan bî heft çavan rojên weha xweşî dîpan. Ku rojek xweşî bîdîtana dîçûn li devê çem berav dîkîrîn."

Lê çî hikmete dî rojek weha da gava ku Rîndê li devê çem berav dîke û gava ku dîmre, tu kes ji pîrekên gund xuya nakîn.

Weha xuya ye ku ji destpêkê da kuştîna -nîrandîna- Rîndê dî serê niviskar de heye.

Bî çî rengî be bîla bîbe, lê dîvê Rîndê bîmîre!

#### 7-) DEVÊ GUR.

"Bûyer" wendabûna çêlekekê ye.

Xwediyê çêlekê -Pîra Zero- ji bona gur çêleka wê nexwe, li cem "Seyda" nivîştêkê çê dîke. Lê li gel vê nivîştê ji, Pîra Zero liqî berata çêlekê xwe tê d.

Niviskar dî bûyerê da çîma çêleka Pîra Zero hîldîbjêre? Vekîriye. Pîra Zero xîzan û bêkesê gund e. Eh, her bobelat û tofan ji pêşî bî serê xîzan û bêkesa ve dîteqe.

"Çîvîk dîgere, dîgere li serê garîsê xîzana dîtîne."

#### 8-) TABIRR.

"Bûyer" mîrîna Ferho ye.

Rojekî ji payîzê, Ferho bî derbekê ve nexweş dîkeve. Berî ku nexweş bîkeve rojekî havînê li ser erd bî xweydan ava sar vedîxwe û dîvre radîzê. Ev bûyera li ser xwendevara wek sebaba nexweşîya Ferho tê te xuyakîrîn.

Gundi teşxîsa "tayê" li nexweşîya Ferho dîtin û dîbîn cem melê ji bona tayê wî bîbîrîn.

Ferho roj bî roj dîhele û dîmîre.

#### 9-) ZAVA YÊ DEHSALÎ.

"Bûyer" mahrkîrîna keçekî pazde-şazde salî -Xezal- li kurekî deh salî ye.

Dî vê çirokê da ji nivîsar, wek dî çiroka "Tî-tun Çawa Geriya Ka" bûyerê bî devê yekî dîn -bî devê bavê kurîk- dîde gotin.

Niviskar dî destpêka vê çirokê da behsa xweşbûn û xweşîkbûna behara deşta Diyarbekîr dîke. Ku mîrov nîkare tu têkîlî dî nabêna vê û bûyerê da bîbine.

Gelek mîmkûne ku ji bona bavê kurîk çefîya xwe li ser gîhayê raxe û niviskar ji li ser danîşe, tê te behskîrîn. Ku ne wîha be wê gavê têkîlî dî nabêna xweşbûn û xweşîkbûna behara deşta Diyarbekîr û zavayê dehsalî da heye?

#### 10-) MEYRO.

"Bûyer" bî jînekê -Meyro- ve pêvedana mîrekiye. Bûyer gava ku Meyro pêxwas dîçe ser kaniyê dîqewîme. Nêzî kaniyê mar bî Meyro vedîde û Meyro dîmre.

Lê tîştê ku dî vê çirokê da xerîbe, ewe ku, Mîsto -mêrê Meyro- li civata pesnê jîna xwe dîde û tînazê xwe bî jînê nî mîrê nî gund dîke. Dî civata da nemaze dî ê nî gundan da tîştêkî nedîtiye ku mîr pesnê nî jînê nî xwe bîkî nî tînazê xwe bî jînê nî dîn bîkî nî.

Lê niviskar, ji bona zêrek bûn û bedewbûna Meyro bêje, mêrê wê Mîsto dîke dewrê.

#### WEK PIŞEKEY EDEBÎ ÇIROK Ê NÊRINEK GIŞTÎ LI SER ÇIROKÊN DI MEYRO DA.

Gava ku çirok tê nivîsin, li gel hêla wê ya edebî bî bir û bawerîya kesê ku wê tinê holê pişekar, hunermend- teşe (şîkîl, şêwe, form) dîgre. Dî jîyana rojane da tîşt, bûyer û têkîlî hene. Li hember vana tawîr gîrtî nî îzahkîrîna wan ji bir û bawerîya niviskar, pişekar ne cuda ye. Karê ku têkîrî nî jî hêlekê naverok be, ji hêla dî nî jî teşedayîna wê ye. Têkîliya naverok û teşe ji mantiqa niviskar, pişekar li ser nêrîna bûyeran nîşan dîde.

Dî nabêna tawîrê niviskarekî romantîk û niviskarekî objektîv û rexnegîr da hîm ji hêla tîgîhîştîna naverok ve û hîm ji jî hêla teşe ve ferqê nî grîng hene. Nêrîna niviskarekî materyalist ji jî van her dî aqîma ve jî cudatîr e.

Lı rojhılata Anadoliyê efsaneyên ku dı nava xelkê de jiyana xwe dıdominın, çawa bı awaki neyini tesiri ser jiyana wan a civaki dıke, bı "hunermandi" dı pirtûkê da hatiye xebitandin.

Dı dema "yek parti" dazılm û tırsa cendırma lı ser xelkê, disa bı awaki "hunermandi" hatiye rexnekırın.

Feqiriya xelkê dıde ber çavan."

## BI KURTI LI SER KURTEÇIROKÊN DI "MEYRO" DE

Ez dıxwazım berê kurteçirokan bı dorê pêşî yek bı yek paşê ji bı gıştî lı ser bısekınım.

### 1-) NAN Û SE.

Çirokê yekem Nan û Se ye.

Dı vê çirokê da "buyera" ku mirov dıkare behs bike, ji hêla kuçık ve xwarına nanê ku ji destê Sidar dıpengız e. Bıngehiya ku çirok xwe dıspêre ev "buyera" ye.

Buyer çawa tê bıkarandin?

Sidar, dı gel hevalên xwe dı êxur da dılize. Sidar bırcı dıbe û ji bo ku nan bine dıçe mal. Lı mal, piştı mınaqeşeyek normal bı diya xwe re, parçeyeki nan û xiyareki dıgre û bı lez disa berê xwe dıde êxur. Gava ku nêziki êxur dıbe, lı sıngeki dılıkume û kuçıkek dadıde nanê ku ji destê wi dıpengize û dıreve. Sidar ji diya xwediyê kuçık re çûra dıke.

Bı rasti armanca niviskar çıye, têgıhiştın geledi zehmet e bı vê kurteçirokê ve. Ji ber "buyera" têkılı û kesê ku dı çirokê da tête behskırın ne ecêb û anormal e. Niviskar dıxwaze çı bıde xwendevara bı vê çirokê, ne vekırıye.

### 2-) HESTE.

Dı vê çirokê de ji "buyera" ji hêla cernderma ve destdanına ser hesteki hatiye avakırın. Bûyer û kesê ku têda dılızın, bı rengeki vekırı nehatiye bıkarandin. Heste çıma qedexe ye? .. Bı destdanına ser heste niviskar çı dıxwaze bêje ne vekırıye. Bı rasti mına xwendevar mirov tê nagıhıje ku çıma pişekar zordestiya cenderma bı "buyerek" wısa xwestıye bine berçava.

### 3-) KUM Ê TİFTİK

Çırandına -çetandına- kumeki ji hêla bekçiki ve "bûyera" vê çirokê ye.

Ferqa vê çirokê ji ya "Heste" ew e ku, nivis-

kar ji "bûyerê" ra hınek amadeyi -hazır- dıke. Bı behsa fıkr û pêşnê n Baran ve armanca niviskar ew e ku, xwendevara hayırî "bûyerê" bıke. Lê çı mıxabın kêfxweşıya Baran tenê dı bıngehiya dexsiye de tête bıkarandin. Ev ji, lı ser xwendevara tesirek mezin nake, gava ku kum tê çırandın. Ji şexsiyeta tulê kuçan a neyini nebe, tu namine ku mirov bı çırandına kum kêfxweş bıbe.

### 4-) JI ME ÇÊTIRA.

"Bûyera" vê çirokê, mırina zarokeki dergûşê ye. Zarok pêşî nexweş dıkeve. Lê dı çirokê da sebeba nexweşiyê nayê pêşkırın. Sebeba nexweşiyê teşhisa (naskırına) Pira Xecê tê diyarkırın. Û bı "Jı me çê tıra" ve tê grêdan.

"Jı me çê tıra" zaroka Zelxê dıgıhere. Zelxê zaroka xwe hıldıgre û dıbe cıhê ku lê hatiye gıhertın.

"Te çet ew -zarok- ji xwe çetandiye yan na? " Jı vê pırsa Pira Xecê ra Zelxê vê bersivê dıde:

"Na, bı serê şêx !.. Tım û tım lı nık mın e" Lê pirê dıde ser.

"Dema tu dıçi tendûrê, beravê .. tu çet wê bı tenê nahêli? "

"Haaa, welle rast e !.. Ez çendaki berê çubûm devê newalê, beravê.. Mın ew lı siya dara biyê razand.. Lê ji mın ne dūr bû.."

Weha xuya dıke ku, niviskar ji bona vê bersiva jorın -nemaze beravê- ji Zelxê derine, ji beravê dest bı çiroka xwe dıke.

Yanı çı tê serê zarok, lı beravê, lı bı nı siya darê tê. Xuya dıke ku zarok lı bı nı siya darê nexweş dıkeve, û naxwaze sebebeki ji ji nexweşıya zarok re şanı bıde.

Em bêjin ku xwendevar, bı sebebê ku Pira Xecê tine, baweri nayın, lê nıkarın tu maneyeki ji ji nexweşıya zarok re bıbinın.

Eh,ku ne karê JI ME ÇÊTIRA be, herhal çedera xwedê ye !..

### 5-) TITUN ÇAWA GERIYA KA ?

Dı temama pirtûkê da mirov dıkare bêje tenê ev çiroka nêzikiyê lı bıkarandına pêwıstıyên çirokan dıke. Qurnaziya gundi, bı ser zilma cenderma dıkeve.

Lê niviskar dı vê derê da bê pewısti behsa ew kesê ku çirokê ji wi ra dıbêje dıke.

Dı çirokên dın da ji wıha xuya ye niviskar, bı xwe lı "bûyera" şahıd nebûye. Lê bıkarandına kesê sê'em i tak,(singular) hım xwe, hım ji kesê ku buyere dıbêje nexıstıye dewrê.

Bı vê hêla, gava ku mirov lê dînêre, Bozar-  
lan mina ronakbir û niviskareki bı pır hêl derdi-  
keve pêş me.

Ew dı salên 1960'da miftiyeki ronakbir û  
pêşverû tête naskırın. Ev "Mifti" yê "kürtçü û  
komunist" dı sala 1964 da bı weşandına "İslami-  
yet açısından Şeyhlik ve Ağalık" (Şêxiti û axa-  
ti ji hêla İslami" ve dest bı niviskariyê dıke. Boz-  
arlan, bı vê pirtûka xwe ya yekem, lı tırkiyê û  
Kurdistana Tırkiyê lı hember çına ku kırdayeti  
ya dini, civaki û abûri dı bın destê xwe de civan-  
diye dısekine (radiweste). Bı belavkırına vê pır-  
tûkê ve zılm û zordesti lı ser Bozarlan zêdetur  
dıbe. Lê pirtûk dı nava pêşverû û welatparêzê n  
kurd û türk da gelek rûmet dıgre.

Pirtûka wi ya duwem dı bın navê "Doğunun  
Sorunları" (Problemên Rohlatê -ango Kurdista-  
nê) da du sal şûnde hate weşandın. Dı vê pirtûka  
xwe da, ji hêla sosyoloji, abûri û politika da lı go-  
ra şert û gihana wê demê Kurdistana û Tırkiyê teh-  
lil dıke.

Cara yekem, bı weşandına Alfabeya Kurdi bı  
tipên latini, niviskar Bozarlan dest bı nivisina  
kurdi dıke. Lê Alfabe, ji hêla karbidestên türk ve  
tê qedexekırın. Dı eyini dewrê da, Mem û Zin ji  
ji tipên erebi werdıgerine zımanê türkî.

Bozarlan dıvre dest bı wergerandına pirtû-  
kên ku lı ser tecrubeyên şerên azadiyê hatiye  
nivisin dıke.

Jı Nehrû "Sosyal Devrimler ve Ulusal Savaş-  
lar" (Şoreşên Cıvaki û Şerên Neteweyi), Jı Naif  
Hawatman "Filistinde Halk Savaşı ve Ortadoğu"  
(Şerê Gel lı Filistinê û Rojhilatanavin) -1970-ji  
Nasır "Arap Devriminin Yöntemleri" (Yöntemên  
-rê yê- Şoreşa Ereb).

"Şerefname", "Mervani Kürtleri Tarihi" (Di-  
roka Kûrdên Merwani), "Mahabad Kürt Cumhu-  
riyeti" (Komara Kurdi ya Mahabadê), "Fehen-  
ga kurdi-türki -ji Yusuf Ziyaeddin Paşa-" dı nav  
berhemên wi yê ku wergerkırine da hene.

### M.E. BOZARSLAN WEK NIVISKAREK

Wek ku dı berhemên wi de ji tête xuyakırın,  
Bozarlan niviskareki bı pır hêl e. Lê dı nav van  
hêla da hêla ku zêdetırin derdıkeve pêş, dı ba-  
beta zıman, kultur û diroki da ye. Ev ji, zêdetırin  
dı wergeran da xuya dıke. Lê ev ji ne kareki hê-  
san e.

Bozarlan bı van xebatên xwe yê n giring, ge-  
lek pirtûkên ku lı ser zıman û diroka kurd hatine  
nivisin ji nıfşê -jenerasyon- nû re kıriye mal.

Mırov dıkare bêje ku, niviskar Bozarlan xe-  
bateki belgeyi ji xwe ra kıriye meslek. Jı ber vê  
yekê ji çirok, ne qadek (babetek) ku Bozarlan  
lı ser bı xwedi iddia ye. Wek ku paş da ji em dê  
bıbinın, dı çirokên Bozarlan da gerek ji hêla na-  
verok, gerek ji ji hêla teşe (şêwe, şıkıl) da pivanê  
taybeti yê ku ji bona nivisina çirokan pêwist e,  
wek ku mirov hêvi dıkır nehatiye bıkaranın.

### MEYRO - NÊRINEK GIŞTI,

Wek ku me dı raberiya xwe de ji gotübû,  
"Meyro" ji deh çirokan pêk hatiye. Çirok pêşi  
bı kurdi û paşê ji ji hêla niviskar bı xwe hatiye  
wergerandını türkî û bı herdû zımana ve hatiye  
çapkırın. Dı nivisa naskırinê ku dı piştqapaxa  
pirtûkê da hatiye çapkırın tê gotın ku ev yontema  
(kurdi-türki) cara yekem e hatiye pêkanin. Qapa-  
xa pirtûkê ji hêla karikaturistê navdar, Tan Oral  
ve hatiye neqşandın. Lê çı mıxabın, zêrebûn û  
balkışandına xebata çapaxê her çıqas ji çiroka  
"Meyro" ve birêketiye ji "buyera" ku dı çiroka  
"Meyro" da derbaz dıbe narısmine.

Dı çirokê da gava ku Meyro dıgêje serê kani-  
yê, mar pêve dıde. Rêya kaniyê ji dı çirokê de  
wısa tê nivisin.

"....

Lı her dı aliyên rêya kaniyê sıpındar, darên  
sêva, erûga û incaza hebûn. Gışt rêz bûbûn.

.....

Meyro ji lı vê rêya tari dımeşiya.....

.....

Şev bû, rê taribû....."

Lê çapaxa pirtûkê da gava ku Meyrê bı şer-  
bikê xwe ji mal dertê, ji qoziya xani û dı bın ro-  
nahiya hivê da mar serê xwe dıreji wê dıke. Ya-  
ni "büyera" pêvedanê û wêneyê (rismê) çapaxê  
hevdû nagırın.

Lı piştqapaxa pirtûkê da dı der heqê pirtûkê,  
ji hêla çapxanê ve nivisek nasinê lieye. Dı vê ni-  
visê da bı kurti ewa tê gotın :

"Lı tikiyê ev cara yekem e ku bı metodek nû  
û bı teknikek guharti Mehmed Emin Bozarlan,  
pêşi çirokên xwe bı kurdi nivisiye û paşê ev çı-  
rokana wergerandiye türkî û bı vi awayi hum dıbe  
niviskarê çirokan û hum ji wergerê wan.

## VEKOLİN LI SER DU PIRTÛKA

### ● K. ALIS

Pirtûk : MEYRO  
Niviskar : M.EMİN BOZARSLAN  
Çapxane : Çıra Yayınları, Sibat-1979, Istanbul

#### RABERÎ:

Pirtûka MEYRO, bî cıvandına deh çiroka ve pêk hatiye, û ji van çirokana yek ji navê wê Meyro ye.

M.E. Bozarşlan, beri nivisina "Meyro" bî zımanê tırki dî bin navê "İçerdekiler ve Dışardakiler" (Ên lî hundır û lî derve) çirok û dî bin navê "Anarşistler" (Anarşistan) ji mizahêk (pêkeni) nivisiye. Jî ber vê yekê mirov dikare bêje pirtûka M.E. Bozarşlan "Meyro" dî vi wari da pirtûka sê em e.

Dî destpêka vê xebata xwe da divê ez diyar bikim ku, ev xebata tenê bî pirtûka "Meyro" ve hatiye sinûrkirin û jî ber vê yekê jî neticeya (encam) vê xebata mîh, jî mînaqêşe rexneya re vekirîye. Ê disa divê ez eşkere diyar bikim ku, lî ser bîkaranina zımanê kurdi dî pirtûka "Meyro" da ez çet nesekim. Ev jî ber çend hoyên girîng bû ku yek jî wan ev e:

Zımaneki me yê edebi ya yekgirtî, zımaneki me yê standart tune. Jî hêla dîn ve jî mîn, mîna xwendekareki lî xwendîngeya berz ya mamostayan ev heqa dî xwe da nedit ku rexne lî ser bîkaranina zımanê Bozarşlan bîgirim. Ez bawer dikim ku ev vatîni zê detirin lî ser milê zımanzana û pîsporê nî kurda ne.

Nemaze lî Kurdistan Tırkiyê, lê kolin û "rexne" lî ser eserên (berhemên) edebi nehatiye çêkirin û girîngiya van tiştan nehatiye dîtin. Ev kêmasiyeki gelek mezî e. Gava mîn ev vekolin û rexne nivisi, mîn ev kêmasî da ber çava û divê xwendevan jî kêmasiyên mîn dî nav kêmasiya gîştî da bîbine û jî bir neke ku ev xebata, xebatek ferdiye û dibê dî vi wari da lê bê te nêrin.

#### NÊRINEK GİŞTÎ

M.E. BOZARSLAN Ê BEHREMÊN WÎ

Gava ku lê kolinek lî ser pirtûkekê bê te kîrin, pê wîst e û divê lî ser şexsiyeta edebi ya niviskarê wê bê te sekînan dî û berhemên wî yê nî dî jî dî ber çavan da bê te derbazkîrin. Ev pêwîstî jî bo gîhanek gîştî û objektîvî mecbûrî ye.

"TARÎK Û RÛN"

Helbijarde le helbestî:

"HÊMIN"

KURD IM EMIN

Gerçî tûşî renceroyî w hesret û derd im emin  
Qet le des em çerxe siple nabezim, merd im emin

Aşiqî çawî kejal û gerdinî pir xal nîm  
Aşiqî kêw û telan û benden û berd im emin

Ger le birsan û leber bêbergî imro req helêm  
Nokerîy bêgane nakem ta Leser herd im emin

Min le zincîr û tenaf û dar û bend bakim niye  
Letletim ken, bimkujin, hêsta delêm kurd im emin.

Şîlan awî - 1942

RIQÎ PÎROZ

Demgirê, emma le girtûxane riq-estûrtir im  
Lêm deda, emma Leser dawa rewakem sûrtir im,

Demkujê, emma be gij celladekemda dêmewe,  
Kurd im û natwêmewe, natwêmewe, natwêmewe .

1974

SINÛR

Ey ew kesey detperistim û lêm wun î  
To Xuda nî, to xoşewîstî min î

Le asman nî ta wêt ranega destim  
Le qaf nî kaley asinit bo helbestim.

Toy le min wun kird û minî le to dûr  
Ew bistokey dujmin nawî na sinûr.

Befranbarî 1972



hûnermendên nûh tiyatroya Kurdî pêşvexistine û wê gîhandine qonaxa profesyonelî û modern. Li Kurdîstana Başûr tiyatroya Kurdî îro jî xebata xwe çêdike Lê ev xebata îro di bin kontrola rejîma Îraqê de ye.

Piştî 1974 an li Kurdîstan Bakûr jî hêdî hêdî xabatê çandî dehat çêkirin. Xortên Kurda li xwendegehên û li komelan de , li ser muzîk, folklûr û tiyatroyê dixebitîn. Şev û civînen çandî dihatin amade kirin. Piyesên siyasî dihatin pêşkeş kirin. Li ser xebata tiyatroyê cara yekem xortên Kurda li Diyarbêkrê bi navê Tiyatroya Hûnermendîya Lîstikvanên Diyarbêkr. (Diyarbakir Oyuncularî sanat tiyatrosu.) gurupêk saz kirin. Ew gurupa bi zimanê tirkî du piyêsên Omer Polat li gelek bajarên Kurdîstanê pêşkeşê temaşekaran kirin. Navên wan piyêsan **Mixoyê Aladaxê** (Aladaglı Miho) û **804 Karker** (804 işçi) bûn. Xabata vê gurupê bi destê îdara leşkerî di 1979 an de hate qedexe kirin. Ew gurupa tiyatroyê jî bo pêşketina tiyatroya Kurdî gawek hêja bû.

Di 1983 an de li Elegezê Kurdên Sovyet 50 salî ya tiyatroya Kurdî pîroz kirin. Wekî min li jor jî nivisibû, di 1931 an de piyêsa **Mem û Zîn** li Elegezê tê pêşkeş kirin. Îro li Sovyetê li ser tiyatroya Kurdî hîn xebatên kirin.

Di vê nivisa kurt de jî baş xuya dike ku xebata çandî girêdayiya xebata siyasî ye. Dewletên ku Kurdîstanê li hev par-kirine dixwazin ku bi hemû hêz û quweta xwe çanda Kurdî jî holê windakin. Dixwazin rêç û şopa milletê Kurd bê birkin û neyê nasîn. Ji bo vê yekê jî çanda Kurda re bi xwe xwedî derdikevin. U wê bi awakî kevneperestî bikar tînin. Li dijî vê zûlm û zordestiyê yê be jî gelê Kurd heta îro ziman û çanda xwe parastîye. Hêz û kesên welatparêz jî ji bo çanda Kurd xebitîne û hîn dixebitîn. Herweha wekî me li jor jî dît, di warê tiyatroyê de jî xebat çêbûye û hîn çêdibin. Li derveyî welat (Kurdîstan) de jî li ser tiyatroya Kurdî hinik xebatên kirin. Pir gurupên tiyatroyê hatine saz kirin. Lê ev xebata dervayî welat hîn bi formên amatûrî çêdibe. Lê divê xebate çandî jî formên amatûrî derkeve, divê em hêz û kesên welatparêz xwe hinek biêşînin. Ji ber ku xebata çandî îro li hemû dinê êdî jî formên amatûrî derketiye, gihîştîye qonaxa profesyonelî û modern. Muzîk, folklûr û tiyatroyê çend beşên çanda me ye. Bo pêşvexistina wan xebatên nûh pêwîste. Divê em xebata çandî sivik û bêqîmet ne binin, ji ber ku xebata çandî jî bo pêşketina xebata siyasî pêwîste. Divê em di xebata çanda Kurdî de xebata tiyatroyê bikin beşek bingehîn.

Ji ber ku tiyatroya Kurdî dê bikaribe alîkariya çanda me yê dewlemend bike û wê biparêze. Hûnermendên ku Kurdin û di tiyatroyê biyanîyan de kar dikin, divê hûnerên xwe jî bo çanda xwe bikarbin. Iro çanda Kurd jî her rojê zêtir alîkariya hûnermendên Kurd dixwaze...

---

### S E R K A N I

- 1- Milliyet Sanat Dergisi (Hejmar 81, rûpel 12 Sal 1983 )
- 2- Jîn
- 3- Berbang (Hejmar 9, rûpel 18, sal 1983)
- 4- Çiya (Hejmar 3, rûpel 5, )
- 5- APN -Prestajans (Hejmara 189, Swêdî)

Ji bo tiyatroya Kurdî ez bawer dikim ku piştî 1968 dema herî baş e. Ji ber ku di vê demê de pir gurupê tiyatroyê hatiye durust kirin. Kurdên Sovyetê ji destpêka 1970 an de li Gurcîstanê û Li Ermenîstanê pir gurupê tiyatroyê durust kirine.(5) Di vê demê de li Sovyetê tiyatroya Kurdî pir aktîv e, pir piyesên xweşik û hêja di vê demê de hatiye pêşkeş kirinê. Wekî **Beqelên, Teyrê Elegezê, Ker û Kulîkê Silemaniyê**. Ev piyes ji aliyê tiyatroya Elegezê hatiye lîstin. Derî van piyesan pir piyesên din, di nav salên cihê de li Sovyetê hatine amade kirin, Wekî: **Reva jinê** (Wezîrê Nadiî), **Zewaca Bêdil** (ismayilê Diko) **Sinco Qiza Xwe Dide Mêr** (Eskere Boyik) Gurupên tiyatroyê Kurdên Sovyetê pir piyesên biyanî jî wergerandine kurdî û wan piyesan li gor rewşa Kurda amade kirine, wekî: **Riya teze** (H.Salcîyan) **Xweşî** (M.Samxalov) **Ber Derî Seyê Har Heye** (K.Bucaidayz) Dîsan Kurdên Sovyetê li Ermenîstanê çend piyesên radyoyê jî amade kirine, wekî **Eloyê Newêrek, Xecê û Siyabencê, Lûr-Delûr...** Bi baweriya min li nik vê xebata wanê hêja Kurdên Sovyetê bi tevayî li ser çanda Kurd, herweha li ser tiyatroya Kurdî dikarin hîn xebatê hêja bikin. Îro di nav 20 mîlyon Kurda de tenê Kûrdên Sovyetê xwediyê mafên ziman û çanda xwe ne. Ziman û çanda Kurda tenê li Sovyetê azad û serbest e.

Piştî 1970 ê li Kurdîstana Başûr tiyatroya Kurd rojên xwe yên herî baş jiya ye. Hejmarên gurupên tiyatroyê zêde bûne, wekî Komel Hûner û Wejeyî Kurdî li Silêmanî û li Hewlêr. Hejmarên rejîsûrên Kurd zêde bûne, wekî: Ehmed Salar, Xazî Bemernî. Hejmarên hûnermendên kurd jî zêde bûn, hêjmara hûnermendên afret (Keç) jî zêde bûne. (Di tiyatroya Kurdî de kêmasiya an tûnebûna afret herdem xuya kiriye, îro di roja me de jî ev problema hîn jî holê ranebûye.) Tiyatroya Kurdî di aliyê teknik, kostûm, dekor, (Segnografî) jî di wê demê de pêşveketiye. Niviskarên nû jî di wê demê de zêde bûne, wekî Şerko Bêkes, Heme Kerîm hewramî. Rejîsûrên wê demê jî bo pêşveketina û modernkirina tiyatroya Kurdî xebatê herî baş kirine. Di nav van rejîsûran de herî aktîv Selman Faîk e. Di vê demê de tiyatroya Kurdî zêtir nêzikê tiyatroya Ewropayê ye. Formên siyasî herî zêde di wê demê de di tiyatroya Kurdî de bikarhatiye. Rewşa gelê Kurd jî bo tiyatroya siyasî gengaz (Musait) bû.

Em dikarin ji piyesên siyasî çend numûne binivîsin, wekî: **Dayikê Şehîd (1970) Pêşmerge û Kotayî Derebegî (1972)** li Kerkûk, rejîsûrên herdu piyesan jî Selman Faîk bû. **Nîrxê Azadî** (Emanuel Roblic) li Silêmanî, rejîsûr Xazî Bemernî. **Pirdî Welat** rejîsûr Ahmed Salar, **Ca-wî Wîetnam** rejîsûr Taha Xelîl. Li nik tiyatroya siyasî, tiyatroya komedî jî pêşva diçû.

Komedî di warê xwe de bibû du beş, komediya tîcarî (Komersiel) ew babetê tiyatroyê zêtir jî bo pere qezenç kirin dehat amade kirin. Di komediya tîcarî de rejîsûrê herî navdar, Mekî Ebdullah û Umer Elî Emîn bûn. Beşa babetê komediya duwemîn jî komediya civakî (Sosyal) ye. Komediya civakî zêtir naveroka xwe li gor rewşa gel amade dike. Ew temaşekarên xwe tenê nade kenandin, li ba ken temaşekarên dide fikirandin jî. Ev babetê tiyatroyê zû bal dikşîne û jî aliyê gel pir tê hez kirin, Wekî: **Piske** (Moleîr), **Mûfetîş** (Gogol) rejîsûrên van herdu piyesan jî Ehmed Salar bû. Di 1976 an de tiyatroya Kurd li kurdîstana Başûr hate qonaxek nû û baş. Niviskarên Kurd zêde bûn, di nav van niviskaran de em dikarin navê Simko Nakam, Mehdi Umed, Şero Bêkes, Heme Kerîm Hewramî binivîsin. Li cem niviskaran de rejîsûrên nû jî peyda bûn, wekî Fazil Caf, Osman Çêwar li Silêmanî Peymam Begok, Sedûn Yunîs li hewlêr. Di vê demê de tiyatroya Kurdî ber bi profesyonelî gavên nû avêtine. Hûnermendên keç (Afret) zêde bûn. Piyesên di wê demê de hatin lîstin bi awakî profesyonelî bûn, wekî **Xule Çex-maxa, Receb û Piyaw Xwerekan** (Simko Nakam) Piyesên wê demê li gor tiyatroya realîzm tîcarî amade kirin. Realîzm di hemû piyesan de xurt e. Tiyatroya Kurdî roj bi roj dewlementir dibe, modern dibe. Li ser babetên (form,tema) tiyatroyê tê peyivandin. Li ser tiyatroyê kovar tîcarî çapkirin, rexne tîcarî girtin, semîner (konferans) tîcarî dayin, wekî semînerê li ser tiyatroya Absurd jî aliyê Fazil Caf tê dayin. (Baxdat 1973) Li ser mejuyê tiyatroyê ye Xazî Bemernî semînerê dide. (1978, Silêmanî) Li ser Brecht û tiyatroya Brecht Fazil Caf semînerê dide. (1979 Silêmanî û Hewlêr) Xebata tiyatroyê li Kurdîstana Başûr piştî 1970 ê digîhîje qonaxa profesyonelî. Em dikarin bêjin ku tiyatroya profesyonel piştî 1970 yî li Kurdîstana Başûr ava bûye. Piyesên wê demê dehatin lîstin bi awayê modern û profesyonel bûn, wekî: **Abluka** (Ereb Adil Kazîm) rejîsûr Ehmed Salar li Silêmaniyê. Talat Selman bi formên modern û profesyonel **Mem û Zîn** kiriye piyes, rejîsûriya wê piyesê Fazil Caf kiriye. **Pirdî Arta** (George Tio Taka) rejîsûr Fazil Caf, **Cilpaw** (Gorkî) rejîsûr Sebah Ebdulrehman, li hewlêr, **Dûrek** (Langiston) rejîsûr Fazil Caf, **Otillo** (Shekespeare) rejîsûr Ehmed Salar.

Bi vê pêşveçûyinê ve di nav hûnermendên Kurda de li ser tiyatroyê hinek dijîti peyda bûn. Ew dijîtiya zêtir di nav nesîla (Generation)nû û kevn de bû. Nesîla kevn dixwest tiyatroya kevn neyê guhertin û pêşve neçe. Lê nesîla nû dixwest ku tiyatroya Kurd hîn pêşvebiçe û hîn zêtir xwe nûh ke. Bi rastî nesîla

dikarin bêjin ku qonaxa 1920-1930 ji bo kurdên Kurdîstana Başûr qonaxa hînbûyina tiyatroyê ye. Di vê demê de bûyera Kawa ji bo ava kirina tiyatroya Kurdî bûye sedemek mezin.

Di destpêka 1930 an de Kurdên Sovyetê cara yekem piyasa Mem û Zîn li Elegezê peşkeş temaşekaran dikan. (3) Piyasa Mem û Zîn di dîroka tiyatroya Kurdî de pir navdar e. Di wê demê de di tiyatroya Kurdî de gavên nû tîn avêtin. Niviskarê mezin Ereb Şemo di 1931 an de bi navê **Koçekên Derewîn** piyasek dinivisîni. Di sala 1934 an de Ahmedê Mirazî piyasa **Zemanê Çuyî** nivisiye Em dikarin bêjin ku ev herdu piyase derî piyasa Memê Alan, di tiyatroya Kurdî de piyasek yekemîn in.

Piştî 1940 an tiyatroya kurdî li Kurdîstan Başûr hêdî hêdî fireh dibe û pêşve diçe. Li xwendegehan de xortên kurda piyase amade dikan û dilîzin. Di qonaxa 1940 an de xebata herî baş ji aliyê şair Kamuran tê çêkirin. Şair Kamuran roman Viktor Hugo yê bi navê **Dewrî Can Falcan** dike piyase û vê piyase di xwendeghek de pêşkeşî temaşekaran dike. Qezencê (pereyên) piyase jî kesê ku ji zerzêlê zirar dîtiye re tê belav kirin. Ev bûyera di nav gel de tesîrek mezin çêdike. Di vê demê de îmkanên teknîk û dekor pêşva neçûbû. Tiyatro zêde bala gel nedikşand, piyasek karîbû du-sê caran bê temsîl kirin.

Di qonaxa 1940-50 an de tiyatroya Kurdî zêde aktîv nine. Hinik xebat li ser tiyatroyê çêdibin lê ne xebatên profesyonelîn. Di vê demê de bûyera Komara Mahabadê wekî her tiştî di tiyatroya kurdî de jî guhertinek mezin çêdike. Cara yekem li ser axa Kurdîstana azad piyasa **Dayika Niştiman** li Kurdîstana Rojhilatê tê pêşkeş kirin. Di sala 1946 an de **Dayika Niştiman** jî aliyê hunermendên Kurda tê amade kirin. Ev piyasa bi mehan dilîze û ji aliyê hezaran kesan tê temaşê kirin. Wekî tê zanîn di dîroka gelê Kurd de ev piyasa cîhek girîng digre.

Rewşa tiyatroya Kurdî di 1950 an de bi alîkariya ozan û rojnamevan Refîq Çalak digihîje qonaxek nû. Refîq Çalak û Goran di wê demê de li Heyfa (Li Filîstîn) di radyoyek Îngilîz de kar dikan. Ew bi Kurdî û Erebî ji bo radyoyê program amade dikirin. Programên wan zêtir li dijî Nazî (Faşîstên Alman) ya bûn. Di formê tiyatroyê de Refîq Çalak stîlê komedî bikardani. Wî piyasek biyanî werdigerand. Wî pirê caran teksta piyasa li gor rewşa gel amade dikir. (adepte dikir) Stîlê Refîq Çalaq di nav gel de pir zû belav dibû, ji ber ku wî piyasa gora wê

rojê, li ser tiştên aktûel amade dikir. Refîq Çalaq bi xwe di her piyase de rolê herî mezin digirt.

Cara yekem piyasa Shakespeare **Otîllo** di dawiya 1950 an de hate lîstin. Di wê piyase de pir hunermendên hêja û jêhatî beşdar bûn: Wekî Rewûf Yehya, Nuri Weştî (Rolê Otîllo dilîs) Niviskarên Kurda di wê demê de zêde bûn û destpêkiribûn êdî bi kurdî piyase dinivisîn. Wek: Mustafa Salîh Kerîm, Emîn mîzra Kerîm, A.B. Hewrî. Bi destxistina mafên otomî (1958 Li Îraq) xebata çandî pêşve diçe, Kurd êdî xebata xwe bi serbestî çêdikan. Di wê demê de li ser tiyatroyê jî pir xebatên baş çêdibin. Di nav Kurdan de pir ronakbîrên hêja derketine, wekî: Goran, Kadîr Dîlan, Şerko Bêkes, Ehmed Denggewre, Umer Elî Emîn, Simko Ezîz ûhw. Goran di wê demê de destpêkiriye binivise, lê wî xebete xwe nikarîbûye temam bike. Pir helbestên Goran bûye opera. Wekî **Bukeke Nakam, Gula Bixwîn**. Li Kurdîstan Îraq hîn di operan de helbestên Goran wekî lîstikên opera tîn pêşkeş kirin.

Dawiya 1963 an de rewşa Kurda dîsa xirab dibe, xebata çandî heta 1968 an tê qedexe kirin. Li Kurdîstana Bakûr piştî 1962'an ji aliyê hinik ronakbîrên kurd bi zimanê Kurdî hinik weşan hatine çapkirin. Di nav van weşanan de du piyasekên kurdî jî hene. **Dawiya Rojên Dehakê Zordar** (Bi Tirkî û Kurdî) ji aliyê Kemal Burkay hatiyê nivisîn. **Birîna Reş** Ji aliyê Musa Enter hatiyê nivisîn. Musa Enter ji bo vî piyasa xwe wiha dibêje, "Min ev pirtuka di sala 1959 de, li Stembûlê, dema ku ez di girtîgeha Herbiyê de bûm, di hûcra 38 de nivisî. Li rojhilat birînen reş pirin. Wek birova çavan, êşa zirav, kotibûn û a ku ji giştikan diwartir, î deya wan belengazî û nezaniye. Hûnê niha tiştên ku van êş û belane anîne serê me de di vê pirtukê de bibînin." (4) Ev herdu piyase hatine lîstin yan ne hatine lîstin, min li ser wan agahdarî bîdest nexist. Ji 1962 an ta 1970'î li xwendegehan de xortên kurda pir piyase amade dikirin û dilîstin, lê bi zimanê tirkî. Ji ber ku li Kurdîstana Bakûr şertên bi zimanê kurdî piyase lîstin tune bû. Piştî cunta leşkerî ev xebata jî tê qedexe kirin.

Di destpêka 1968 an de pir xortên kurd li Baxdatê Enstîtûya Hûnere Ciwanekan qedandin. Piştî Qedandina Enstîtûyê Simko Ezîz, Teha Xelîl, Burhan Mesref li Silêmaniyê, Sebah Ebdurehman, Selman Faîq li hewlê gurupê tiyatroyê durust kirin. Lê cara yekem gurupa tiyatroya resmî di 1968 an de li Sileymaniyê bi navê Gurupî nûwandîni Silêmanî tê durust kirin, ev gurupa hîn xebata xwe dide domkirin.

# Tiyatro

XOŞMEND BARAN

## dîroka tiyatroya kurdî

Tiyatro wekî beşek hûnermendî li Yunanîstana antîk'de zaye û di demek pir kurt de ji sînore wî welatê derketîye û li hemû dinê belav bûye. Di xebata çandî de tiyatroya gihîştîye qonaxa herî berz û îro bi awayê xwe yê herî modern ve tê temsîl kirin. Tiyatro bûye beşekî jiyana çandî ya hemû gelan. Ew di warê çand (Kultur) û polîtîka de rojek pir mezin dilîze. Di naskirina çand û guhertina polîtîka de cîhekî wî yê taybetî heye. Bi rastî tiyatroya di rewşa sosyal û polîtîk de dikare guhertinên gelek mezin bike. Ji ber ku tiyatroya ne tenê cîhê lîstîk û kêfê ye. Ew xwendegê (Mektebe) li wir temaşakar tişte hîndîbin, dikenin, digrîn, rewşa xwe dibînin û hisên xwe yên herî dizî (veşartî) li wir eşkere dikin. Temaşakar li wir mesajên polîtîk digre, difikire û di serê wî de pirsên nû çêdibe. Ji bo parastin û pêşvebirina edetên (tradîtion) gel tiyatroya pewîstiyeka mezin e. Ew di kare wekî pîrek di nav dû nesîla de be, du nesîla bi hev re bide nasîn û danûstandina wan xurt bike. Ew dikare rêç û şopa miletek biparêze û rêç û şopa wî bi roja me ve girêde. Ji ber van sedemên girîngin ku îro ji welatên sosyalîst ta welatên emperyalîst, her kes dixwaze li welatê xwe tiyatroya yê xurt bike. Her kes dixwaze di nav gelê xwe edetê (nerîten tiyatroyê bi cîh bike. Wekî Federîco Garcia Lorca dibêje: "Tiyatro ji bo çanda gel tiştê herî baş e û di naskirina çanda gel de rîya herî girîng e." (1)

Meriv dikare li ser feyde û alîkariya tiyatroyê pir tişt binivîsîne. Lê amanca vê nivîsê li ser feydeyên tiyatroya giştî nivîsîn nîne. Amanca vê nivîsê li ser dîroka tiyatroya kurdî ye. Ez bawer dikim ku yê dijwar jî va ye. Ji ber ku li ser tiyatroya kurdî zêde tişt ne hatiye nivîsîn (Bi tipên latînî) û zêde agahdarî jî tune ye. Dikare ku di vê nivîsa kurt de hinik çewtî û kêmasî hebin. Lê tiştê min li ser tiyatroya kurdî nivîsiye, tiştên ku min bi xwe xwendine û ji hevalên ronakbîra bihistine nivîsiye.

Ji bo rast nivîsîna tiyatroya kurdî min pir lêgerîn kir. Tiştên ku min li ser destpêka tiyatroya Kurd bidestê xwe xist ewe ku: tiyatroya Kurdî cara yekem di sala 1918-1919 de destpêdike. Li Îstanbulê, ji aliyê Komela Pêşkewtina Pîreka Kurd (Kurt Kadınlar cemiyeti) piyesek (Musamare) tê lîstin. Dîsan herdi wê salê de (1919) ji aliyê Komela Belavkirina Zanîne û Weşanan Ji Bo Kurd (Kurt Tamamî Marif ve Neşriyat Cemiyeti) piyesek hatiye lîstin. (2) Lê li ser van herdu piyesan jî wekî din zêde tiştên nivîsandî û agahdarî tune. Îro em nizanin naveroka van piyesan çibû û çawan hatine lîstin. Tiştên di kovara Jîn de tê agahdarkirin ewe ku herdu piyesan jî pir bal kişandîye û ji aliyê gelek kesan ve hatiye temaşekirin. Dîsan di kovara Jîn de bi navê Memê Alan piyesek hatiye nivîsîn. Ev piyesa pişt re wek kitabek hatiye çapkirin. Lê mixabin ew kitaba heta îro ne ketiye destê kesî, li ba hinik kesan hebe jî min bidest nexist. Em ji van herdu piyesan û ji piyesa Memê Alan têdigihên (Fahmdikin) ku ronakbîrên kurd di wê demê de destpêkirine li ser tiyatroya Kurdî xebitîne. Ji bo destpêka tiyatroya kurdî ev xebata gavek hêja û mezin e. Lê wekî tê zanîn piştî 1920 an li Tirkiyê rewşa kurda xirab dibê, komeleyên kurda tî girtin û hemû xebata siyasî û çandî tî qedexe kirin. Ji 1920 an ta îro rewşa kurdên Kurdistanê Tirkiyê (Bakûr) ne hatiye guhertin. Hîn ziman û çanda kurdî qedexe ye. Piştî 1920 xebata li ser tiyatroya Kurdî li Kurdistanê Îraq (Başûr), Îran (Rojhilat) û ji aliyê kurdên Sovyetê çêbûye.

Di destpêka 1930 an de Kurdên Kurdistanê Îraq (Başûr) li Bexdadê û li bajarên mezin destpêkiribûn tiyatroya hîndîbûn (Fêrdîbûn) Tiyatro wekî karekî profesyonelî nebû, xebata li ser tiyatroyê zêdetir bi awayê amatûrî bûn. Komeleyên ronakbîrên Kurd destpêkiribûn piyesên biyanî werdigerandin zimanê kurdî û hinik romanên dikirin (adepte dikirin) piyes. Em

## هەزار ..... هەنۆ ھەر بەرزە

پاییزە دار و دەوێن رەنگـزەردە  
 با تەز و سەردە بە تۆز و گەردە  
 دیارە لای شەختەییە ناخۆش خەوەرئ  
 دارە خۆی دەرنی، خەزەل ھەلدەوەرئ  
 ھەورە رەشیپۆش و بە گریەو نالە  
 سەرەتای شیوەنی مەرگی سالدە  
 بە گژەیی سەردی ھەناسەیی کەژ و کۆ  
 ژینی خۆی ھاتەو بە پیرە ھەلۆ:  
 داخەکم بۆ گۆر و تینی جوانیم  
 ئەو دەمەیی چۆن و چ بۆوم بۆ وای نیم؟!  
 ھیژ و سۆماید نییە بال و چاوم  
 مامەو گەردە نشین بۆ راوم  
 دوورە گۆشت پۆر و کەوم وەردە کەوم  
 گۆشتە نیچیری مەگەر بیئە خەوم  
 پیریە پاییزی وەرزی ژیانە  
 وردە ھەنگاوی بەرەو گۆر نانە  
 وا ھەلۆی مردنە راوی کردم  
 راوبەتالی منە ھاکا مردم!  
 مردنیش ھیئە نە سووکە و سانا  
 سەری لێ گێژە ھەزاران زانا  
 چم بەسەر دێ کە نەمام و مردم  
 پەری بەربایەک و خۆلی وردم  
 گیان بەرەو کۆی دەفری روون نییە بۆم  
 تۆ بلایی پچتەوہ لای باوہ ھەلۆم؟  
 تۆ بلایی راوی ھەبی لەو بەرزە؟  
 پاش ھەموو چەرمەسەرەیی ئەم بەرزە  
 داخم ئەو رازە لەبن سەرپۆشە  
 سەفری نابەلەدی ناخۆشە  
 دل و دیدەم کە بە دنیا فیئە  
 چەندی پیم بکری دەمینم لیئە

ژین گهلی شیرنه فیزی ناوی  
بو مه به ست سهر دهنه وینم تاوی  
چاری ئەم دهرده له لای قالاوه  
گهرچی زور پیره به لای ماوه  
دهچمه لای و بهوه چم لی نایه  
رهشییه و ناوی ژیانلی لایه ...

\* \* \* \* \*

سهر نهوی دای له شهقهی شابلان  
هاته ویرانهیهکی جی مالان  
بوو به میوانی قهلیکی روورپهش  
چهپهل و رژد و له مهردی بیبهش  
قهل قهری: لیم مهیه پیش زورداری  
خوا شوکور زور به کهنهفتی دیاری  
زوو به چیت لیم گهره که پیم بیژه  
دوور له من بگره لهشم به نویژه  
وتی ئەه لاله قهلهی هر لوم  
پیرم و زور له مهرگ ترساوم  
هممه پرسیک و دهبی بمبووری  
هوی چیه تو که له مردن دووری  
وهک دهلین ئیوه به چل سال بارن  
تووشی تووش نایه و کوسپ و بارن  
رئیهکم پی بلی سو هر مانم  
توی لهلات دهست دهکوی دهرمانم  
سویند ئەخوم پاشی هتا بشمینم  
هر کهوی راوی بکه م بووت بینم

\* \* \* \* \*

قهل گوتی هوزی ههلو زور خاون  
سهیره لام چونه که خاوهن ناون  
باب و کالت به نهزانی مردن  
بیری سه بهرزییه وای لی کردن  
هر کهسی بهرزه فیره زوو دهمری  
بای بلندایی سهر و دل دهگری  
مالی ئیوه که لووتکهی کیوه  
لای جن و دیوه به لای زور پیوه

خوینە پۆر پۆرگی دەخاتە خوینی  
 گوشت کەوی تازە گرفتیی دینی  
 جگەر و سی و دلی ما مر زههره  
 تا وهها بی تهقلات بی بههره  
 دهتهوی زور بژی خوش را بویری  
 خو له پهندم گهره که نه بویری  
 وه ره وهک ئیمه بژی نزم و نهوی  
 شه و لههر گهنده له داریک دهخهوی  
 خواردنی باشی که تو نه تدیوه  
 گوشته بارگینی گهنی و توپیوه  
 کردنی چینه له پهین و شیاکه  
 تاو و تینی له شه بو دل چاکه  
 پهندی با پیره به میرات ماوه  
 خوینی زامی کهره سو مای چاوه  
 گفتی من گه وههره بو ته لپیژم  
 تاقه دووریت له بهره ، پیته بیژم  
 یان له ناو بوگهن و نزمایی ژیان  
 یان به سه ره رزییه وه بسپیژه گیان

\* \* \* \* \*

راچهنی له م وشهیه پیره ههلو  
 هاته بهر چاوی گهلی کهند و کللو  
 کهوته ناو گیژی خهیا لات و خه مان  
 مان نهگهر وابی چ شیرینه نه مان...  
 وتی : پیروزی بی له خو ته ئهم ژینه  
 جهژنی تو بو مه شه پور و شینه  
 کی به سه ره رزی ژیا بی تاوی  
 ژینی قالوی به پووشیک ناوی  
 چاوه پیی مه رگه گیان با بیبا  
 په پ و بالم له چیا با بیبا...  
 به ههلوپی که له ژین بیبه ش بم  
 نهک ههزار ساله قهلی رووره ش بم  
 بو شتیک ئیسته له خو بیزارم  
 من ههلو بوچی به تو بوو کارم !!؟

مەرد ئەگەر کاری بە نامەردانە  
دەردی سەرباری ھەموو دەردانە

\* \* \* \* \*

کەوتە خوڤ دای لە شەقەیی بایل دیسا  
ناگریکی لە دەروون دایسا

راستەخوڤ بو سەر و ھەر بو سەر چوو  
ھەردی جی ھیشت و لە ھەوران دەرچوو

قەل ھەزار سالی ژیییا بەو تەرزە  
سەرنەوی و ھیشتە ھەلو ھەر بەرزە .



## I C

Niviskarê vê pirtûkê Rune Lombron payiza 1969'a diçe Kurdistana Başûr. Demekê li wê maşûnda pirtûka xwe dînivise. Redaktora pirtûkê di pêşgotinê xwe ya kurt da çend rêzên xweş dînivise.

Gelê kurd şerek dût û dirêj dide ji bo parastina xwe wek miletê kurd. Çêkirina dewletek nebû qismet û ne milet, ne ji dewletên din bî pîrsa kurdan va mijûl nebûn. Her çiças (eger çî) kurda ji gelek miletên din bê tûr ê ş kışand ji, disa pîrsa kurda diçeta (bala) dinyê nakışand ser xwe.

Niviskarê pirtûkê, bî ditina min navê pirtûkê çewt daniye. "Kurd- miletê bê welat" ne rast e. Jî ber ku welatê kurda heye, lê welatê kurda, welatê me li bin destê koledaranda ye.


Bî ditina min yê ku niviskar mecbûr dîke ku pirtûka xwe di bin navê "Kurd - miletê bê welat" da bînivise du ho ne. Ya yekemin em bî xwe ne û ya duyemin koledarên henî nêzik û hem ji dût in. Dî dest me kurda da tîşteki baş nehatiye ku em ji wek miletên din, yê ku bûn xwedi dewlet, karibin dewletek xwe saz bikin. Yek ji koledaran jî bo xwinmijîya xwe em rehet berndan, nexwestin ku em bîbin xwediye mafa xwe. Lê sed cari heyf ku niviskar bî va herdu ho ya xwe xapandiye û rastiye dî neditiye. Ew rastiya jî hebûna welatê miletê kurd e. Her çiças ku sinûrê welatê kurda ne nase (beliye) disa jî miletê kurd bî pîrani li ser welatê xwe diji.

Niviskar bîgehîya zîmanê kurdi diçêhêje ya Mad-Awêsta. U kurdi bî zîmanê Faris va mirovên hevîn. Lê di mafê zarawayên kurdi da niviskar dibêje yek zazaki, du kurmanci û gorani (sorani). Lê va beşakirîmê zarawan ne rast e. Ya rasti ew e, 1-Luri, 2-Gorani (Zazaki), 3-Kurmanci ya Bakûr û 4- Kurmanci ya Başûr (Sorani).

Dema ku niviskar dibêje sinûrê Kurdistane tune ye rast e. Lê hêlê nexşe cografya va çewtiyek mezî dîke. Ne ku tenê Araratê, hem jî paytextê Ermenistana SSR, Yerevanê dîke Kurdistan. Va çewtiyek mezî e jî hêlê niviskar va. Jî bo ku va çewtiya nişan dide ku niviskar li ser diroka miletê kurd baş mijûl nebûye. Pirtûkê nêger û zanayên din nexwendîye. Ew jî dibê çewtiyek mezî di mafa kurdan da.

Her çiças ku diroka miletê kurd ya klasiki nehatiye nivîsin, lê disa jî çend lêger û zanayên cihanê bî tev gelek kurdan dîzanin ku welatê kurda hatiye çar beşe kirin... ne ku wek niviskar nişan dide pênc beşe. Welatê bav û kalê kurda di dirokê da ew der e: "Lî piyên Toros yê başûr, li rojava ya Dicle yê bî çiya (Botan, Xabûr û li ber Zap a mezî) bigere. Lê ku mirov bixwaze here berbanga dirokê dibê wê demê welatê kurda yê yekemin li rojhilata û başûra vi cih bigere." (Bazil Nikitin, Kurtler cilt 1, Özgürlük Yolu yayınları, 1976 İstanbul Pel 79)

Raste, li Komara Ermenistan ya Sosyalist, li yê din kurd hene, lê ew der ne Kurdistan e. Va jî nişan dide ku niviskar bî girîngî li ser karê xwe mijûl nekiriye. Yan jî niviskar bî çend xebatên (pirtûkên) pîr çewti têda xwe daye razikirin û hewci (pêwîst) nediya bî zêde li ser diroka miletê kurd bîsekîne.



## I B

Pitûka "li ser Kurda" ku Kargeraya Biyanîya ya Dewleta Swêd belav kirîye nîmre du ye. Nîmre yêk li ser biyanîyên din bû. Wîlo xuya ye ku li ser biyanîyan pirtûk nivîsîn dê bê domkirin. Nivîsîna pirtûkeka weha jî aliyê kargerek Dewleta Swêd, karekî gelek girîng e. Nivîsîna pirtûkek weha nîşan dide ku, doza gelên Kurdistanê domdike. Şer pêşve diçe. Her ku diçe, berbi zehmetiyê diçe, paşeroj yê gelên bîndest e. Alaya azadî û serbixweyî ya kurda, gelen Rojhelata Navîn û yê din ku diperçiqin hîn li banîye û çet nakeve.


Ku welatê kurda, Kurdistan hatîye çar beşê kirin rast e. Lê nivîskarê pirtûkê beşekî din jî pêda dike, beşê pênc. Ew beşa li gor nivîskar dikeve hindirê Yekîtiya Sovyetî. Ew der ku Komara Ermenîstana Sosyalîst ya Sovyet e. Ew beşa pênc ne rast e. Nivîskarê pirtûkê Alar KUU-TMANN bê ku rind bifikire ew beşa (liser welatê kurda) nivîsiye. Dema ku mirov dibêje dîroka kurda ya klasîkî nehatîye nivîsîn rast e. Lê va ne ew gotmê ku heta naha liser kurda û cografya kurda tu tişt nehatîye nivîsîn. Belê çend lêger û Rojhelatnas baş liser dîrok û cografya kurda serê xwe ê şandine. Li van yek jî Bazîl NIKITIN e. Eger nivîskarê pirtûkê "liser kurdan" demek xwe veçetanda û li pirtûka B.N. "KURD" cîlt 1 binêriya, çî bi fransîzî, çî bi tirkî dibe, dê bidîtiya ku rewş bi babetekî din e. Ne ku ew dizaniye. Yê bidîtiya ku ne gola Wanê, ne Erzerum (Garîn) û ne jî Yerevan di hundirê sînûrê Kurdistanê dene.

Dema ku mirov dixwaze cihê Kurdistanê, nîşan bide dibê ne ku hev mirov li ku derê kurd dijîn binêre, dibê mirov bifikire jî kuder welatê bav û kalê kurda ne. Ma kurd li dûr hêlê Konya, bajarê Anatolîyê jî hene, lê mirov nikare bêje ku ew der Kurdistan e. Nivîskar hejmarê miltê kurd bi kêmasî 6 870 000 nîşan dide û bi piranî jî 16 100 000. Hejmarên sifte (yekemîn, ewil) jî lopediyek Îngîlîzî sal 1967 helgirtîye û hejmarên duyemîn jî jî kovara BAHÖZ sal 1972 helgirtîye. Mirov dixweze bipirse ma li Swêd gelek kovar û rojnaman da li ser hejmarên kurda dîtînen nuh hene. Lê nizanîm nivîskar çima ew hejmarên nuh helnagre û diçe yê kevn werdîgre. Li du cihên din dîsa nivîskar hejmarên kurda nîşan dide û yê ku mirov têdige ewe ku tu hejmar hevdî nagirin.

Nivîskar di pirtûka xwe da dîsa bi dîtînek nuh tê t. Ew jî ewe, ku Çarê Uris hatîye Bakûrê Kur-

distanê dagirkirîye. Va dîtîna jî bo min cara yekemîne ku ez dibîzim. Min tu dera da ne xwend û ne jî bîst û ne jî dît ku Çarê Uris Bakûrê Kurdistanê dagirkirîye. Lê yê ku min xwendî û bîstî ewe ku gelê Ermenî li Ermenîstana Rojava, bi alîkariya Uris berxwe dida ku hem xwe û hem jî welatê xwe biparêze. Dema Ermenîya li Wanê, Bîtîsê, Muşê, Erzurumê û li bajarên din şerkirîne, bi seda pirtûk hatîne nivîsîn, hem bi zîmanê Swêdî jî.

Karê nivîskarekî dikê bi vî awayî nemeşe. Jî bo ku armanca nivîskar çîye? Ne ku pirtûkekê bi çewtîyên ku bang dike binivîse. Armanca ew be ku, nivîskar çend ku jî dest hat li ser wî tiştî ku dixwaze binivîse, rind bixwîne, bipirse, materyal kom bike. Dura wek tiştêkî hem baş û hem jî rast çap bike. Ew pirtûkê n ku li ser kurdan li Swêd çapdibin her ku diçe çewtîyê zêde dikine. Armanca ewe ku çewtî kê m bibê û rastî zêde bibê.



## I A

Li ser kurd û Kurdistanê pir hatîye nivîsîn û hîn dê bê nivîsîn. Çi dirok, çand, bêje (edebîyat) û çî jî mafa çarenûsî dibe. Ne ku tenê nivîskarên kurda li ser xwe nivîsîne, bîyanîyan jî gelek mêjîyên xwe westandine. Ji bo milletê kurd. Hem nivîskarên kurd û hem jî yên biyanî lê gerek kûr û fireh kirine li ser kurda. Karên giranbîha ji hêlê lêgerên biyanî va hatîye kirin. Her çiqas ku li ser kurda hatîye nivîsîn jî, her dîsa diroka milletê kurd yê klasîkî bi awayekî zanistî, akademî û fireh nehatîye nivîsîn.

Pirtûka nivîskar Memo YETKÎN "Kurd û Kurdistan" (Kurderna och Kurdistan) ku bi zimanê swêdî hatîye nivîsîn, di rêzê da pirtûkeke (dîn) e ku li ser kurda têt nivîsîn. Her çiqas ku pirtûk 1984 anda hatîye nivîsîn û demek dûr û dirêj jî girtîye dîsa jî tiştêkî nuh tê da tune.

Pirtûka Memo YETKÎN bi pêşgotîna Social Styrelsen (Dezgeya Kar û Barên Cîvakî) dest pê dîke. Di pêşgotînê da weha têt gotînê: "Ev pirtûka bi sifteyî ji bo ew fermankarên swêdî ye ku dayîn û sitandin bi tev biyanîyan dikin, dixwazin mafên biyanîyan da piçekî zanadar bin. Şeş (6) hezar kurd li Swêd hene û ew jî komeka biçûk e. Çanda kurda ne wek ya swêdîya ne. Kurd li welatê xwe ji her hêlê va (alîyê va) tîn perçiqandin. Di mabûna (navbera) 18-20 mîlyon kurd hene. Swêd hembêzê xwe ji kurda ra vekirîye. Berpirsiyarê naverokê pirtûkê nivîskar bi xwe ye.

Ji bo ku yek bizane ku der Kurdistanê (welatê kurda ne) dibê mirov nîşan bide. Ya yekemîn welatê kurda ne welatekî serbixwe ye. Ji ber vê hukmeta xwe jî tune. Ya duyemîn jî ewe ku milletê kurd jî hebûna xwe virda welatek serbixwe bi hikûmet û bi sînor saz nekirîye. Ji ber ku sînorên nas tune ne û mirov jî dixwaze sînor nîşan bide, çend "zanyar" li alîkî çend li alîkî dîn runiştine û sînor li Kurdistanê ra xîz kirine. Dema ku mirov hemû nexşeyên Kurdistan ku heta niha çap bûne tîne ba hev tu jî wan naçîbin hev. Hen nexşe digihêjin derya û henek jî nagihêjin. Ew karên ku bi ew awayî hatîye kirin ne karên zanyarî ne. Dema ku mirov sînor rind nizanibe, dibê mirov bi babetekî nîşan bide ku, yên ku lê nêrîn dibê bizanibin ku ew sînor tiştêkî texmînî ye. Lê dema ku mirov sînor bi yek xîzik nîşan da, vê demê mirov nîşan dide ku, sînorên Kurdistan belîye. Ew jî ne rast e. Nivîskar Memo YETKÎN jî sînorên Kurdistan hem bi yek xîzik û hem jî bi çend babetên din nîşan daye.

Mafê mirovaye ku cografya welatê xwe bizane. Lê dema ku mirova rind nizanibe wê demê mirov çiyayê Araratê yê milletê Ermenî wek yê kurda hesab dîke. Ne pêwîste ku (hewceye) ku mirov hemû navên lêgeran li vir rêz bike, yên ku li ser diroka kurda û rojhelata navîn nivîsîne, lê mirov dikare tenê Bazil Nikitin nîşan bide. Ew mêrik ku kuder welatê kurda ne xweş nîşan dide. (Binêr Bazil Nikitin, Kürtler, Cilt 1, Özgürlük Yolu Yayınları, 1976, İstanbul, Pel 79.)

Ji bo dirokvanekî du rê hene: Yek rêya zanyarî û yê din jî yê kêfîye.

Hejmarê milletê kurd jî hema hema diçibe (wek) girika (problem) sînorê Kurdistanê. Ji ber ku nivîskar li gor kurda hejmarê milletê kurd bîst (20) mîlyon e dibêje. Ne kêr, ne zêde. Lê va hejmar 20 mîlyon, ku bi çî awayî hatîye hesapkirin xuya nake. Di destpêkê da jî di navbera 18-20 mîlyon têt nivîsîn.

Nivîskar gelê Mad bav û kalê kurda dibîne û zimanê wan jî zimanê kurda dijmêre. Eger ku nivîskar kariba jî zimanê Mada tiştêk nîşan bida yê gelek xweş bibûya.

Dema ku mirov dibêje, nivîskar jî çend hêlan va nezan e ku çî nivîsiye rast e. Ji ber ku pirtûk tijî çewtî ye. Nivîskar weha dibêje: "Dewleta "tirka" navên gund û bajarên biçûk yên kurda ku navên xwe bi kurdi, yewnanî û ermenî bûn guhart û navên "tirkî" lê kirin. Va nav guhartina jî sazûna Komara Tirkîyê virda dom dîke."

Ya yekemîn : Çawa dibe ku navê gund û bajarên kurda bi ermenî be?

Ya duyemîn : Divê xalê da jî nivîskar dibe wek yekî koledar. Dibê mirov bipirse : Ma li Fransa navê tu gunda bi kurdi hene? Çima nivîskar xweşik xweşik nabêje (yan jî dibêje) : henek jî milletê kurd bi tev leşkerên "tirka" milletê ermenî kuşt û mal û milkê wan dixwin û li welatê wan jî xwedî dertên. Çî çiyayê Ararat û çî jî gola Vanê dibe.

Pirtûka Memo YETKÎN tijî çewtî ye. Ji bo va çewtîyên xwe ew pirtûk yê mêjîyê gelek kesan şaş bike, lê ne yên zane.

• • •

# VEKOLÎN LI SER SÊ PIRTÛKA

## A . Cantekîn

### LI SER PIRTÛKÊN KU LI SER KURD LI SWÊD HATIN ÇAPKIRIN

Ew pirtûkên ku li Swêd li ser kurd û Kurdistan hatine çapkirin tîjî çewtî ne. Nivîskarê pirtûka çî kurd yan jî çî biyanî be, bi zane yan bi nezane, li gor xwe karekî dike. Lê dema ku nivîskar karekî dike (têt kirin) dibê wî karî li gor şert û mercên zanistiyê bike. Dibê nivîskar jî tiştê rast, heyî, buyî, li ber çava têt dîmê, ku karib bêt telesî (ceribandin, prova) kirin bi rê keve. Bi nivîsîna nivîsandina pirtûkekê mexsed ewe ku xwendevan li ser ew tişt, tiştên ku pirtûk hatî nivîsîn, "piçekî" zane be. Dema ku nivîskar(an) pirtûkên xwe bi tiştên ne yê n rast tîjî kir şûnda, di mêjîyên xwendevanan da jî tiştên ne rast diçîne. Dura pakişkirina jê birina va çewtîyan pir zehmet dibe.

Nivîskar hene ku li ser bêjeya kurd dinivîsin, lê ne bi zimanê wî gelî, ne jî bi temamî bi yekî dîn. Tevî hev dîkin. Li ser kaxizên kaling dinivîsin jî bo ku pirtûk kaling bê xuyakirin. Li ser têdayîyê montaj, teknik jî gotin gelekîn.

Heya ku Kurdistanek serbixwe saz ne be, gelek kes yê li ser milê kurd û Kurdistan bibîn dewlemend.



#### I A

Nivîskar : Memo YETKIN  
Navê Pirtûkê : Kurd û Kurdistan (Kurderna och Kurdistan)  
Ji belavkiryê : Socialstyrelsen  
Çapxane, cih, dem, pel: Modin Tryck AB, Stockholm, 1984, 200

#### I B

Nivîskar: Alar KUUTMANN  
Navê Pirtûkê : Li ser Kurdan (Om Kurder)  
Ji belavkiryê : Kargera Biyaniya ya Dewletê (Statens Inv.verk) -  
Çapxane, cih, dem, pel: Linköping Tryckeri AB' 1983, 253

#### I C

Nivîskar: Rune LOMBRON  
Navê Pirtûkê : Kurd-miletê bê welat (Kurder-folket u tan land)  
Ji belavkiryê : Instituya Politika Dervayi (Utrikespolitiska Institutet) Pirsên her roj yê n politika dinyayê (Världspolitikens dagsfrågor, nr.5 1970  
Çapxane, cih, dem, pel: Aronzon-Lundin AB Stockholm, 1970, 32

## KEMASIYÊN MATERIYAL

Tunebûna materiyalê Kurdi bêguman kêmasiyeke mezin e. Em dikarin bi êsani bêjin ku ji bo dibistan û xwendina zarokan qet materiyal tune. Lî Kurdistanê Iraqê hin materiyal hebûn ji, Kurdên Tirkîyê jê zêde istifade nabin. Derveyî wî tiştî, di çêkirina van materiyan da çewtiyên mezin hene. Di bin kontrola rejimê Iraqê da çêdibin û li gor xwestina wan dimeşe. 5-6 salên dawî da li derveyî welat kêman zêde ji bo çapkîna materiya Kurdi, gelek xebat çêbûye. Hin ji çêdibin. Lê ev xebatê çend xebatekî baş bibe jî, ji gelek aliyan ve kêmasiyên xwe heye. Ji xwe jî bo materiya dibistanê, wek fêrkîna ziman, rêziman, dirok coğrafya, matematîk û.h.w. heta nûha çênebûne.

Lî Swêd, du salên dawiyê, xebatek jî bo çêkirina materiyalê dibistanê dom dîke. Ev xebat jî aliyê SIL (Statens Institut for Lärmedel) û rêxistinên Kurdî Swêd tê ajotin û destpêka 1986 da xebatê wan dê çapbibe.

## KEMASIYÊN MAMOSTAYÊN KOMPETENT

Iro tu mamostayên Kurd yê bi tehsil tune. Mamostayên ku iro li der û dora Stockholmê kar dikin yan jî dibistana berz ya mamostan li Tirkîyê xwendina xwe qedandine, yan jî bî tehsil in. Tecrube wan yê hinkirina zimanê Kurdi nîne, ji ber ku dibistanên wisa li Tirkîyê tune. Lê li Kurdistanê Iraqê rewş ne wisa ye.

Ev jî kêmasiyeke gelek girîng e. Ji ber ku ne tehsilê mamostan ne jî tecrûbeyê hinkirina bi zimanê Kurdi heta nûha tunebû, netîceyê baş girtin jî hin dijwartir dibe.

Isal, 1984, cara yekem e ku dibistana berz ya mamosta Kurd li Stockholmê vebû. Beşa Kurdi girêdayî universîteya Stockholmê ye. Ev gavêk pir girîng e. Dibekê encamê vî dibistanê, kêmasiyên mamostan piçek karîbe jî holê rake. Lê em jî bir nekin ku çend salên pêşî netîceyê sedî sed girtin ne mîmkîn e, ji ber ku tecrûbe, di wî warî da qet nîne. Lê salên pêşî ev kêmasiyan dikare kêmtir bibe. Ji bo vî yekê jî xebatek baş divê.

Not: Ev rapora (lêkolîna) beşek ji rapora "Kurdîska barn i skolan" e û di bin berpirsiyariya PROJA KURD li Tensta-Rinkeby, ji aliyê min, di meha Iton-1984 an da hatiye nivîsin.

Jimareya zarokên Kurd ku bi zîmanê Kurdi dixwin her sal hin zêdetir dibe. Berî sala 1980 ev jimara gelek kêr bû. Berîya 1980 dibistana Kurdi bi belediya Botkyrka da hebû û jimareya za-

rokan ji 4-5 ne zêdetirbûn, heta duwawiya 1980 ji qet dersên Kurdi tunebû. Lê, piştî 1980, ev jimareya her sal hêdi hêdi hin zêdetir dibe. Li tabloya jêrîn ji em dikarin vê rewşa han bibînin.

Statistikên xwendina Kurdi li Tensta-Rinkeby-Hjulsta

Navê dibistanê	1983-84	1984-85	Mamosta
Kvarnby	8 şagirt (1 sorani)	10 şagirt (1 sorani)	3 (1 sorani)
Rinkeby	6 şagirt	6 şagirt	2
Kämpinge	9 şagirt	10 şagirt	2
Gullinge	8 şagirt	11 şagirt	2
Hjulsta	5 şagirt	6 şagirt	1
<b>Jimareya hemû</b>	<b>36</b>	<b>43</b>	<b>4</b>

Statistika xwendina Kurdi navbera salên 1979-1984 li Tensta-Rinkeby-Hjulsta

Navê dibistanê	1979-80 (çend saet)	1980-81	1981-82	1982-83	1983-84
Kämpinge	nine	11,5	7	12	9
Kvarnby	nine	nine	nine	12	12
Rinkeby	nine	nine	nine	nine	13
Gullinge	nine	8	6	4	4
Hjulsta	nine	nine	nine	4	4
<b>Hemû</b>	<b>nine</b>	<b>19,5</b>	<b>13</b>	<b>32</b>	<b>42</b>

— KÊMASI —

KÊMASIYÊN INFORMASYONÊ

Li gora encama vê lêkolînê em dikarin bêjin ku kêmasiyên herî girîngtir di aliyê informasyonê da ye. Ev kêmasi hem li cem Swêdiyan hem jî li cem malbatên Kurda da heye. Di derheqê xwendina Kurdi da di nav malbatên Kurda da gelek kêr informasyon belavbûye. Pê caran dêûbavên Kurd nizanin çawa hereket bikin. Desgavên Swêdi jî ne li ser vê rewşê, ne jî bi temameti li ser rewşa Kurda têr agahdar ninin.. Ji ber vê yekê ew çî ji aliyê zîman, çî jî ji aliyê neteweti ferqên ku di navbera Kurd, Tirk û Asuriyan da heye, pê-

nizanin. Loma jî carnan çewtiyan dikin û zarokên Kurda dişînin cem mamostayên Tirk, yan jî ji dêûbavê wan ra baş informasyon nadin. Ev rewşa bi taybeti li ser zarokan da tesireke nebaş dihele.

Li aliyê din ve jî, divê dêûbavên Kurd jî bo baştir-naskirina civata Swêd û û bi taybeti sistema dibistanê xwe bêtîşînin, informasyonên pêwîst peyda bikin, di wî wari da inisiyatîfî xwe bikarbinin. Meriv civata Swêd çend baş nasbike, ew çend bi baştirin şêwe dikare imkanaan bikarbîne.

derveyi Kurdîstana Iraqê rewş bî tevayî ev bû. Dî şûna viya da zêdetir lî ser xwendina zarokan lî dibistanên Tirk, Ereb yan jî Ecem, hatiye sekînanîn. Dêûbav zêdetir giraniya xwe didan ser vi esasi û dîxwestin zarokên wan tehsiyek baş bîbin.

Lê, lî Swêd dema ku imkan çebûn û zarokên Kurd jî karibûn bî zîmanê xwe lî dibistanê da bîxwinin, dî nav dêûbavan da bêhaziriyek dî vi wari da, xwanêkîr. Pîraniya wan jî bo vi yekê xwe yan amade neditin yan jî jî kêmasiyên informasyona gîştî, nîzanibûn dê ew çawa bîkî. Lê, ew dî eynî demê da jî dîl dîxwestin ku zarokên xwe bî zîmanê Kurdî bîdî xwendinê. Hinek dêûbav dîtirsiyan ku zarokên wan çend zîmanan dê tevlihevi bîkî û qet yek jî wan jî baş fêrnebî. Jî aliyê materiyal û mamostayên Kurdî jî kêmasiyên ku iro hene, dîhat bira wan. Bêguman ewan mîşkîleyên gelek grîng bûn. Lê, hebûna van mîşkîleyên ku mîn lî jor jîmart, zêde tesîrên nehîni nelîhist lî ser dêûbavên Kurd. Pîraniya wan zarokên xwe dîşînin dibîstana Kurdî û bî

rastî jî dîxwazîn ku zarokên wan bî zîmanê xwe bîxwinin. Lê, hinek malbat hene ku naxwazîn zarokên xwe bîşînin dibîstana Kurdî. Ev, yan jî tîrsa kolonyalîstan, yan jî jî nezaniya wan bî xwe tê. Ez bawer dikim, ger informasyonek baş lî van kesan ra bîgîje, ew dê tewrê xwe yê çewt bîgehîrin.

#### REWŞA ZAROKÊN KURD Lî BELEDÎYEYÊN DER Û DORA STOCKHOLMÊ DA

Lî der û dora Stockholmê da iro deh (10) mamostayên Kurd kardîkî. Jî van heştê wan bî dîyalekta Kurmancî û duyê wan jî bî dîyalekta Soranî ders dîdî. Pîraniya zarokên Kurd ku bî Kurdî dîxwinin, lî der û dora Tensta-Rinkeby yê rûdînin. Bes lî vi mîntiqê 43 şagîrtên Kurd hene. Dî temama der û dora belediye yê Stockholmê da jîmareya şagîrtên Kurd 99 in. Em dîkarîn bêjî ku teqîben nivî lî Tensta-Rinkeby rûdînin. Lî tabloya jêrî da em dîkarîn başîrin rewşa han tesbît bîkî.

Navê Belediye	1984-85	Ders	Mamosta
Stockholm (rinkeby, Tensta, Akalla, Hjulsta, Bagarmossen, Alvik, Söder)	51 şagîrt (kurmancî) 13 şagîrt (soranî)	91 saet (kurmancî) 21 (soranî)	3 1
Botkyrka (Fittja, Skårholmen, Bredång, Vårby.)	19 şagîrt (kurmancî) 4 şagîrt (soranî)	55 (kurmancî) 8 (soranî)	3 1
Sollentuna	12 şagîrt (kurmancî)	25	1
Jîmareya hemû:	99 şagîrt	200	8
	(82 şagîrt (kurmancî) (17 şagîrt (soranî))	171 29	7 1

# Zarokên Kurd lı Swêd

## bı zımanê kurdi dıxwinın

Keya IZOL

Iro lı Swêd nêziki pênc hezar Kurd heye. Pıraniya wan pışti sala 1970 û ji ber sedemên siyasi hatine Swêd. Nemaze pışti sala 1980, bı guherandına rejima Tırkiyê û şera navbera Iraq û İrânê jumareya Kurda lı derveyi welat hin zêdetır bû. Yek ji welatên ku Kurd wek multeciyên siyasi hatın, Swêd bû.

Lı Swêd, lı ser vi buyeri, ango lı ser hatına Kurda, lêkolinek geş destpêkır. Hin desgayên resmi yê Swêd ku bı meselên multeciyan mişkil dibûn, pêşengiya van lêkolinan dıkrın. İro ji ev tişt bı çend aliyan we hin ji dom dıke. Rewşa zarokên Kurd lı Swêd, ji van meselan yek e.

Lı ser rewşa zarokên Kurd û xwendına wan lı Swêd, pır gutûbêj çêdibe. Hem desgayên fêrkirî yê Swêd, hem ji Kurdên Swêd bı xwe lı ser vê meseleyê gelek dısekinın.

Lı gora istatistika resmi, pıraniya Kurda lı der û dora bajarê Stockholmê rûdının, û zarokên wan ji lı dibistanên der û dora Stockholmê xwendına xwe dıdomının.

Wek multeciyên siyasi lı Swêd, gelek gır û gıriftên Kurda heye. Yek ji van, dı civata nûh da, lı ser rewşa zarokan e. Ev mesele gıng e, ji ber ku pıraniya van zarokan dê lı Swêd mezın bıbin û xwendına xwe lı vır bıdomının. Dıbeku geleki ji van jına xwe ya pêşta lı Swêd derbas bıkın û heta dawiya jına xwe lı vır bıdomının. Dıbeku Swêd bıbe welatê wan ya duwemin.

Pıraniya Kurdên lı Swêd, lı welat dı nav xebata siyasi derbaz bûne. Geleki ji wan dı bı teror û işkenceya kolonyalistan mane. Zarokên wan ji dı bıbin van rewşên dijwar da mezın bûne, ji operasyonên polis, lêdanên cenderme, işkence û zılm para xwe gırtine. Lı ber çavên wan da dêûbavê wan lêdanan xwarine, hatine gırtın. Ewan bûyeran lı ser zarokan da ji aliyê piskolojik ve tesirên zor xırab hıştine. Tesirên weha xırab ku jin û istiqbala wan lı Swêd dıkarê ji vi yekê ziyane n mezın bıbinın.

Zarokên me derveyi van tiştan, ji aliyê zımanê zıkmaki ve ji pır zehmeti dıkêşın. Kolonyalistan her dem ji bo asimilekirına zarokên me bı awaki zaniyari xebitine. Armanca wan ew e ku zarokên Kurd eslên xwe wunda bıkın û ji bo gelê Kurdistanê xebatê nekın. Dı vi wari da gelek rê gırtine û iro gelek zarok û mezınên Kurd bı netica vi siyasetê, zımanê xwe ya zıkmaki nızanın.

Rewşa zarokên Kurd ku lı Swêd dıjin, ji aliyê zımanê zıkmaki ve çet ne baş e. Pıraniya wan çend zımanan (swêdi, kurdi, tırki, erebi) bı hevra û bı awaki tevlihevi û bêsystem bıkartının. Ji aliyê gramatik (rêzıman) ve pır zehmeti dıkêşın. Zarokên ku lı Tırkiyê çûne dibistanê, kê m ji be, terminolojiya Tırki hin bûne. Gelek caran dı nav malbateki da hin endamê malbatê tenê Tırki, hin, tenê Kurdi, hin ji, herdu zımana bı hevra bıkartının. Zarokên wan ji her wısa. Tu zımaneki ji pêşda naçe û bı her aliyê ve bı gelek kêmasiyên gıng tên holê.

Lı Swêd rewşa civaki û abûri wek ya welatê me nine. Ji gelek aliyan ve dı nav herdu civatanda ferqên mezın hene. Meriv nıkare barawerda Swêd bı welatê me ra bıke. Ji ber vi yeki, Kurdên ku lı Swêd wek multeci dıjin, bı êsani dıkarın pır mışkileyên nûh ve bıdın bıstının. Dı destpêka jına multeciti da dı nav malbatên Kurd da bêbaweri û tevliheviyek tevayi çêdibe. Bavûdê, carnan xwe dı nav jına Swêd de bêfonksiyon dıbinın. Dema ku zarok dêûbavê xwe dı nav sistema (jına) nuh da carnan bêfonksiyon dıbinın, ew ji dı bıbin tesirek mezın da dıminın. Ev bûyera lı ser zarokan da tesirek nehini dıhêle.

Lı gora vi yeki ji zarok pır caran ji rewşa xwe agahdar ın. Ewan dızanın ku hêviya dêûbav lı ser wan gelek mezın e. Dêûbav dıxwazın û hêvi dıkın ku zarokên wan dı jına xwendın û kar da xwe baştır bıgıntın û bı awaki tevayi dı jına xwe da ser bıkevın. Dêûbav dı bıbin tesira vi yekê da, peydabûna gelek mışkileyên nûh ji bir dıkın. Ewan bawer dıkın çey imkanên baş ku lı Swêd mewcûd e, ji bo serfiraziya jına meriv, dê baş têr bıke. Lê realite ne wısa ye. Her çıqas lı Swêd imkanên baştır hebın ji, mışkileyên nûh dı civateki nûh da bı êsani dıkarın peydabıbin, û dıbin ji. Pır kesên biyani zû be zû nıkarın adapte jına lı Swêd bıbin. Rewşa Kurdan ji dı vi wari da çet ne baş e.

Mışkileyek dın ji ev e:

Dem a ku meriv lı welat bû, imkana xwendına Kurdi, yan ji dibistanên Kurdi tunebû, qedexe bû. Ji ber ku dı vi wari da tu tecrubeyên kesi ji tunebû (nemaze lı Kurdistanê Tırkiye) u her wısa dı demekı kurt da helkırına vi meseleyê dijwar bû, gelek kes lı ser xwendına Kurdi zêde serê xwe neêşandine, lı ser vi meseleyê nesekinine. Lı



Vietnam

Där sprang ett barn  
där föll en bomb  
där släcktes liv  
där väcktes hat  
där kvävdes frihet  
där dränktes hopp

Där föddes barn  
där tändes låga  
där brann en eld  
där såddes tro  
där uppstod frihet  
där segrade kärlek.

*Nils Hafdelin*

Vietnam

Li wê zarokek bazda  
li wê bombayek ket  
li wê jîyan hat vemirandin  
li wê rik hat hîşyarkirin  
li wê azadî hat fetisandin  
li wê hevî hat xenikandin.

Li wê zarok ji dê bûn  
li wê pêt hat vexistin  
li wê agirek dişewitî  
li wê bawerî hat çandin  
li wê azadî serî rakir  
li wê evîn bi serket.

*Nils Hafdelin*

Zinar Şîro ji swêdî wergerandiye bo kurdî.

.....

DU HELBESTËN SWËDÎ

Den stumma lyckan

De sutto tysta  
i morgonsolen  
och sågo bara  
varandras ögon.

Och luften lyste  
som eld omkring dem,  
och deras hjärtan  
av jubel värkte,  
men deras läppar  
darrade bara.

Det ville fatta  
tag i varandra,  
skratta, snyfta,  
med heta händer  
pressa sig samman,  
men lama av lycka  
händerna lågo.

De böjde sig stumma  
i gränslös ömhet  
mot varandra  
och ögonen fylldes  
av strålande tårar.

*Erik Blomberg*

Ev şadmaniya lal

Ew di tava sibê da  
bêdeng rûniştibûn  
û wan tenê  
çavên heûdin didiyan

U hewayê wek agir  
li çarmedorên wan ruhnî vedidan  
û li dilên wan  
ji narênên şabûnê davêt û diêşyan.  
lê lêvên wan  
tenê dileriziyân.

Wan dixwistin  
destên xwe hişk bixistana nava hev  
bikeniyana ji tîqetîqan binîşqiyana  
bi detên bi tên  
xwe bi hev va biguvaştana  
lê ji bextiyariyê lertzok  
û destên wan dirêjketî bûn.

Wan di evîna  
li hember hev a bê tixûb da  
xwe bi lalî sipartibûn hev  
û çavên wan  
ji rondikên çirisandî tije bûbûn.

*Erik Blomberg*

de. Di helbesta kurdî ya modern da, gava pêşîn ya Goran e.

"Minalêk im korpey naz  
Wek bawkî xom aştîxwaz  
Kotirî sipî teqlebaz  
Le çeqel ekem derbaz  
Namewê girmey bomba  
Be kutek le kelem ba  
Namewê çepokî şer  
Malî bawkim ba beba  
Minalêk im minalêk im aştîxwaz  
Bawkim nabê bê kar bê  
Rût û qût û hejar bê  
Daykim firmeskî xemî  
Wek dilopî bahar be  
Minalêkim, minalêkim aştîxwaz.

EFRANDÎNÊN GORAN

\* Berhevoka (dîwan) helbestên Goran, ji aliyê Komela Nuseranî Kurd di sala 1981 da hatîye çapkirin.

\* Sirûşt û Derûn li gel Operêtî "Encami Yaran" -1958.

\* Beheşt û Yadîgar

\* Firmêsk û Huner

\* Helbestek bo Minalan

Goran her çi helbest nivîsîye, di ko var û rojnameyên kurdî da li derve û lî hundirê Îraqê belav kirîye.

Ebdulla Goran gelek pexşan jî nivîsîye. Ew jî dê di berhevokekî da bêtin çap kirin ji aliyê Komela Nuseranî Kurd.

ÇAVKANÎYÊN NIVÎSARÊ:

- 1)- Dîwana Goran, Mihemedê Mela Kerîm
- 2)- MéjûyEdebî Kurdî, A. Secaddî
- 3)- Tarîxa Edb. Kurdî, Q. Kurdo
- 4)- Helbestên Şoreşgerî ji Kurdistana Iraq, 1981, Uppsala
- 5)- Om Kurder, A. Kuutman, 1983.

o o o o o o o o o o

1959'an da dibe berpirsiyarê kovara "ŞE-  
FEQ" û kovareke din bi navê "BEYAN" der  
dixe. Çima ku diçe di kongra mamostayên  
kurd da beşdar dibe, karbidest wî ji karê  
wî dûr dixin. Di nîvê sala 1960'an da  
Ebdulla Goran diçe Bexdayê û li unîver-  
sîtê, bi mamosta Cîgerxwîn va tevayî di  
beşa kurdî da ders dide. Ew her wê demê di  
be endamê rojname "Aza dî" jî.

Sala 1962'an ew tê hilbijartin wek en-  
damê Komîta Aşitiya Cîhanê. Cara pêşîn  
di 1959'an da wek mêvan, lê cara duwem di  
1962'an da, ji ber nexweşîya xwe diçe Sov-  
yetîstanê. Li Moskova sê mehan di nexweş-  
xanan da dimîne û paşê vedigere Îraqê. Lê  
pir naçe nexweşîya wî (Kansêr) dîsa lê  
peyda dibe û her diçe zêde dibe. Goran ji  
ber vê yekê vedigere Sulêymanîyê û dike-  
ve nav nivînan.

Ebdulla Goran di roja 18.11.1962'a da  
çavên xwe li jîyanê digre.

#### BÎNGEHÊN HELBESTÊN GORAN

Ebdulla GORAN, wek me li jorê di serpe-  
hatîya jîyana wî da jî xwend, zehmetkeşe-  
kî çand û edeba kurdî ye. Di serpehatîya  
jîyana wî da, em, wî carna di zîndanê da ;  
carna di redaksiyonên rojname û kovarên  
kurdî da; di çekirina rêyan da wek kar-  
ker; li unîversîtê wek dersdar; di Komî-  
ta Aşitiya Cîhanê da wek endam dibînin .  
Ew gîyanê (ruhê) xwe yê şoreşger ne tenê  
di helbestan da pêşan dide, herwisa di pi-  
raktîka jîyanê da jî nîşan dide.

Şiyarbûn û raperîna gelê kurd li dijî  
kolonyalîstan daxwaza sereke ye li ba  
Goran. Ew bi hezkirina gel û welatê xwe  
helbestên xwe dihûne.

*"Demi raperîn e, demi raperîn  
Heta key be sistî û be pestî bijîn  
Pelamarê ey kurd aregrîştinê  
Le dil kirmî nakokî derkirdinê  
Be yek bûne gişt  
Pitewbûnî pişt  
Be yek bûn ebê  
Gelît serkewê  
Demî raperîn e demî raperîn  
....."*

Di helbestên xwe da ew, ne tenê behsa  
dijwarîyan û zulma dujminan dike, lê her  
wisa li dijî zordestîyê, rê û dergayê

rizgarîyê jî nîşan dide. Di girtîxanê  
da, Goran, bi hêvîyeke xurt, berxwedide  
û bawerîya xwe jî bo azadîyê, tekoşerî  
yê weha derbasî nav helbestê dike:

"....."

*Belam to Ejdehak, le helpeyek xorak,  
Natwanî bikewî bo maxî napak.  
Her egrî, ekujî, edey le gerden,  
Mêşk derxward edey be marî newsin...  
Ta rojek ew xwêney be naheq riştî,  
Ew bîrey wat zanî êcgarû kuştî.  
Taw eden tenûrî demarî Kawe,  
Ew çekûşweşîneyrolekujrawe.  
Exroşê û ecoşê û komel yek exa.  
Her helwas ebînî zîndanût rûxa!  
Ew hele her le zîdanita mird,  
Ebête mayey bex bo netewey Kurd.  
Le bînkey peykerya enûsrê nawî,  
Le gel gişt kirdewey pesendkirawî!..."*

Di pêşgotina dîwana Goran da Ezed  
dîn Mustefa Resûl dinivîse: "nivîsarên  
Goran yên herê pêşîn yên romantîkî ne,  
lê nivîsarên wî yên paşîn yên realîstî-  
yê rexnegirî sosyalîstî ne "... " Goran  
helbestên neteweyî, yên dostî û hevka-  
rîya gelê kurd û ereb gelek nivîsîne û  
bingeha biratiya wan berk kirîye, mirata  
samanê netewê xwe qayîm kirîye."

Bi rastî ji Goran niştîmanperwerîya  
xwe bi dîtînen internasyonalîstîyê va  
xurt kirîye. Dema ew ji bo azadîya kurd  
û Kurdistanê têdikoşe, li der û dora  
xwe jî dînerê, di pencereyeke fireh ra  
li cîhana hevçaxî temaşe dike.

Ji ber ku wî çend ziman dizanibû, ji  
huner û edebîyata cîhanê agahdar bû. Wî  
ji zimanên bîyanî gelek nivîsar wergeran-  
dîye ser zimanê kurdî.

Ne tenê di alîyê naverokê da, lê her  
wisa di alîyê şewayê nivîsîna helbestan  
da jî helbestên Goran hêja nin. Dema ew  
bi wêneyên cuwan şax û newalên Kurdistan  
ê; Çiyayên "Hewraman" û "Qeredaxê" dî  
helbestên xwe da tîne ber çavan, yan jî  
wek "Sawayî Aştîxwaz" gazî dike, qafîye-  
yên kurt û dirêj bi hostatî lî hev tîne,  
lê bi weznên klasîkî pênûsa xwe girêna

## pêşewayê helbesta

## kurdî ya modern

# GORAN

LEZGÎN

Goran di sala 1904'an da li bajarê Helepçê hatîye dinyayê. Bavê wî (Sulêyman) bapîrê wî (Ebdulla Beg), bi kurdî helbest nivîsîne. Di zarotîya xwe da Goran pêşiyê li cem bavê xwe hînî xwendina Quranê dibe û paşê xwendina xwe li bajarê Helebçê, bi zimanê tirkî distîne. Hingê ew di pola çaran(4) da bû îngilîz ketne Îraqê û Kurdistanê û Helebce kete destê îngilîzan. Di sala 1921'an da Goran li Kerkûkê dest bi Dibistana Mamostatîya Îlmî dike lê paşê ew ji ber tengasîyên aborî dest ji vê dibistanê berdide û di çêkirina rêyan da dibe karker. Ebdulla Goran, çar salên xwe -ji 1921 heta 1925- di nav belên gazîyeke giran da diborîne.

Goran, cara yekem di sala 1925'an da li Helebçê dibe mamosta û duwanzde salan li wir ders dide. Ew bi xwe fêrî zimanê tirkî, erebî, farisî û îngilîzî dibe, pirtûkên lîteraturî yên pêşkevî bi zimanê tirkî û ewrûpî dixwîne.

Di sala 1937'an da karê wî tê guhar-tin, ew di qulixa Wezîretîya Çûyîn-Hatîne da dixebite. Di wê katê da ew dest bi nivîsandina helbestan dike. Ebdulla Goran helbestên xwe yên bi navên "Geştekek li Qeredaxê" û "Geştekek li Hewrêmanê" di nav van salan da dinivîse. Ew, di van helbestên xwe da reng û rûyê Qeredaxê û Hewrêmanê, bi hostatî dixemilîne û tabloyên wan tîne berçavê xwendevanan. Wê demê Goran di tesîra romantîkê da ye.

Ebdulla Goran, di nav salên 1940-1945'an da, li bajarê Yafa, di êzga "Hevpeymana "Rohilata Nêzîk" da dixebite. Wê demê ew dibe hevalê kesên şoreşger û ronakbîr û ji bo azadîya gelê xwe bi zîrekî dixebite. Ew, cara yekem di sala 1951'an da tê girtin. Sala din ji girtîxanê tê berdan. Goran her diçe li tevgêra azadîyê, li xe bata sîyasî germ dibe. Piştî ku ji girtîxanê tê berdan vedigere Sulêymanîyê û li wir dibe berpirsîyarê rojnama "JÎN". Heta Îlona 1954'an li ser vî karî dimîne. Di Cotmeha 1954'an da li gel endamên "Komele Aştîxwazên Sulêymanîyê", ji alîyê polêsan va tê girtin. Du sal ceza danê. Ew salekî di zîندان da (Li Sulêymanîyê Kûtê, Kerkûkê û Beqûbê) derbaz dike û salekî jî di binbala polês da dimîne. Piştra ew vedigere Bexdayê û li wir, di çêkirina avayên dewletê da dibe serkarê karkeran. Pir lê naçe dîsa rejim êriş dibe ser nîştimanperweran. Ew jî tê girtin. Hukmê urfî li Kerkûkê, wek ceza du rêyan datîne ber Goran : Yan sê sal zîndan; yan jî bi wî şertî ku di nav sê salan da li dijî rejimê tu xebat û gotinekî neke û hezar dînarî bide. Ne hezar dînarê Goran, ne jî di falsefa Goran da bêdengî hebû. Ew zîndanê dijberê û salên xwe di bendexana Kerkûkê û Baqûbê da derbaz dike, hetanî piştî serkevtina şoreşa 14'ê Tîrmehê (1958).

Goran, piştî ku ji zîndanê derdiçe vedigere Sulêymanîyê ser karê xwe. Di sala

**DUWAYI :**

Bî kurtayi, dema mirov lî zarawayên kurdi bî-nêre lî gora lê kolin û xebatên ku dî vi warida he-ta niha hatine kîrîn van pîrsan dibine. Naskîrîn û bînavkîrîna pîrsan jî bo bîşaftîna wan gava yekem e. Ê ev jî bî xwe berpîrsiyariya ku lî pêşiya zîmanzan û nîvîskarên kurdi û armanca xebata wan nîşan dîde. Wek dî kovara "Hêvi" de hatiye bînavkîrîn, ev armanc:

"Rojeki hemû zarawayên kurdi bî alfabeyeki stansart, bî awayeki ronak û yekbûyi bîn nîvinin. Zîmaneki yekbûyi bî gotînen hemû zarawayan dewlemendkîrî û zelal ku kurden hemû navçeyên welatê me dîkarîbîn pê jî hevûdu fehm bîkî, yekûdî bînasîn, nêzikî tî hev bîbîn. Yekîtiye zîmên bîgehê yekîtiya gel e."(13)

Dî vê nîvîsê da, wek kareki xwendekari lî xwendegêha bîlîn ya mamosta -beşa kurdi- da mîn lî gora xebat û lêkolînen ku bî taybetî lî ser zarawayên kurdi hatine kîrîn ku mîn bî dest xîst, pîrsên zarawayên kurdi û rêya bîşaftîna wan jî çend alîyan ve da ber hev. Hêvi û daxwazê ve ku dî vê noqte da lî gora îmkân û zanîna xwe gîgîştî-bîm vê armancê.

**Serkaniyên ku nîvîsê da derbaz dîbîn:**

- 1-) Fuad Hama KHORSHID- Kurdish Language and the geographical distribution of Its dialects. Baghdad 1983, Rûpel 16
- 2-) Bînêre serkani 1, Rûpel 16.
- 3-) " " 1, Rûpel 17.
- 4-) HÊVI, Kovara Enstîtu ya Kurd Lî Paris, hejmar 1-Ilon 1983, rûpel 9.
- 5-) BERBANG, Kovara Federasyona Komelên Kurdistan Lî Swêd, hejmar 5-Çîriya Paşîn 1982, rûpel 13.
- 6-) Bînêre serkani 5, rûpel 12.
- 7-) " " 1, rûpel 17-18.
- 8-) HÊVI, hejmar 2-Gulan 1984, rûpel 32-33.
- 9-) Bînêre serkani 5, rûpel 13.
- 10-) " " 1, rûpel 29.
- 11-) " " 1, rûpel 29-30.
- 12-) " " 4, rûpel 17.
- 13-) " " 4, rûpel 9.

## JI ALI ZANISTIYA ZIMAN VE ZARAWAYÊN KURDI

Pirtûk û nivîsê ku min di vê xebata xwe da bikaraniye, cudabûna zarawayên kurdi ji aliyê zanistiya ziman ve bi awaki fireh negirtine. U di vi wari da xebatên fireh nehatine çêkirin ji. Xebata zimanzanê kurd Profesor Oanadê Kurdo li ser gramera (Rêzimana) zarawayê kurmanci û sorani ku bi zimanê rusi hatiye nivîsin û wergerandin û çapa wi ya bi zarawayê sorani -tipên erebi- hatiye çûkirin (Adar 1984) di vi wari da xebata heri firehtir ku heta niha hatiye çêkirin. Herweha navên Tewfiq Wehbi, D.N. Mackenzie, Jemal Nebez bi xebatê wan ya di vê wari da di vê bê naskirin.

Her çen, wek tê zanin di vi wari da lêkolîn û xebat bi hejmarên pêçiyar bêtir jî ev pîrsa ha bi hinek aliya ve hatiye mînaqêş kirin. Ji bo ku ev kêmasiya ha rê ji dijminên gelê kurd ra vedike ku, zarawayên kurdi wek zimaneki cuda binavbikin, yan jî ev ditina xwe heta inkarkirina zimanê kurdi jî bibin, zarawayên zimanê kurdi wek zarawayê zimaneki din nişan bidin û hwd. Ji bo vê yekê divê ku yekitiya zimanê kurdi û zarawayên wi di warê zanistiya ziman ve jî bê vekirin, parastin û pêşxistin.

Fuad Hama Khorshid, dema bersiva hinek pîrsa di vi wari da li ser zimanê kurdi û zarawayên wi dide, van pîsên jêrin dipirse,

"Li vê derê pîsekê girîng dikare bê pîrsin: çiqas cudabûn (ferq) di nav zimaneki da kare hebe (kare bê qebûlkirin) ? Û kingê ev cudabûn di navbeyna zarawayan da rê ya derketina du zimanên cuda vedike ? " (10)

Bêguman van pîrsana gelek girîngin, û bersiva wan, nivîskar bi vi awayî dide :

"Bi vê awayî em dibinin ku, zarawayên kurdi çiqas jî hevûdu cuda dibin bila bibin, ev yek nabe binaxeyeki (bingehêki) ji bo bi derewderxistina esil û resenbûna vi zimani, ya jî bo dabirin û cudakirina çend zarawa ji kok û regê wanê kurdi, bo ku heta kesên van zarawayan dipeyivîn bawer dikin ku, ew zimaneki jî deri kurdi napeyivîn û li gel vê jî bona grêdana (mîrovatiya) xwe, ahlaqî û psikolojîk xwediyê berpîsiya gîştî (yekbûyi) ne, ev yek sedemeki ye ji bo bi derewderxistina van ditinên neobjektîf (nerast) li ser yekitiya zimanê kurdi." (11)

Ev pîrs û bersiva wi bi serê xwe dijwariyên zimanê kurdi di warê zarawayên wi de dide xuyakirin. Eşkereye ku, heta li ser zarawayên zimanê kurdi, bingehên wan û cudabûna wan li gora zanistiya ziman neyên vekirin, dengê dijminên gelê kurd her wisa li ser zimanê kurdi jî derkeve û tesirên wi yê nêbaş dê dom bike.

Iro zimanê kurdi bi alfabeyek standart û yekbûyi nayê nivîsin. Li gel vê yekê, sê tipên cuda di zimanê nivîsin ya kurdi da tê bikaranîn, wek Latîni, Erebi û Kirîli. Bêguman sedemên wi hene, lê bikaranîna alfabeyek standart û yekbûyi gavê heri pêştir û girîngtir jî bona nêzîkîna zarawayên kurdi û avakirina zimaneki nivîsin ya yekbûyi. Di gel vê yekê, dema xebat li ser bikaranîna tipên cuda cuda li hember dijwariyên ku hen bê kirin, ew dê bişaftina pîrsên zimanê kurdi û zarawayên wi hêsatir bibe.

Di vi wari da xebatên zimanzan û nivîskarên kurd jî çar perçên Kurdistanê bi hev re roleki mezin digre. Ji bo vê yekê jî civina ku bi beşdarbûna çend zimanzan û nivîskarên kurd bi destê Enstituya Kurd Li Paris pêk hatiye û biryarên ku hatine girtin di vi wari da cîyeki gelek girîng digre. Yek ji biryarên civinê jî li ser zarawayên kurdi ye. Di vê biryarê de wani tê gotin:

"Ji bo nêzîkîna zarawayan divê berî her tiştî dewlemendiyên her zarawayeki qenc bê nasin. Ji vê bûnê, divê em hemu imkanan seferber bikin ku zûtirin ewxt gotinên her zarawa û devokeki, bê guherandon û bê gotinên van salên dawî çêkiri bicivînin û ferhengên zarawayan pêk binin. Ewê jî ber ferhengên devok û zarawayan ferhengê zimanê kurdi derkeve." (12)

Û di sa biryarên ku li ser bikaranîna alfabê kurdi û tipên wi bi awaki yekbûyi hatine girtin, pîrsên zarawayên kurdi û rê ya bişaftina wan xuya dike. Lê wek min berê jî binav kir, nêzîkîna zarawayên kurdi ne tenê bikaranîna alfabeyeki yekbûyi û tipên yek in, li gel van xebata, di vê mîrov di wari zanistiya ziman de jî lêkolîna çêke û pîrsên ku di vi warida hene derxe holê. Dema mîrov cudabûnên wek pîrsa "nêr û mê", di zarawayên kurdi de, pîrsa "navên naskirî û nenas", û hwd. bine ber çava, girîngiya vê tiştê di xebata yekbûna zimanê kurdi ya nivîsi dê derbikeve holê.

BELAVBUNA COGRAFI  
 Û BIKARANINA ZARAWAYÊN KURDI


" Sedemên jihev cudabûna yê n ku pêşî tên  
 huşê mirov ev in :

- 1-) Qada (saha) hıberinê : yê n ku bi çandî-  
 ni û heywanan mijûl dibin, koçer.
- 2-) Qada ciwarbûnê : bajari û gundi.
- 3-) Qada cografî : deşt, çiya, qerexên çe-  
 man, tesira iklimê .
- 4-) Peywendiyên bi civatên din re : mesela  
 yê n ku nêzi Ereb û Tırkan in û danûs-  
 tandinên wan ê n ji nêz ve hene.
- 5-) Elementên dini : mesela kurdên ku bi  
 mısılmaniyê bawer kirine û yê n ku bi  
 Eziditiyê bawer kirine.
- 6-) Nêzbûn û dûrbûna ji merkezên bazır-  
 gani û rê .
- 7-) Dûrbûn û nêzbûna ji saha tesira dewletê
- 8-) Şer û malbarkirin." (6)

Fuad Hama Khorshid ji "sedemên zêdebûna  
 zarawayên kurdi dî lêkolina xwe da bi du sede-  
 mên sereke, wek sedemên cografî û sedemê po-  
 litik binavdike. (7)

Çawa ku min dî destpêka nivîsa xwe da dabû  
 xuya kirin, gelê kurdi şertên (rewşên) taybeti  
 da diji, her wisa ji ev şertên taybeti, ango tune-  
 bûna dewlet û otoritên merkezi xebata li ser zı-  
 man û zarawayên wi ji giran û dijwartir kiriyê.  
 Beri her tiştî heremên (mıntıqên) Kurdistanê ku  
 zarawayên cuda tên bikaranin bi sinorên kolon-  
 yalist ji ji hev cuda bûne. Ev yeka bûye bendeki  
 mezîn li pêşîya danûstandina jiyan, xebat û pêş-  
 vebırina zıman û bêjeyê kurdi. Li gel vê, wek ni-  
 viskar û helbestvan Ferhad Şakeli dî nivîsa xwe  
 ya li kovara "Hêvi" da daye xuya kirin, "pile û  
 loka nexwendewariyê", "nivîsinê zımanê kurdi  
 bi sê rengên alfabeyên cuda cuda" û hwd. (8) dî  
 cudabûna zarawayên kurdi da rolên mezîn dili-  
 zın. Dî bin vê rewşa ha da, xebat û lêkolîn li ser  
 zıman û zarawayên kurdi, û nêzkirina zarawayan  
 demek dirêj yan nehatiye kirin yan ji gelek kê m  
 in. Bêguman ew xebatên giranbiha ku dî bin rewş-  
 ên giran da hatine kirin û heta iro ghiştine di-  
 vê neyên jibirkirin

Bi kurti, rewşa Kurdistanê ya siyasi û dî vê  
 bingehê da abûri û civati dî sedsala 20 an da li ser  
 paşvemayina zımanê kurdi û cudabûna zarawa-  
 yên wi da sedemê sereke ye. Ji bo ku ev rewşa  
 hın ji ber dewame, bêguman ew dê tesira xwe ya  
 nebaş (negatif) li ser xebata zımanê kurdi û zara-  
 wayên wi ji dom bike. Lê xebatên ku iro tên ki-  
 rin nişan dide ku li hember ewqas rewşên xırab,  
 di sa ji mirov dikare gelek gavên pêş dî vi wari da  
 bavêje.



- ==== Kurdiya Bakûr (Kurmanji)
- ==== Kurdiya Başûr (Sorani)
- ==== Kurdiya Rojhilatî Başûr (Lurri)
- ==== Zazaki
- Gorani

Zarawayên ku li Kurdistanê tên peyivandin (9)

Nexşeya jorin, belavbûna zarawayên kurdi ji  
 aliyê cografî nişan dide. Wek min berê ji nivîsî-  
 bû, nexşeya zıman de ji eşkereye ku binavkirina  
 zarawayên kurdi tenê li ser bingehê cografî tê r  
 nake. Divê li gel vê, sedemên binavkirin, tesbit  
 û naskirina zarawayên kurdi ji aliyê zanistiya zı-  
 man ji bê derxistin, eşkerekirin.

Iro dî nav zarawayên kurdi da, kurmanci ya  
 bakûr (kurmanci) û kurmanci ya navin (sorani)  
 zarawayên heri pêşketi ne. Ji yana bêjeyi ya  
 kurdi ji aliyê zımanê nivîsinê bi van zarawayan  
 tê naskirin û pıraniya gelê kurdi van herdu za-  
 rawayan dipeyivın û dinivîsin. Lê zarawa kur-  
 manci bi tipên latîni (bi pırani) û zarawa sorani  
 bi tipên erebi tên nivîsin. Bi zarawa zazaki (du-  
 mli) ji lê kokin û nivîsên edebî çend salên dawî  
 zêdetir dibe û pêşdikeve. Lê divê mirov jibir ne-  
 ke ku li gora lêkolînên ku heta nîha hatine çê ki-  
 rin ji yana edebî ya kurdi da nivîsa heri pêştir ji  
 ali Baba Tahir Hemedani dî sedsala 10 an da bi  
 zarawayê Luri hatiye nivîsin.



## BINAVKIRINA ZARAWAYÊN KURDÎ

Lê kolinên ku ji aliyê gelek zımanzan û niviskarên kurd û biyani yan ve hatiye çêkirin nişan dide ku di zımanê kurdî da çar zarawayên bingehîn (sereke) hene. Lê di sa ji hê di hejmar û binavkirina zarawayên kurdî da yekitiyeki gıştî di navbeyna van da nine. Hejmara zarawayên kurdî ji aliyê lûnek niviskar û zımanzanan ve ji vê hejmara ku min nivisi kêmtir yan ji zêdetir ji tê jimartin. Û di binavkirina van zarawayan da ji ditinên piraniya niviskar û zımanzanan her çend wek hev e, yekitiyeki gıştî di vi wari da ji nine.

Fuad Hama Khorshid di lêkolina xwe ya li ser zarawayên kurdî da dibêje ku, "zarawayên kurdî li gora rastiyên cografî û zanistîya zıman di nav çar zarawayên sereke da dabeş (belav) dibe.

"(1) Niviskar van zarawayan ji wek :

- 1- Kurmanci ya bakûr
- 2- Kurmanci ya navin
- 3- Kurmanci ya başûr
- 4- Gorani." (2)

binav dîke. Lê mixabîna di vê lêkolînê da, li gora kijan esasên zanistîya zıman (Linguistic) û di kijan noqtan da van zarawayan ji hevûdu cuda ne nehatiye nivisin. Di sa niviskar di vê xebata xwe da van zarawayên sereke, ku li jor hatin nivisin, bi çend devokên herimi (mıntıqî) ji hev cuda dîke. Ev yek li gora şema yê jêrin hatiye nivisin. (3)

Zarawayên Sereke	Devokên Herêmi
Kurmanci ya Bakûr	Beyazidi, Hekari, Şemdinani, Boti, Devokê rojava, Behdinani
Kurmanci ya Navin	Mukri, Sorani, Erdelani, Silêmani, Germiyani.
Kurmanci ya Başûr	Luri (Feyli), Bextiyari, Mamasani, Guhgalu, Kelkuri, Lekki.
Gorani	Gorani, Hewramani Bacelani, Zaza.

Wek di vê şemayê da ji tê ditin, Fuad Hama Khorshid, di binavkirina zarawayên kurdî da dabeşbûna (belavbûna) cografî esas girtiye. Lê dema mirov nexçeya (xerita) dabeşbûna zarawayên kurdî dinêre, devokê zazaki (bi dumilî ji tê binavkirin) li bakûra Kurdistanê û ji aliyê din ve devokên din ya zarawayê Gorani pirani li başûr ûrojhat a başûrê Kurdistanê tên peyivin.

Hin niviskarên din ji zarawayên kurdî bi devokê heri xurttir di zarawayeki da çî be bi wi navi binavdikin, weki Kurmanci, Sorani, Zazaki û Lori. Di kovara Hêvi — Kovara Enstituya Kurdî li Paris — zarawayên kurdî -ji wan sê hebî Kurmanci, Kurmanci ya xwarê (Sorani) û Dumilî tên binavkirin. (4)

Niviskar û zımanzaneki kurd Malmısanij di nivisa xwe ya li kovara "Berbang" (Kovara Federasyona Komelên Kurdistan li Swêd) da zarawayên kurdî bi vi awayi dide naskirin: "Wek ku tê zanin, piraniya miletê kurd zarava kurmanci (Kurmanci ya bakur), yên mayi Sorani (Kurmanci ya Başûr) , Zazaki (Kurdî, Dumilî) , Hewramani-Gorani, Kirmanşai, Lurri-Feyli dipeyivin." (5) Dema ku mirov van navan li gel nexçeya ku di vê nivisê da hatiye çapkirin dide ber hev, dibîne ku, him ji aliyê binavkirina zarawayên kurdî, him ji ji aliyê hejmara , mezîna nebe ji cudabûneki heye. Beguman di gelek nivis û lêkolînên din de ji mirov dikare cudabûnên wani - li ser binavkirin û hejmarên zarawayên kurdî- dibîne.

Nimûneyên (minakên) ku mi li jor ji çend nivis û lêkolinan da, gelek vekirî nişan dide ku, yek ji pirsiyarên zarawayên kurdî, binavkirin û hejmarên wan e. Beguman cudabûna binavkirin û hejmara zarawayên kurdî her wek min li jor ji nivisi, çiqas ji hevûdu gelek dîr û giring nebîn ji, di sa mirov divê ev yeka wek pîrsekî ne bişaftî qebul bike ji bo bişaftina wi bixebite. Baş tê zanin ku bişaftina pirsiyareki beri her tîştî grêdayi naskirin û binavkirina wê pirsiyari ye.

## SEDEMÊN CUDABUNA ZARAWAYAN

Sedemên derketin û cudabûna zarawayan di zımaneki da bêguman gelek in. Lê çendek ji van sedeman, di cudabûna zıman da, yan ji derketina zarawayan da, sedemên sereke ne. Ev yeka çawa ku bo tev zımanên cihanê derbaz dibe, her wisa ji ji bona zımanê kurdî ji derbaz dibin. Van sedeman Malmısanij bi vi şekli dinivise :

# ÇEND PIRSIYARÊN

## ZARAVAYÊN ZIMANÊ KURDÎ

V.S.Tanrikulu

RABERÎ

Wek her neteweyê cihanê, neteweyê kurd ji di mana xwe ya modern xwedi zimanê xwe ye. Ji bo ku babeta vê nîvisê pirsîyarên zaravayan di zimanê kurdi da ye, ne pêwîste ku dûr û dirêj li ser cîyê ziman di hebûn û yekitiya neteweyek da çîye bê nîvisandin.

Baş tê zanin ku, yekitiya ziman, nemaze yekitiya zimanê nîvisinê jibona yekitiya neteweyi bîngehek heri grîngtir e. Ziman, wek navgînek bîngehin jibona hevûdu fêmkirin, danûstandin û pêşvebirina civatê da ev rola xwe ya grîng bi cih tine.

Çawa ku ziman bi diroka mirovatîyê derketîye, wisa ji pêşveçûna ziman û guharînên di nav wi da ji bi pêşveçûna civatan re dom kirîye û dike. Ango em dikarin bêjin ku, pêşveçûna zimanekî yek ji nîşanên pêşveçûna wê civatê ye. Ev yeka ha mirov dikare di diroka gelê kurd da ji gelek vekirî bibîne. Rewşa zimanê kurdi her dem di gel pêşveçûn yan ji paşvemayîn-paşxistina civatê kurd ve meşiyaye.

Pirsîyarên ziman ji wek pirsîyarên civatî yê nîvînan pîr alî û cûrbecûr in. Ji bo vê yekê sedemên pêşveçûn, paşvemayîn, paşxistin, ji hev cudabûn nêzi hev bûn û pirsîyarên her wekî di nîvînan ziman û bi taybetî nîvînan zimanê kurdi ji pîr alî û cûrbecûr in. Bîngehên van pirsîyaran diroki, civatî, siyasî û hwd. in. Ango, van pirsîyaran ne

yek in û ne yê nîvînan rojê ne, û ji bo vê yekê ji di rojê da ji holê nayên rakirin. Ji bona bîşaftina van pirsîyaran, - ku her zimanekî li ser cihanê tê bikaranîn pirsîyarên wan yê nîvînan xas hene - xebatek dîr û dirêj û zanîstî divê.

Zimanê kurdi, wek zimanê neteweyekî bîndest ku welatê wî ji alî çar dewletên kolonyalistî ve hatiye parvekirin, xwedi gelek pirsîyar û dijwariyên ne bîşaftî ye. Bêguman bîşaftina van pirsîyaran ji kokê grêdayî rîzgariya gelê kurd, avakirina civatê serbixwe û azad li Kurdistanê ye. Lê ev nayê wê manê ku divê kar û xebat ji bona vê yakê iro neyê kirin. Kar û xebat ji bona bîşaftina pirsîyarên ziman, parastin û pêşvebirina bîjeyê kurdi beşekî ji têkoşîna rîzgariya neteweyî û civatî ya gelê kurd e.

Dema mirov li zimanê kurdi dinêre, pîrsa heri grîng pîrsa zarawayên zimanê kurdi û bi vê pîrsê ve grêdayî dijwariya yekitiya zimanê nîvisin û bîjeyî (edebî) yê kurdi ye. Bêguman mirov dikare gelek pîrs û dijwariyên di nîvînan bîke. Lê wek di destpêka nîvisê de ji hatibû behskirin, babeta vê nîvisê zarawayên zimanê kurdi ye. Ji bo vê yekê ji vê nîvisê da tenê çend pîrsên zarawayên zimanê kurdi li gora lêkolîn û nîvisên çend zimanzan û nîviskarên kurd ve bê tî dijarkirin.

Nr. 1

KURDISK LÄRARE  
"Mamostayê Kurd"

Maj-1985

\*\*\*\*\*

En antologi utges av kurdiska avdelningen vid Högskolan för Lärar-  
utbildning i Stockholm.

\*\*\*\*\*

Redaktör : Ferhad Shakely

---

Jimare :

MAMOSTAYÊ KURD

Gulan-1985

(1)

\*\*\*\*\*  
 Dengê beşê Kurdî yê Xwendîngeha Berz ya Mamostayan li Stockholmê ye  
 \*\*\*\*\*

Sernivîskar : Ferhad Shakely

NAVEROK

<u>Nivîskar</u>	<u>Babet</u>	<u>Rupel</u>
V.S.TANRIKULU	Çend pirsyarên zarawayên zimanê Kurdî	3
LEZGÎN	Pêşewayê helbesta Kurdî ya modern:GORAN	8
Zinar ŞÎRO	Du helbestên Swêdî	11
Keya ÎZOL	Zarokên Kurd li Swêd bi zimanê Kurdî dixwînin .....	13
A.CANTEKÎN	Vekolîn liser sê pirtûka	17
HEJAR	Hejlo her berz e	24
Xoşmend BARAN	Dîroka Tiyatroya Kurdî	25
HÊMIN	Helbijarde	29
K.ALIS	Vekolîn liser du pirtûka	30
Emced ŞAKELÎ	Melay Cezîrî : Şarêgey sofîgerî w Klasîzm le edebî Kurdîda .....	46
F	Tapo w bûmelêl: Suwarey Êlxanîzade	48
SUWARE	Pîre hejlo	51
Ferhad ŞAKELÎ	Kurdayetî, zanist, azadî	56

Navnîşan : Höskolan för Lärarutbildning  
 i Stockholk / KURDISKA  
 Box 34103  
 100 26 STOCKHOLM - SWEDEN



# MAMOSTAYÊ KURD

KOMMUNALA VYVENUTBÄRDNINGEN  
Grundförskola för vuxna  
Box 4002  
141 04 HUDDINGE

141 04 HUDDINGE



dengê beşê kurdî-  
xwendîngeha berz ya  
mamostayetî li  
stockholmê ye